

Hûmare / Hejmar:2  
Serre / Sal: 2016

FANZÎNA WENDEKARANÊ UNÎVERSÎTEYA ÇEWLÎGÎ

# Laser

FANZÎNA XWENDEKARÊN ZANÎNGEHA ÇEWLÎGÊ



WK MERDIMÎN

*Dîwana  
Nêmcet*

PEYWEND

PEYWEND

# BERKEN BEREH

## DILÊ MIN PALGEH E JI ÎŞQÊ RE

hawirdor û têkiliyên wî/wê) pak û zelal dixuyê Helbest şirove û jinûve avakirina rastiya li dorhêla me ye ku helbestvan vê rastiye li moxila helbestê dixê û wê raberî me dike.

*Tu dikarî di derbarê berhemên xwe de bi kurtasî hin agahîyan bidî?*

### Berhemên min;

- Êş - 2001 weşanên Sî
- Şagirtên Evînê - 2003 weşanên Sî
- Pandomîm- 2006 weşanên Belkî
- Şîna Helbestê- 2008 weşanên Doz
- Dilê min palgehe ji îşqê re (digel ên berê-şerbeta ji êgir û haiku-hemû berhem)- Weşanên Lîsê-2011
- Ji Dûriyê re-Weşanxaneya Lîs-2013

### Edîtor;

- Cewahirên Kurdan - Xelîlê Çaçan

- Yadaşt; Refik Hilmî
- Hemû Berhem - Xelil Duhokî
- Hemû Berhem - Osman Sebrî
- Gayê Zexel (Filklor) - Osman Sebrî

### Wergêr;

- Lapis lazuli - Mehmet altun
- A Deryayê Gotî; Mustafa Köz
- Helbestên Bijartî; Akif Kurtuluş
- Siha Her Çiyayî Dikeve Ser Deniz'î - Evrim Alataş

*Ji bo kesên ku nû dest bi nivîsa helbestan dikin çi şîret û nesihetên te hene?*

Bêguman wek her cure afrîneriyê pîvanên helbestê jî bi wext û zemanî re tê guhertin û xwe nû dike. Dîsa jî hin pîvan hene ku ji roja roj ve hatiye qebûl kirin. Bi gor vê helbesteke baş ev e, ya beriya her tiştî bi hestên ji dil, bi zimanekî sade, rewan, bi awaz û newayeke taybet ya şairî û bi hiş û bîreke zelal hatiye nivîsandine. Arîsto dibêje "taybetiya derbirînê zelalî ye, lê bêtir ku mirov bikeve nav derbirîneke ji rêzê. "Helbesta baş tiştêkê li me nade ferz kirin an venabêje, lê bi xwendina wê re em dibin xwedî zanyarî û hestiyariyan.

Nivîskarên ciwan beriya her tiştî divê bi baldarî wêjeya me bixwînin, analiz bikin û wê bidine beramberî wêjeya cîhanê. Sedemên nivîsandinê û ya nivîsandina xwe bi dilsozî ji xwe bipirsîn û ger bersiva wan nivîsandin be bila gelek binivîsin lê kêmbiweşînin. Divê neyê ji bîrin ko her serkeftin encama kar û xebateke dûr û dirêj e.

*Gelek spas Mamoste ji bo ku te dema xwe ya hêja bo min veqetand.*

Ez jî spas dikim.

Her wiha ez endamê komeleya vêjevanên xort bûm. Wê deme di gelek rojname û kovarên edebî de helbestên min belav bûn. Bê guman hingê min bi zimanê tirkî helbest dinivîsand. Lê ji sala 1978 pê ve min biryar da ku tenê bi kurdî binivîsim.

*Gava ku tu helbestan dinivîsî tu ilhamê ji çi digirê û di rewşeke çawa de dinivîsî?*

Ilham qet ne di bala min de ye, tu carî namînim li benda wê. Wek her kar û şixulî helbestkarî ji encama xebateke dûve dirêj e. Tu li benda ilhamê bimînî tê ta nefesa dawî jî nekarî ristekê binivîsî. Bêguman rewşek, dîmenek, dîtina tişteke ne ji rêzê an dîmenek rengîn û nûwaze dikare pêl li dile te bike û pêlekê rake li derya dilî de lê, ev ne ilham e, tesîra tiştê li ber te ye. Ji ber wê ger şairek bivê tişteke biafirîne divê bi awayek sistematik bixebite.

Ez jî rojane dixebitim û xwedî planekê me. Ji nivîsandinê bêhtir dixwînim. Her xwendina xwe li moxila hiş û bîra xwe dikim, tiştine bi kêr min bèn wan disenifnim, ji ezmûne û hêçandina nivîskaran sût werdigram. Tiştên ku bi roj min xwendine û tiştin ji wan li deftera xwe nivîsandine, bi şev dîsa wan dixwînim û li ser wan diponijim û dihizirim. Her peyva dikare hêz û şiyana hiş, hest û bîra min xurtir bike (çi nû bihîstibim, çi min ji bîr kiribe) çendîn caran wan bi hevokekê bi kar tînim. Da ku bikaribim bi wê peyvê re tîkiliyeke durîst deynîm. Ez baş zanim ku her peyv wek me mirovan xwedî ruh û giyanekê ne. Ku tu wan bi şaşî û ne di cih de bi kar bînî dê tu neheqiyekê li wan bikî. Ji ber ku tiştê tu dinivîsî taliye tê xwendin tu dikî ku xwendevan jî bi te re wan peyvan ne cih de bi kar bînin. Vêca êşa wan peyvan du qat dibe.

*Helbestvanê ku tu herî zêde jê hez dikî kî ye û tu ji kîjan helbestvana ilham distîni?*

Hemû helbestvanên ku berhemên wan dixwînim tesîrekê li min dikin. Yên bi kurdî Feqiyê Teyran, H. Qadirê Koyî, Letîf Helmet, Refîk Sabir, E. Peşêw, Rojen Barnas, Mayakovskî, Paul Eluard...

*Tu di helbestên xwe de kîjan mijara bi kar tîni û tu dixwazî kîjanan bi kar bîni?*

Ez hemû mijarên bi jiyana insên ve girêdayî ne û li ser qedera wan xwedî tesîrekê ne diponijim û dinivîsim; mirin, işq, tenêti, koçberî, êş, xweza hwd.

*Ji bo te armanca nivîsandina helbestê çi ye?*

Helbest derbirîn e, deşarjbûn e. Bi vê taybetiya xwe ji bo helbestkarekî nivîsandin di heman demê de aramî û rehetiyek e. Lew bi saya helbestê tu dest bi rêwitiyekê dikî. Ew rêwiti ber bi giyan û ruhê xwe ye. Di vê rêwitiyê de tu xwe dinasî, kil û kêmasiyên xwe dibînî, ji bo jiyaneke baş û xweştir dikevi nav hewldanekê û bi parvekirina van pirsgrêk û arîşeyan tu tîkiliyeke durîst bi civat û xwezayê re datîni. Bê guman ev helwest û hewldan rê dide ku xwe ji barê li ser mile te ye rizgar bikî an jî wî barî siviktir bikî. Aha armanca nivîsandina min avakirina pergaleke nû û bi civat û xwezayê re di hevahengiyekê de ye.

*Te helbesta xwe ya ewil di çend saliya xwe de û ji bo kî/ê an jî li ser çi nivîsî?*


Min helbesta xwe ya ewil di şazdeh saliya xwe de ji bo porzerekê nivîsî bû. Helbest li ser evîn û hezkirine bû.

*Bo te pênaseya helbestê çi ye?*

Helbest, sekneke li hember jiyane ye. Ev sekn pencereyeke ku hemû tiştine parzûnbûyî (ji xwe, ji hizir, raman, ji

# DIGEL HELBESTVAN, NIVÎSKAR, WERGÊR BERKEN BEREH HEVPEYVÎN

Hevpeyvîn | Zübeyr Durmaz | Pola Sêyem



*Mamoste tu dikarî bi kurtasî qala xwe bikî?*

Ez di sala 1954an de li bajarê Şirnexê ji dayîk bûm. Yekemîn car helbestên min di kovara Tîrêjê de (yekemîn kovara kurdî ye li bakur) de hatiye belavkirin. Heta niha helbest û nivîsarên min di gelek kovar û rojnameyên kurdî de belav bûne mîna: (Nûbûn, Nûdem, Jiyana Rewşen, Nûbihar hwd.) Di sala 1998-1999an de di pêşbirkên helbestê yê ji alî Komeleya Malbatên Girtî û hukumxwariyan û ji alî Kovrara Rewşenê amade kirî de bi xelatên 1. û 2. hatime xelat kirin. Min di sala 1999an de bi navê "Kulîna Kulîlkan" kovareke internetî amade kir. Çar hejmar derket. Ev yekemîn kovara internetî li bakur bû. Helbestên min di Tv yê kurdî, (Medya Tv, Roj TV, Gün TV...) Radyoya Elmanî WDR û SBS ya Avustralya de hatine xwendin. Li Zankoya Bilgî yê û çendîn Komeleyên Civakî de tevî konferans û panêlan bûme. Hê jî di kovar û rojnameyên kurdî de nivîskariya xwe didomînim.

*Meraqa te ya helbestê kengê û çawa dest pê kir?*

Di dibistana navendî de min û du hevalên xwe rojnameyek derdixist. Ev rojname pazde rojan carekê dihate nûkirin. Bi vê minasebetê min her tim dixwend û di pirtûkxaneyê dibistanê de di derbarê wêjeyê de lêkolîn dikir. Hingê pê hesiyam ku behreya min ya ji bo helbestê heye. Hê di lîsê de min dest bi nivîsandina helbestê kir.

tenê bi dengê bilind bi awirê hêrs û rûyê xwe yê qurmiçî got;

– De hey malxirabo xêr e. Çi qewimî, qey dilê te heyê ku tu derî bişkênî?

Zarok bi hêrsbûna apê xwe matmayî ma. Bi kelecaneke wisa hatibû ber derî ku sinêrê apê xwe jibîr kiribû. Ji tirsan serê xwe xwar kir. Qêrîn û gotinên apê wî hişê wî biribû. Hewl da ku biaxife da sedema hatina xwe aşkere bike. Serê xwe bi rengê şermokî û bi rûyê xwe yê tirsê zerhîmî bûbû, rakir. Bi dengê nizm, ritmek lertzok û tije tirs dest bi axaftinê kir.

– Apo bizinên we...

Bi navê bizinê çavê Apê Felemez wekî beqan vebûn û tirsek ket nav dile wî û got; qey tişteke hatiye serê bizinan. Bêdengbûna biraziyê wî ew bêhtirîn hêrs dikir.

– Çi bûye law bizinan?

Dema Apê Felemez dipeyivî bê hemdê xwe diqêriya û zêdetir dengê xwe bilind kir. Çimkî mal û nemanên wî bizinên wî bûn. Reco yê reben ji qêrînên apê xwe pir ditirsiya. Digot xwezî ez qet nehatima û min li vî derî nexista. Ji tirsan hindik mabû ku gotina xwe jibîr bike, hima bi carekê de bi dengê lawaz got;

– Apo bizinên we ketine nav zîyanê.

Ev gotin çî gotinek dijwar bû hem ji bo Apê Felemez hem jî ji bo Reco... Apê Felemez nedixwest bawer bike.

– Çawa ketine zîyanê law ma qey kes ne li ber wan bû? Ma qey bizinên min bê xwedî ne kes tine bû ku berê bizinan bide aliyê gund...

Reco dixwest bipeyve lê newêribû ku gotina apê xwe bibire. Jixwe Apê Felemez ji zû de dest bi nifir û çêran kiribû. Reco xwe

ji ber derî da alî, Apê Felemez jî montê xwe li xwe kir, hewce nedît ku goran têxe pêyên xwe û berê xwe da aliyê zîyanê.

Gava ev bûyer diqewimî, Çeto nanê xwe qedandibû û bi xwişka xwe re dilîst. Çeto jî xwişkên xwe gelekî hez dikir. Lewra dema ku di şevên tarî de ditirsiya, diket paşla wan û bi dilekî rehet bi xew re diçû. Lê dema ku Reco hat ber derî û ji bavê wî re behsa bizinan kir, wî jî guhdarî dikir. Tirsekî mezin ket nav dile wî. Lewra îro dora şivantiyê a Çeto bû. Dema ku baran bi şiddet barî hemû bizin di bine şiya daran de mexel kiribû û berê xwe dabû malê û piştî ku hat malê, haya wî ji bizina nemabû.

Çeto û Apê Felemez li eywanê liqayê hev hatin. Hema di carekê de bavê wî tûfikir û şimaqeke tûnd li rûyê wî xist. Tu gotin nema ku ji Çeto re bibêje. Çêrên ku ji sibê ve di paşla xwe de weşartibû rijande ser rûyê Çeto. Bi vî awayî, Apê Felemez pêş de Reco û Çeto jî di paş de ketin rê û ber bi aliye zîyanê ve çûn. Apê Felemez wisa dimeşiya ku Çeto û Reco nikaribûn bigihîjin wî. Jixwe, ji tirsê ne diwêribûn li kêleka wî bimeşin. Heta ku gihîştin bizinan Xwedê dizane ka çend caran lingên wan ser kevirên şil, şemitîn û ketin nav heriyê û tê de çiqas gevizîn. Bi têra xwe şilûpilo bûbûn û gemar girtibûn. Hemû bizin ji nav zîyanê derxistin. Îjar cihê xwe guherandin Çeto û Reco pêşî, Apê Felemez di dawiyê de bi tevî herrî û şilbûnên xwe ve dimeşyan. Çeto pir xemgîn û şermokî dimeşiya. Apê Felemez jî ewqas hêrs bûbû ku hêj jî dipeyivî. Carcaran gotinên wî dihatin û wek şimaqan li guhê Çeto diketin.

– Xwedêyo zarokên min ji bizinên min pirtir in, lêbelê hêj jî bizinên min bêxwedî ne.

bismillayê derî vekir û ket hundir. Montê ku ev sê çar sale li xwe dike êdî kevn bûbû derxist û bi bizmarê diwarî ve daliqand. Hat bîra wî ku nimêja esrê nekiriye. Bi meşeke betilî û giran ber bi mislixê ve çû. Bi rûyekî spî û matmayî li eynê nihêrî, di rûyê xwe de tehrîbata salan dît, gunehê xwe bi xwe anî û dest bi destnimêjê kir. Bi destnimêjê re mijûl bû, karê xwe bi avê re qedand, mislix girt bêhnekî kur stand û berda, hêdî hêdî çû şalika xwe raxist û dest bi nimêja esirê kir. Nimêj qediya û hat bîra wî ku îro qet li xeberan temaşe nekiriye. Televîzyona xwe vekir, li ser qenalên xeberan yekoyek digeriya, dît ku dîsa rewş xerab e. Bîstek şûnde ceryan çû. Cemeata gund hînî qutbûna cereyanê bûbûn, bo wan ev tişt normal bû. Jixwe, baran her tim nîşaneyê qutbûna cereyanê bû. Piştî girtina televîzyonê tenê Apê Felemez û xemên wî man.

Dema bêhna xwe vedida, ket nav mitalan û ciwantiya xwe bibîranî û bi dilê xwe de got:

Xwedêyo çiqas rojên xweş bûn, xwezî dîsa ez ciwan bûma. Xwe bi xwe digot, ez çi zilamek bûm, loo. Dema ku ez zewicim bavê min kîsekî sawar da min û ez ji malê cûda kirim. Ji wê rojê û pê ve min bi xwe malbata xwe bi rêve bir û xwedî kir. Hemd ji Xwedê re ku ez ne mihtacê kesekê me niha.

Felemez di nav van xeyalan de diçû û dihat. Geh dikeniya û di çavên wî de tije hêsir kom dibûn, geh radibû piya û diçû ber bi pencereyê û derve temaşe dikir. Xweza û ziyana xwe dinhêrî, bi hatina baranê re rûhekî nû ketibû sirûştê û bi maçkirina baranê re simbil ji dibiriqîn. Kêfa wî hat cih, xwîna wî dîsa germ bû lê dizanîbû ku ew êdî kal e. Ew ji hal de ketibû û êdî gotin ji pere nedikir. Gotina dengbêjekî hate bîra wî ku

rewşa wî ya kalbûnê rave dikir; “xwezî mirin hebûya, kalbûn tunebûya”. Nû fehm dikir ku ev gotin çiqas di cih de ye.

Êdî emre wî bûbû heftê salî, derencikê temenê wî diqediyar. Bavê bîst zarokan bû, lê belê niha li kêlekê, tenê pênc-şeş zarok mabûn. Kurên wî yên mezin di derveyê bajar de dixwendin, piraniya keçên wî jî zewicî bûn. Demek şûnde li cihê xwe rûnişt û hinek bêhna xwe veda. Lewre ji ber bişirandina ciwantiya xwe westiya bû. Ji bo bêhna xwe bide hewl dida ku li ser mînderê rûnê û tasek ji avê vexwe. Lê bi carekê re dengê hat.

– Apo Apo... û piştî dengê ji deriyê hesin hat.

Bi dengê deriyê hesin aramî xwe pêça beyomî yê. Rûyê wî yê ku germ bûbû di cihê



xwe de tûrebûnek girt. Lewre ew di nav xeyal û ciwantiya xwe de diherikî. Ev dengê nebixêr û zingezinga hesinê rîziyaî bêhna wî teng kir. Jixwe, ji sibê de karê wî di rê de nedîçû. Ji ber vê yekê dema ku derî vekir ne

Dema ku ew ji malê derdiket, herdu xanimên wî jî dihatin ber derî û bi qêrîn xwestekên xwe digotin. Yekê digot; “savar jibîr neke ha”, ya din jî digot; “goştê me qediya ye, dilê zarokan jî diçe goştê mirîşkan tu jibîr nekî” û bi vî awayî jinan heta erebeyê xeber didan. Apê Felemez pirî caran guh nedida gotin û xwestekên pîrekan, bêdeng dima û qet xwe ber bi gotinê wan nedixist û wan jî nedinêrî û bi gavên lez xwe ji malê dûr dixist. Gava ku Apê Felemez bêdeng dima, herdu jinên wî bêhtir hêrs dibûn û li ser serî wî zêdetir didan ber qêrînan. Erê, jinên Apê Felemez hêwiyên hevdû bûn, lê belê te digot qey ji aliyê qêrînê ve xwişkên hev in. Û te digot qey wan di nav xwe de peyman çêkirine ku yên serê wî bi xeberdanan biêşînîn. Carinan gotin jî bi kêr nedîhat, bi awîrên tûj rewş dixemilandin û bi wî awayî di dawiya axaftinên xwe de gef li zîlamê xwe dixwarin.

Dema ku jinên wî ev tiştên hanê li wî dikirin, bi rastî jî gunehê mirov bi Apê Felemez dihat. Lê divê mirov ji bîr neke ku Xwedê heqê kesî ji kesî re nahêle. Lewra ev rewşa ku niha Apê Felemez tê de ye, dadmendiya Xwedê bû. Çimkî Felemez di cîwantiya xwe de pir tehde û zîlm li wan jinan kiribû. Jixwe Felemez jî ji ber ku ji berê de zîlm li wan kiribû, tiştên ku niha dihat serê wî, dianî ber hev û fehm dikir ku ev tişt nîşaneya edaleta Xwedê ne. Apê Felemez piştî ku ji nav mitalan derket nihêrî ku hê jî ne jin hatine peşwaziyê û ne jî zarok hatine dest maçkirinê. Îcar ji ber vê rewşê gelek hêrs bû, rengê rûyê wî sor bû, kîsikê ku goşt û savar tê de bû, avêt erdê û bi dengêkî bilind dest bi çêr û nifiran kir.

Gava ku Apê Felemez bi dengêkî bilind dest bi nifir û gotinên nexweş kir, kurê wî Çeto li ser nan bû. Ew nanê ku ji duh mabû diya wî ji lawê xwe re germ kiribû û danibû

ber wî. Çeto pir birçî bû, bi îštaheke mezin û bilez xwarina xwe dixwar. Wisa xwarin dixwar ku te digot qey yek yê were û nanê wî ji ber wî birevîne. Çeto tam niyet kir ku goştî biavêje devê xwe, bi qêrîna bavê xwe ve lerizî. Ew xwarina ku heta aniha bi dilekî rihet dixwar ji Çeto re bûbû jehr. Ew pariyê herî xweş yê goştku hiştibû dawiyê ji tîrsa qêrîna bavê xwe danî têfikê û bi gavên lezgin ber bi dengê bavê xwe ve çû.

Çeto bi tîrs û şermokiya xwe ve çû derî vekir. Bi vekirina derî re, bavê xwe yê qehrok dît. Rûyê bavê wî yê tîrş û bi awîrên hişk li hemberî wî sekinibû. Çaxa dît kumê ku li ser serê bavê wî xware û ber bi ketinê ve ye, fêhm kir ku bavê wî pir qehiriye, tîrsek di nav dilê wî de xwe şamîland. Lewra ev dîmenê ku didît ne xerîb bû. Dizanibû ev rû û awîr an wê bilêxistinê dawî bibe, an jî wê bi têra xwe tifa bavê xwe li ser rûyê xwe bibîne. Bi rastî jî Apê Felemez xwe ji bo tûkîrinê amade kiribû. Dixwest bi tûkîrinê dilê xwe rehet bike. Jixwe, ji aliyê lêxistinê de mêrantî bo jinan qediyabû, qene digot di dilê xwe de, ez tû bikim bila pozê wan bişewite. Felemez, li rûyê Çetoyê ji ber tîrsê spîçolkî nihêrî, gora wî di sertiliyan de qetiyabû, şalê wî qelişî û bê fayke, bi tena montekî peritî dît, dilê wî pê şewitî. Bêyî ku ji lawê xwe re tiştêkê bibêje, tenê bi çavên xwe poşet nîşanî wî da û ber bi odeya xwe meşiya.


Çeto ji rewşa bavê xwe bi matmayî ma; gelo xêr e, çibû? Çima bavê wî lê nexist, qet nebe tif dikir yan jî gotinek nexweş digot. Sedema vê tiştê nedizanî, lê çi dibe bila bibe pir xweşa wî hat û digot na na bavê min mirovekî baş e. Di nav van ramanan de berê xwe da mitfaxê. Bi derbekî de reviya lewra hişê wî hê jî ser pariyê goşt mabû.

Apê Felemez çû ber deriyê menzelê; bi



# APÊ FELEMEZ

Hasan Filitoğlu | Pola Sêyem



Roj, di bin síwana ewran de hêdí hêdí ber bi aliyê rojava diherikí. Lê çi dema qoziyên rojê xwe ji ewran xilas dikirin, dadiketin xwarê, ew giyayên ku ji spêdê ve ava baranê vedixwarin, bi lêxistina qozî û mistdana tîrêja rojê wek zêran dibiriqîn. Îro baraneke hişk barîbû. Bêhna axê çarmedorê belav bûbû û difinê mirov ev bêhna ji dil hembez dikir. Diyar e ku ewran duh de şîmaqa xwe ve li ser ezmanan tof kiribû û îro ji bi hemû hêza xwe rûyê erdê dişilpand. Piştî demekê êdí ewr ji westiyên û hêdí hêdí ji bo çûyîne xwe amade kirin. Lê derdor şil û pil bû, ax bi temami bûbû herî, ji ber vê jî rêveçûna mirovan diwartir bûbû.

Di nava wê rewşa baran û herriyê de, Apê Felemez bi hêrseke mezin ji erebê peya bû. Lê bi peyabûna wî re, rûyekî tîrş û awirên têrnifir ji peya bûn. Di van sê çar rojên dawî de Apê Felemez pir bi hêrsoyî xûya dikir.

Dema ku ji tirimpêlê derket û pêli heriyê kir, pelçiqê heriyê li ser cil û bergên wî yên gemarok û ewqas ji ûtikirî ketin, bêhtir hêrs li ser rûyê wî rûnişt. Piştî wê rewşa gemar Felemez dest bi çêra kir û bi lez ber bi aliyê mala xwe ve meşiya. Lê di nivê rê de sekinî dest bi nifira kir û dîsa li ser şopa lingê xwe vegeriya erebê. Lewra di erebeyê de kîsê xwe yê spêdê jibîr kiribû. Apê Felemez bi hêrseke mezin poşet rakir, di dev de nifir, di dest de jî poşet, ber bi aliyê malê meşiya. Hat ber derî û sekinî... lê nihêrî ku tu kes nehatiye peşwaziya wî û tu kes nabêje tu bixêr hatî û kesekî ku poşetan ji destê wî bigire jî tune ye. Ji ber van sedeman pir qehirî, diltengiyek li ser laşê wî peyda bû; ma qey wî ev tiştên xwarinê ji bo kê anîbûn? Ne ji bo jin û zarokan bû? Ji serê sibê de bû ku çûbû û nû vegeriya bû. Ma qey, ev yekana ji bo pênc qirûş pere bû di ser de jî bêtaqetbûna rû û ligan.


jî li mala xwe vegeriya. Ji ber ku piştava bavê min diêşiya min got, tu hêdî hêdî here filan gundî jixwe ez rê nasdikim. Bavê min got, temam keça min.

Ez bi rê ketim min rê bi nivî kir ez tî bûm û westiyam. Di rê de bi rastî jî ez gelekî ditirsiyam û jixwe ew tava germ ez gêj kiribûm. Ez dimeşiyam û denge ewteewta kuçikan ji guhê min kêr nedibû. Carekî çawa ku min li pişt xwe meyizand ku ez çî bibînim! Seyek li pişt min e. Hema min hefsarê hespê berda û dest bi bazdanê kir ji tirsava kuçik ziravê min qetiya. Di rê de ez rastî şivanekî hatim, şivan bera se da û wê rojê, min gelekî dua ji Xwedê re kir ku ew şivan gihandibû hawara min. Pişt re min dîsa dest bi rê ya xwe kir û ez di navbera saetekê de gihaştine bavê xwe. Bavê min piştî ku min jê re behsa bûyerê kir, eniya min maç kir û got, aferim ji te re. Hevalekî bavê min li wî gundî li hêviya me bû. Me li mala wî çayek vexwar û em berêvarkî gihaştine mala xwe.

### Tenêti

Gülşen Yalçın | Pola Yekem

Nizanim li ku derê me ez  
Li dora xwe dinêrim, lê tu kesî nabînim  
Tirseke kûr e ya ku dikeve dilê min  
Bi serdanpê ricif dikeve bedena min  
Ji xwe dipîrsim ez li ku derê me?  
Ez im, va li ser kevirekî reş rûniştî me  
Li dora xwe dinêrim, du tiştan dibînim  
Yek tenêti, ya din bêkesî  
Li pey te, dikevim ser rêyan, bi tenê  
Bo ku xwe bigihînim, wî kesî  
Ku ez li pey xwe bêkes hiştine.



Hesreta Te

Xalid Özel | Pola Yekem

li welatekî qedexe  
bi qasî avakirina xewnên revok  
tişî kelecana bû  
hesreta payîna te  
û wê ava bibin xewneroşk  
dabîn bibin hesret  
bi qasî pêkhatina xewnên avakirî  
tişî evîn bû  
bihîstina hesreta çavên te  
û wê ava bibin xewneroşk  
dabîn bibin hesret  
bi qasî rondikên li ser hinarokên min tîn  
xwarê  
tişî keser bû  
sêwirandina hesreta te  
û wê hişk bibin hêsir  
dabîn bibin hesret

## HESPÊ REŞ

Gülşen Yalçın | Pola Yekem



Li gundê me dema cotkirina erdê hatibû. Rezekî me jî hebû û bavê min gelekî qedr û qîmet dida rezê me. Hemû gundiyan me rezê xwe bi motorê cot dikirin. Lê bavê min digot ez tu carî rezê xwe bi motorê cot nakim çunkî motor rez difelişîne lewma ez ê rezê xwe bi hespê cot bikim.

Lê li gundê me hespê cot tunebû. Hespeke xalê min hebû û gelekî biqîmet bû. Bavê min digot ez ê bi wî hespî erdê xwe cot bikim. Gundê xalê min jî ji gundê me gelekî dûr bû. Diya min jî digot heyran, ma bi te xêr e, tê çawa herî ji gundê birayê min hesp bînî. Bavê min jî kesekî wilo ye, ku tişteki têxe serê xwe gereke wî tiştî bike. Bi şev bavê min got keça min sibehê xwe amade bike, em ê biçin gundê xalê te hespa wî bînin.

Sibehê min û bavê xwe, me xwe amede kir û ez li pişt bavê xwe siwar bûm û em bi rê ketin. Di navbera gundê me û gundê xalê min de 4 gund hebûn. Em gihaştine gundê ewil riya gundê ewil pir zîxur bû. Min ji bavê xwe re got, bavo ez ê peya bibim da ku barê motorê sivik bibe û ez ji motorê peya bûm û min got, tu hêdî hêdî here gundê duyem li benda min be, ez ê bêm. Paşê ez li gundê duyem gihaştine bavê xwe û dîsa me dest bi rêwîtiya xwe kir. Rêya gundê xalê min jî nexweş bû hemû newal û kendal bûn. Hê berî ku em derkevin rê xalê min gotibû hewce nake ku hûn werin ez ê hespê xwe bi kurê xwe re ji we re bişînim.

Em li gundê din gihaştine hespê mala xalê xwe. Me rahişte hespê û kurê xalê min

# Laser

Fanzîna Wendekarane  
Unîversîteya Çewlîgî

**Hûmare: 2 Serre: 2016/3**

## **Koma Laserî (Kurmancî)**

Ahmet Subaşi  
Ejder Êlih  
Haşem Tilkî  
Hasan Filitoğlu  
Mazlum Özel  
Sabri Külter  
Şenay Asutay  
Tufan Yamaç  
Zübeyr Durmaz

## **Koma Laserî (Zazakî)**

Şahap Laçin  
Ceylan Uçar  
Hüseyn Rodî Keskîn  
Hülya Orman  
Mîhrîban Çakan  
Şenay Asutay

## **Berpîrsiyarê Ekonomîyî**

Zübeyr Durmaz  
Klûba Ziman û Wêjeyê – Klûba  
Ziwan û Edebîyatî

## **Vilaker**

Klûba Ziman û Wêjeyê – Klûba  
Ziwan û Edebîyatî

## **Rîpelsazî**

Ridwan Xelîl

## **Resmê Qapaxî**

Dewa Qayike  
çorşmeyê 1960yan, Çewlîg

## **E-mail**

kovaralaser@gmail.com

## **Koma Laserî Ra**

Merheba şima rê wendekarê ma yê ercîyayê. Ma bi kovara Laserî hûmara diyine ver ra şima yê. Na hûmara diyine gorê hûmara yewine ma Zazakî nuşteyê xo zaf- zaf vêşî kerdî. Şîr, hîkaye, estanike, nuşteyê açarnayoxî û derheqê mewzûyê edebîyatê Zazakî de sewbî nuşteyî. Nê nuşteyî hem hetê sinifê yewine hem hetê sinifê diyine hem zî hetê sinifê hîrêne ra ameyê nuştîş. Wendekarî demo ke nuşteyan nusenê û nameyê xo kovare de vînenê zaf keyfweş û zerrîweş benê. Nê wendekaran ra zî tewr zaf wendekarê sinifê yewine qayîlê Zazakî nuşteyan binuse. Nê nuşteyê folklorî gorê fekê mintîqa nusyayê û nuşteyê bînî zî gorê wendekaran nusyayê, têkilî înan zaf bêbiyo. Ma hêvî kenê ke hûmara ê bînan de wendekarê ma xo hema zaf gramerî Zazakî de aver berê û nuşteyanê xo gorê ê kitabî ke heta ewro zaf nusyayê û vila bîyê sey înan binuse.

Ma zaf weş zanê ke yew merdimî newe dest bi nuştîş û wendişî kerd hema zaf qayîlo gorê fekê xo binuso û biwano. No sebeb ra ma ganî tewr zaf fekê xo xeylê bimuse û dima hetê standart Zazakî ra şêrê. Edebîyatê ma yo nuşte zaf çin o û ma no kar de hema zaf newe yî. Eke ma zerrî ra û jîhatî yew hewa de ziwanê xo rê, edebîyatê xo rê wayîr vecî û demo kilm de ma Zazakî xeylê aver benê. Nê! Eke ma her çiyê xo de sist bibê û ma zaf apey manenê. No tepa mendîş de obalê ma her kesî esto; çimkî ma xo rê wayîr nêvecî şar nîno û ma rê wayîr nêvecîyeno.

Şima ke sey zanî na kovara Laserî hem Zazakî ya hem zî Kirdasî/Kurmancî ya. Kirdasî gorê Zazakî zaf aver şîya û enka Kirdasî de bi hezaran kovarî vecîyenê. Ma hêvî kenê û Zazakî zî xo her mewzû de aver bero. Leteyê Kirdasî û Zazakî enwa yew lete yî: Ma demo ke dest bi unîwersîte kerd û qalîkerdişê ma esto, wendiş û nuştîşê ma çin o. Ma mektebo verên ra dest pê kenê û wendekarî goreba di aşman zaf çetînê ancenê. Di mangan ra dima hin her kes yewbin zaf weş fehî keno û yewbin reyde qalî kenê. Tay wendekarî zî estî û bi Tirkîya Îstanbulî Zazakî û Kirdasî wanenê.

Ma yew hete ra zî nuşteyan arêkerdiş û hetê raştkerdiş ra zaf çetîne ancenê. Eke wendekarê ma destek û paştî bidê ma, ma zaf şa benê. Heta hûmara hîrêne bimanê xeyr û weşî de...

# Laser

Fanzîna Xwendekarên  
Zanîngeha Çewlîgê

**Hejmar: 2 Sal: 2016/3**

## Koma Laserê (Kurmancî)

Ahmet Subaşi  
Ejder Êlih  
Haşem Tilkî  
Hasan Filitoğlu  
Mazlum Özel  
Sabri Külter  
Şenay Asutay  
Tufan Yamaç  
Zübeyr Durmaz

## Koma Laserê (Zazakî)

Şahap Laçın  
Ceylan Uçar  
Hüseyin Rodî Keskin  
Hülya Orman  
Mîhrîban Çakan  
Şenay Asutay

## Berpîrsê Aboriyê

Zübeyr Durmaz  
Klûba Ziman û Wêjeyê – Klûba  
Ziwan û Edebîyatî

## Belavkar

Klûba Ziman û Wêjeyê – Klûba  
Ziwan û Edebîyatî

## Rûpelsazî

Ridwan Xelîl

## Wêneyê Bergê

Gundê Qayikê  
derdora 1960an, Çewlîg

## E-mail

kovaralaser@gmail.com

## Ji Koma Laserê

Merheba xwînerên delal, kovara me piştî xebateke dûvdîrêj bi hejmarê duyem ve niha li ber destê we ye. Nivîsên me di vê bihara tijî bi xêr û bereket de dê bi hev re wek Laserekê li malên we biqelibin û dê we ji xêr û bereketa kurdî (kurmancî û kirdkî) têr bikin. Fanzîna me bi îdîaya ku dê bibe yekem kovara xwendekaran a bi du zimanî ketibû rê û niha bi awayê piştrastkirina vê îdîayê di destê we de ye. Di vê hejmarê de nivîsên kirdkî li gorî ya yekem bêtir cîh digirin û bi vê yekê ve Lasera me axirî cilên xwe yên resen li bejn û bala xwe kir. Herwiha mebesta hevpariya kurmancî û kirdkî jî di bin vê rêbaza tekûz de hewla qalîteya wêjeyê hevpar dide.

Di vê hejmarê de hevpeyvîneke bi helbestvanê hêja Berken Bereh re hatiye kirin ku helbestvaniya xwe bi kurtasî nixrandiye; destpêka helbestvaniya wî û di helbestnivîsê de ew tiştên ku jê re dibin îlham bi kurtasî rave kiriye. Jiyana beriyên me çawa bû; bi çi egle dibûn, têkiliyên di navbera wan de çiqasî xurt bûn, hest û ramanên wan li gorî çi dimeşyan, miriyên xwe çawa binax dikirin, mirin ji bo wan dihate çi wateyê. Di nivîsa bi navê Kolana Şikefta Şanîdanê de bersiva van pirsan û yên wekî wan tên dayîn. Herwiha giringiya vê şikeftê ew e ku ev şikeft li ser axa Kurdistanê ye. Mijara nivîseke me jî, baweriyên pûç e ku yek ji parçeyê çanda me ya kevnare ye û niha jî kêr zêde ji aliyên hin civakan ve tene dîtin. Ev nivîs li ser sedemên derketina van baweriyên û bandora wan a li ser civakê sekiniye. Ji bilî van ev hejmar bi çirokan jî xemilî ye; serpahitiya Apê Felemez û bêparmayîna ji bîst zarokan, mirina firewnê Mîsra kevnare û trajediya Menesê xizmetkar, serboriya ecêb ya Solîna piçûçik, hin ji van çirokan in. Herwiha ev hejmar şanoyekê jî dihewîne. Bi taybetî beşa zazakî de, berhevkarîyên pîr biqîmet hene. Kovara me wê hertim beşeke xwe ji bo berhevkarîyên keresteyên folklorîk terxan bike. Lêbelê ne pêkan e ku ez di vir de qala hemû nivîsan bikim.

Em hêvîdar in ev nivîsên ku ji aliyê nivîskarên ciwan ve hatine nivîsandin dê we dilşad bikin û dê bibin sedama bîranînên we yî ciwanîyê. Bi hêviya hejmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de.

## Teleyî / Naverok

Hespê Reş .....	4
Apê Felemez.....	6
Digel Helbestvan, Nivîskar, Wergêr Berken Bereh Hevpeyvîn .....	10
Kolana Şikefta Mezin; Şanîdar .....	13
Ji Kelepora Zaroktiyê, Hêviyên Pûç An Ji Baweriyên Durî Aqil .....	18
Quncika Demê .....	22
Fabl .....	24
Geşta Bimbarek û Qenciya Xwedê .....	25
Cudahiya Axaftina Herêma Behdînan .....	29
Şano .....	30
Mirinek Ji Nedî Ve.....	35
Jiyaneke Xerab Celebeke Mirinê Ye .....	39
Şamtirsonek.....	42
Leyli û Mecnûn .....	44
Keçelek Qonzo .....	47
Kayê Satrancî.....	50
Verg û Astue.....	52
Kayê Çalik .....	53
Osman Beg û Emoy.....	54
Kerrêxalî .....	59
Remayîşê Urisî.....	61
Wextê Xel.....	64
Wey Deran O.....	66
Kitabê "Dêsan De Sûretê Ma Nimite" Yî Ser O .....	68
Eh Gej .....	70
Nameyê Werdî: Pelxaç .....	70
Nameyê Werdî: Keşk.....	71
Nameyê Werdî: Melxuta.....	72
Gujo.....	73
Kitabê Hikayeyan "Piyê Mi Kemane Cinitêne" Ser O Krîtîk .....	74
Dizdê Peyvan (Çekuyan) Séchu Sende .....	76
Werê Mehellî Ê Pali: Dualmêyê Tirş (Simaqin).....	78

# KOLANA ŞIKEFTA MEZİN; ŞANÎDAR

*Ejder Êlih | Pola Sêyem*



Dîroknas û erdnîgarnas, berî salan peyitandine ku kurd ji heyamên kevnar heta niha her niştecihên Kurdistanê ne. Mezopotamya, axa di navbera çemên Ferat û Dicleyê de, bûye navenda şaristaniyên qedîm. Wekî ku tê zanîn şaristaniyên wek Sûmeriyîyan (BZ 4000- BZ 2350), Akadiyan (BZ 2350-BZ 2150), Asûriyan (BZ 2000- BZ 609) û Babîlan (BZ 1900-BZ 539) li vê herêmê şaristanî û dewletên mezin ava kirine û pirr tiştên nû yekem car li ser vê axê ceribandine:

Yekemîn bikaranîna nivîsa bizmarî û pêşketina astronomî, tendurûstî, matematîk, mîtolojî û ziman, yekemîn zagonên nivîskî (Zagona Urgakîna), yekemîn artêşa bipergal, pergela dewletê ya navendî, bi saya bazirganiya Asûriyan hatina nivîsê, yekemîn bi awayekî pergali girtina hesabên hîv û tavê, çêkirina pêçke hwd...

Û ji wir pê ve heya niha gellek dewletên bi hêz li vê heremê saz bûne, hin ji wan jî ji aliyê kurdan ve hatiye ava kirin, bo nimûne; dewleta Medan, Revadî, Şeddadî, Merwanî hwd...<sup>1</sup>

Herêma Kurdistanê ji bo dîroka mirovatiyê, ji ber sedemên navhatî, cihêkî biqîmet e. Ji berê de, kesê ku li nîşaneyên destpêka mirovatiyê digeriyan, bi saya şûnwarnasên ku li ser Mezopotamyayê (ango herêma kurdan) lêkolîn dikin, ferq kirine ku ev der ji bo destpêka dergûşa şaristaniyê cihêkî pirr girîng e. Şûnwarnas ew kes in ku dixwazin bi karê kolandinê zanyariyan derbarê bermayiyên di binê erd û avê de derbixin û wan ronî bikin, dikin. Yek ji xebatên muhim ya arkeologan jî kolandina Şikefta Şanîdarê ye. Şanîdar, di derheqê

civaka yekemîn de agahiyên girîng dide. Mirovên hov çawa bûn, dişibiyên çî, tirsên wan li ser çî bûn û ji mirin û defnkirinê çawa ditirsîyan? Kolandina Şanîdarê bersiva van agahiyên dide û bi eşkere agahiyên balkêş tîne ber çavan.

Şikefta Şanîdarê di navbêra salên 1951-1960an de ji aliyê Ralp Solecki û tîmê wî ve hatiye kolandin ku cihê bermayiyên Neandertal e. Li herema Zagrosê Kurdistanê bi berpala çiyayên Bradostê 2500 metre bilindahiyê de dimîne. Ev şikeft di rojhilata kaniya Zapê de dimîne û ber bi kaniyê û pê ve rê bê kudandin, mirov ji dûr ve dikare wê bibîne.

Şikefta Şanîdarê, li gorî şikeftên dora xwe şikefta herî mezin e. Bilindbûna destpêka şikeftê 8 metre ye û firehbûna wê jî 25 metre, wekî şiklê sêkoşe dixûye. Bi saya vê firehiyê, tîrêja tavê digihije heyanî nava şikeftê. Ji ber vê sedemê jî di demên berê de ev der wek wargeh hatiye bikaranîn. Çimkî hem cihêkî fireh û sergirtî ye, hem jî heta dereceyeke mezin dikare ji germahî û rohniya tavê sûtê werbigire.

Berî ku kolandin bête kirin, şikeft ji aliyê malbateke kurd ve ji bo heywanan wekî axûr dihate bikaranîn. Di nava şikeftê de, holik, bixêrî û hewş ava kiribûn. Ji ber vê sedemê jî dîwarên şikeftê rîpîrêş bûbûn.


### **Kolandin û bermayiyên Neandertal**

Neandertal an jî mirovên Neandertal kî ye û kî baweriya xwe bi wan tînin?

Zanyarên peresînê dipejirînin hebin, yên ku nepejirînin jî hene. Li gorî fikra zanyarên peresanparêz; Neandertal, cinsekî ji ya mirovan e ku nêzî sih hezar sal berê

<sup>1</sup> Bnr. Muhammed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê, weş. Avesta, 2012.*





Kiloxa Şanîdar I

jiyane. Cûdatiya van ji ya mirovên roja me ev e ku qerqûdeya wan bi hêztir e û kiloxê wan jî mezintir e. Zanyarên peresanparêz li ser Neandertalan agahiyên zêde pêyda kirine. Lewra Neandertal, di şkeftên berespîde jiyane. Şikeftên bi berespî jî ji bo muhafazaya fosîlan baştir in û fosîl heya dema me di vê şikeftê de xwe muhafaza dikin.

Di Şanîdarê de ji jor ber bi jêr ve, di her tebeqeyê de gelek nimûne/mesterehene ku çand û heyamên cûda temsîl dikin. Tebeqeyên ku ji aliyê stûrbûnê ve nêzî 15 mîtroyî ye û di tebeqeya herî jêr de ji heyama Paleolîtîka Navîn û Jor, heya ku ber bi heyama Neolotîkê ve şopên çandî di nava xwe de dihewîne. Qerqûdeyên ku hatine dîtîn tev di şikeftê de bûn, hin ji wan di binê zinaran de, yên din jî di nava kumbiran de

bûn ku ji xwe re çêkirine. Ji hin miriyan re gor nehatiye çêkirin. Şanîdar di nava xwe de nêzî 15 mîtro xilte dihewîne û ev xilte jî ji xilteya şikefta La Chapelle aux saint<sup>2</sup> (1 mîtro) qat bi qat mezintir e. Di vê kolanê de qerqûdeyên ku ji 60-80 hezar salî ne, hatin dîtîn. Ji van qerqûdeyan neh heb ji aliyê temen û bitûniyê ve Neandertalan nîşanî me dide. Ji qerqûdeyan yên herî navdar ya I û IV e.

**Şanîdar I:** Mirovekî pîr e, bi navê 'Nandy' tê nasîn. Temenê wî li gorî zanyaran di navbera 35-45 salî tê qabûl kirin.

Lêkolînên ku zanyaran li ser qerqûdeyê kirin digihîjin wê encamê, gava ku qerqûde ciwan bûye ji serê xwe derbeke pelixî xwariye û bi vê rewşê jiyaye. Bi rast hatina wê derbê piyê rastê seqet, di hestiyê milê wî yê rastê de du şikestî û di çavê çapê de jî koritî peyda bûye. Ev nîşanê me dide ku birîn piştî demekê ber bi başbûnê ve çûye. Ji van birînan yek jî nebûye sedema mirinê. Ev rewş diyar dike ku Şanîdar I, eger di saxiya xwe de alîkariya civakê nesitanda, ne pekan bû ku zindî bimaya.

**Şanîdar II:** Ev qerqûde yê mirovekî berdardar e. Ji bo ku kilox û hestiyên wî perçiqîne nîşanî me dide ku ev şanîdar di şikeftê de li ser zinarekê de ketiye û miriye. Delîlên ku hatin dîtîn, definkirina wî li gorî hin ritûelan pêk hatiye û li ser gora wî jî hin kevîrên xemilandî hatine dîtîn.

**Şanîdar III:** Qerqûdeya mirovekî berdardar e. Digel Şanîdar I û II yê vî jî di heman gorê de hatiye defn kirin. Jiber nexweşiya Osteoarthritis, êşa pî jî tevgerên wî bi sinor dibû. Li gorî fikira şunwarnasan

<sup>2</sup> Di sala 1908an de ji aliyê şunwarnasên wek Jean, Amédêê Bouyssonie û L. Bardon ve Fransayê li herema La Chapelle-aux-Saintsê de kolandin hatiye kirin. Qerqûdeyê bêkemasî hate dîtîn û ji aliyê paleontolog û jeolog Marcellin Boule ve ew hestiyên qerqûdeyî top kiriye û kiriye yek.



Şanîdar III ji aliyê mirovekî nûjen (Homo Sapiens Sapiens) ve hatiye kuştin, ev angaşt ya zanyaran e. Li gorî lêkolînên zanyaran di navbera du dijçûreyan de êrîş pêk hatiye û herdu çûreyên mirovan hevdu kuştine.

**Şanîdar IV:** Pozîsyona wî bi ramedanekî cenîni bûye û qerqûdeya mirovekî berdar/navsere bû, temenê wî di navbera 30-45 salan de bûye. Di nava hemûyan de yê ku nêrîna zanyaran palpiştîdike ev qerqûde ye. Li ser bermayiyên qerqûdeyî şûnwarnas rastî gelek kulîlk û giyayan hatin. Ev rewş diyar dîke ku defnkirin bi ritûelî pêk hatiye.

### Gerikên tenduristiyê (Toza Kulilkan)

Wekî din hin keşfên din jî hene. Ev keşf di sala 1968an de ji aliyê Arlette Leroi Gorhuan ve derketiye holê. Lêkolînên ku hatine kirin dide nîşandan ku ew mirovên di Şikefta Şanîdarê de jiyane, gerik (toza kulilkan) berhev kirine û ji wan nebatên pirkulîlk peyda kirine. Di qerqûdeyan de heft çûreyên gerik hatine dîtin.

Piştî lêkolînan hatiye fehm kirin, ji bo ku bîst çûreyên gerikên nebata ji ajalên kovî û mirovên biyanî biparezin, di nava fetilok û li hêla navîn a Şikefta Şanîdarê de hatiye veşartin.

Ev keşf eşkere dîke ku di şikeftê de ji çar mirovan zêdetir kes jiyane û nebatên ku di şikeftê de hatine dîtin, destnîşan dîke ku wan xwestiye ji bo cerba zanistiyê (pêşveçûn) bi kar bînin.<sup>3</sup> Di şikeftan de gerik hatine dîtin û kesên ku di şikeftê de jiyane, bi wan gerikan xwestine ku dermanên hin nexweşiyên peyda bikin, bo nimûne verişiya mîz, sîqilandin, sekinandina xwîne û ziwakirina îltîhabê. Gerikên ku di Şikefta Şanîdarê de hatine keşf kirin jî ji van dermanan in û bi vê sedemê Şanîdar jî wek şikeftên jor tê hesabandin. Şanîdar, wekî ku me li jorê jî qal kir, pir girîng e. Ne tenê ji bo defn-gor ji xeynî defnê xizmetên pir balkêş jî bo tenduristiyê jî hatiye dîtin.

Serokê kolandina şikeftê Ralph Solecki di sala 1971an de, di pirtûka xwe ya bi navê Shanidar, The First Flower People (Şanîdar, Yekem Mirovên Kulîlk) dibêje: "Vedîtina kulîlkan bi têkildarê Neanderthalan, em



<sup>3</sup> Bnr: *Archaeology*, Robert L. Kelly-David Hurst Thomas r. 215

ketin wê ferqê ku gerdûnitiya mirovan û hezkirina bêdewiyê diçe, ji sînoren cureya me derbas dibe.”<sup>4</sup>

### Encam

Şikefta Şanîdarê ku di nava sinorê Kurdistanê de cih digire, ew berjeng e ji bo hebûna têkoşînên Neanderthalan ji nexweşiyê, siruştê, mirinê û pîrbûnê. Defnkirina wan her çiqas ne wekî roja me be jî ji tevgerên wan tê dîtin ku wan jî wekî me hurmet nîşanî miriyên xwe didan. Herwiha wan jî bo parastina miriyan jî gorên komî ava kirine. Li ser baweriya Neanderthalan pir zêde teorî hene û hê jî niqaş li ser van teoriyan berdewam dikin. Mirov bi van kefşa di navbera Heyama Kevir û Neanderthalan de têgehên cûdatî-şibandî dikare bîne pê. Û digel van, eger bi definên Asya, Afrîka û Ewrûpa re bîn berawirdkirin, encamên balkêş dikarin derkevin holê. Tenê bi van kefşan, ne pekan e ku gengeşî bi dawî bibin û bersivên hemû pirsan derkevin holê. Feqat nebatên ku tenduristiyê tekildar in an jî rêbazên wan divê me bigihine asteke jortir, hema nebe jî me ji tarîtiya Heyema Kevirî dikarin hinek ji dûr bixe.

### Çavkanî

- Behçet Çiftçi “İnsanlığın başladığı mağara:Şanîdar”
- What the Shanidar cave burials tell us about Neanderthals: <https://wonderfuloldthings.wordpress.com/2014/01/28/what-the-shanidar-cave-burials-tells-us-about-neanderthals/> (08/01/2016)
- Ian Douglas, “Neanderthal ‘flower children’ burials theory debunked”, The Telegraph, (09 Oct 2015)

<sup>4</sup> Ian Douglas, “Neanderthal ‘flower children’ burials theory debunked”, The Telegraph, (09 Oct 2015)



### XWELÎSERÎ

Mazlum Özel | Pola Sêyem

*Ji xeynî çend qêrînên bêdeng  
Tîştêk ji devê min dernayê  
Dil dixwaze bi pênuşê  
Penaberî û xwelîseriyê  
Tîştinan xêz bike  
Lêê...  
Hest diherbilin  
Gotin dixitim  
Û çîrok diqedin...  
Ma pêkan e bi zimanekî jîndar  
Qala mirinê bê kirin?  
Ji xeynî çend hêsirên ziwa  
Tîştêk ji destê min nayê  
Dil dixwaze bi lasera çavan  
Bixeniqîne zalim û zilmdaran  
Lêê...  
Rondik diçikin  
Hêvî digevizin  
Û firîşte difirin...  
Ma bi risasê  
Stêrk vedimirin?  
Bifirin firîşteno bifirin!  
Bi bal Rebbê xwe ve bifirin  
Û bawer bikin  
Hûn ê li wir birçî nebin...*

# JI KELEPORA ZAROKTIYÊ, HÊVIYÊN PÛÇ AN JÎ BAWERİYÊN DURÎ AQIL

*Sabri Kûlter | Pola Sêyem*



Em biçûk bûn. Me baweriya xwe bi gelek tiştan dianî. Niha çiqas li ber çavên me bêwate xuya bike û di nav gûmanê de be jî me bawer dikir. Baweriya zarokane, saf û jidil.

Lêbelê ji ber ku di dilê me de hêvî hebû me baweriya xwe bi “eger”a rastîbûna wê danî. Hin caran sedem tirs bû, hin caran ewlehî an jî bê çaretî bû. Me bi dilê xwe yê zarokî nedigirt û me digot, dibe ku rast be. Bi vî awayî dema ku em bi bûyerekê re rû bi rû bimana, me hêviya xwe bi wê baweriyê ve girê dida.

Sedemên bingehîn yê ku bûye zemîn ji bo derketina van baweriyên curbicur in. Li ser baweriyên pelepûç pirr tiştan tesîr kiriye; bandora olî, faktora kevneşopiyê, ji bûyerên kevnare, pêkhatineke tesadûfî, çîrokên mîtolojîk, arketîpê û hwd.

Çawa ku li hemû heremên cîhanê baweriyên pelepûç hene wisa jî li Kurdistanê jî bi heman rengî baweriyên dûrî aqil hene ku bi taybetî zarok bi temamî pê bawer dikin. Helbet ne tenê zarok hin deran, hemû civak jî baweriya xwe bi hin tevger û bûyeran tînin. Lê bi demê re, bi pêşketina ilm û zanîne, berbelaviya alavên teknolojîk û perwerdehiyê re hin bawerî êdî nayên bîra tu kesî. Lêbelê, di civakên paşdemayî de, ku civaka me jî parek ji vê paşdemayîne hildaye, baweriyên bi vî rengî çalaktir in û endamên civakê an bi temamî, an jî qismî baweriya xwe bi hin bûyer û rîtuêlan tînin.

Di vê nivîsê de em ê li ser baweriyên li Kurdistanê rawestînin, ew baweriyên ku di nav zarokan de belav bûne û dema ku em wan tînin bîra xwe bi gelemperî zaroktiya me jî tê bîra me. Berê pêşîn, em ê baweriyên pûç pênase bikin, piştî jî derbasî mînakên bibin ku min ji zaroktiya xwe û ji hevalên xwe berhev kirine.

Li gorî zanyaran pênaseya baweriyên pûç ev e: Baweriyên pûç ew tişt in ku bingeha xwe ji mantiqê nestînin, encameke wê ya rastî tune ye, tevger û bûyerên bi van baweriyên re têkildar in nehatine peyitandin, lêbelê bi awayekî balkêş di bîra civakan de cihê xwe wergirtine:

#### Mînak:

- Gava ku kêr di destê yekê de be û wê kêrikê dirêjî yekî din bike, divê di pêşiyê de wê kêrikê deyne erdê û wisa ewê din jî kêrikê hilde. an jî .....
- Dema ku yekê şimika xwe berevajî li xwe kir, tê gotin ev tişt bêyomî ye. Divê sererast bike.
- Di vexwarina çay de kesek di piyaleya xwe de rastî du hep kevçikan bê, ji wî kesî re dibêjin tu yê di mezinahiya xwe de du jinan binî.
- Bi şev divê kes fita (fikinî) nede, tê gotin eger ku kesek fitan bide gazî şeytên dike.
- Dibêjin kesê ku stêrka bijimire, yê pêşerojê de kor bibe.
- Tê gotin dema ku yekê pêlî nanî kir, nan dide ber qêrînan ku deng diçe asîmanan.
- Kesê ku heft zirkêtkî (yan jî gumgumok) bikûje ew ê biçe cînetê.
- Eger kesek di bin keskesorê yan jî li ser keskesorê re derbas bibe, dibêjin ew kes yê eger kur ber wê bibe qîz, eger qîz wê bibe kur.
- Ji bo mûriyan tê gotin ku yê reş file ne, yê zer jî misilman in. Ji bo vê yekê gelek caran mûriyên reş rastî komkûjiya dihatin.
- Gava ku yekê neynikên xwe birî, kesekî din jî bê neynikên xwe li ser neynikên wî/wê de bibire, tê gotin ku ew herdu kes yê bibin dijminên hev.

- Kesê ku Qurana Kerîm bi berovajî bixwîne, dibêjin ew kesê bibe efsûnkar.
- Dema ku kesek piştî razanê rabe û ser û çavên xwe neşo, dibêjin şeytênê bi wî/wê re xwarin bixwe.
- Eger di nav porê kesekê de du hep nêvik hebe, dibêjin ewê herî kêr du caran bizewice.
- Dibêjin gava ku kesekê zirkêtkê dît, eger bibêje şîrîn şîrîn zirkêtk ber bi wî ve tê, dema ku got tehl tehl zirkêtk ji wî dût dikeve.
- Gava ku pelîtankek têkeve hundirê mala kesekê dibêjin mizgîniyekê bê ji wê malê re.
- Dibêjin kesê ku şeva dereng biçê kadînê, kalê kadînê yê bê wî.
- Gava ku mêvanek çû malekê, eger xwediye wê malê hindêk xwê bixe pêlava wî mêhvanê, dibêjin, ew mêvan wê di demeke nêzik de ji wê malê biçê.
- Dema ku gumgumok li hemberî yekê serê xwe rake û li wî kesî binihêre tê gotin ku ew gumgumok çêra yan jî nifira

li wî kesî dike.

- Dibêjin dema ku kesekê beqek kuşt, li ser laşê wî kesî behlûkê çêbibin.
- Gava ku kêzaxatûn bifire bê dane ser derekî ya kesekê û nefire tê gotin ku îro belayekê yê bê serê wî kesî.
- Dibêjin dema ku kesekî li ser piştê kesekê siwar bû û ew kes bikare wî zêde hilbigre dibêjin kêra bavê wî tûj e, na eger ku nekare wî zêde hilbigre dibêjin kêra bavê wî ne tûj e.
- Gava ku berfa pêşî dibare, dibêjin ev berf nayê xwarin, kesê ku bixwe dibe keçel.
- Dibêjin kî binê laliyê bialêse di daweta wî de baranê bibare.
- Kesê ku şeva îne benîştî bicû, tê gotin heçko wî goştê miriyan cutî.
- Dibêjin kesê ku qûna beqî maç bike, yê wê deqeyê de hîna avjeniyê bibe.
- Mirovê ku tiliya xwe dirêjî goristanê kir, divê gez li tiliya xwe bike yan yê bibe sedema bêyomiye.
- Dema ku kesekê miriyê heywanekê dît,

divê serê xwe bixûrîne û tif bike erdê pora wî yê biweşe.

- Gava ku kesekî/ê nanê şewitî xwar dibêjin, ew kes yê di demekî kurt de ji xwe re pere bibîne.
- Tê gotin kesê ku tolaşê zebeşî yê sipî bixwe pora wî yê spî bibe.
- Dibêjin mirovê ku şeva pêncsemê pîvazî dixwe miriyan aciz dike.
- Tê gotin gava ku kesekê di nav çaya xwe de darikek kin dît, dibêje mêhvanekî kin, na eger ku darik dirêj be dibêje mêhvanekî dirêj yê were mala me.
- Gava ku mirov çay vedixwe binika şûşeyê bi şûşeyê ve bizeliqe û heta ku qûrtek ji wê şûşeyê tê vexwarin nekeve, dibêjin ew mirov çi dua bike yê qebûl bibe.
- Tê gotin kesê ku ji dara gûzê bikeve, yê di mezinahiya xwe de kêr aqil bibe.
- Dibêjin kesekî xwe li ser bebekê re biavêje, dibêjin ew bebek yê biçûk bimîne.
- Dibêjin gava ku hin mêhvan hatin malekê û çay vexwarin, heta ew firaq ji wê erdê neyê rakirin, mêhvan nikarin derbikevin. Eger ku derbikevin qîza wê malê yê bimîne malê de.
- Gava ku kesek qala marekê bike û marek nêzî wî bibe, ji bo ku ew mar li wî kesî ve nede divê bibêje maro maro me behsa te nekir me behsa sola xwe kir.
- Dema ku didanê kesekê ket ji bo ku ji şûna wî didanî didanekî spehîtir derbikeve, dibêjin ew kes divê wî didanî di bin çoqên xwe re biavêje û bibêje; pîrê pîrê hanî ji te re vî didanê pûç, bîne ji min re didanekî zêr.

Belê, em dikarin bi vî şiklî gelek baweriyên lê zêde bikin. Lêkolînên ku min

kir, da nîşandan ku ji van baweriyên li bajarên Kurdistanê li deverên cûrbicûr, bi varyantên xwe yê cihêreng hatine gotin. Belavbûn û mayîna van baweriyên jî bi saya zarokan û kêr be jî bi xêra mezinan nîfş bi nîfş gihaye roja me. Me di serî de jî destnîşan kir ku derketina van baweriyên ne ji bingehekî rasteqîn tê û çêker jî ne diyar e, ji bo vê jî gelêrî ne. Yanî kesekê/î bi tesîra tiştêkê, baweriyek derxistiye û belav bûye.

Wekî gotina dawî, bêgûman baweriyên bi vî terzî, yan jî bi awayekî cuda di nav her gelî de hene û çiqas ku van baweriyên zêdetir di demên biçûkî de li ser me bandorekî çêkiribe jî, niha jî em di nav axaftin û gotinên mezinan de bermayiyên van baweriyên dibînin. Yanî kêr be jî di nav gel de hêj jî bandora van baweriyên heye û hê jî li hin deveran pîr kes bi van gotinan 'emel dîkin.

## EZ RÊWÎ ME

Murat Kara | Pola Duyem

Şev e

Xewnên min dane dû min

Ez rêwî me...

Rêwiyê çiyayê Agiriyê,

Bê mirûz...

Dayika min li wir e...

Bav û kalên min jî...

Agirî kolozeke spîçil daye serê xwe...

Hewa sar e, dil tijî ye...

Agirê dilê Agiriyê sergirtî ye.

Kes nabîne...

Ne ez...

Ne tu...

Ne em...

# QUNCIKA DEMÊ

Tufan Yamaç | Pola Sêyem

Saet hatibû çarê piştî nîvroyê, sekretera bijîşkî nivê laşê xwe yê jar ji deriyê odeya bijîşk derxistibû û bi dengeke ji xwe aciz navê wî ji kaxiza spî, ya ku di destê wê de ye dixwend. Te yê bigota qey dê ew ê neçe ba bijîşk; lê ew di girtîgehê de bû û pasban jî ji bo ku wî bibira ba gerînendeyê bêrehm, bang li wî kir. Her çiqas rêya wî bi girtîgehan ve neketibû jî niha romanên kuwî xwendibû bandoreke mezin li xeyalên wî dikir û ew nedikaribû hişê xwe ji mijûlbûna wan xeyalan biparasta. Dema ku bi dûmenên girtîgehê ket nav xeyalan û kêlîkek ponijî, ji nişka ve bi heman dengî veciniqî:

- Ferhan Sefkan!

Keça sekreter cara sêyem bang li wî kiribû û wekî ku ava cemed li rûyê wî yê germ ketibe, hatibû ser xwe. Ferhan ji rûniştêkê hêdî hêdî rabû û bi rûyeke ramandar ber bi odeya bijîşkî ve çû. Êdî sekretera ku di berstûka wê de navê wê wekî "Solîn" hatiye nivîsandin, jê fêhm kiribû ku nexweş ew e, serê xwe xist hundir û çû. Dema ku Ferhan ket hundir, dûmeneke xerîb nedît. Li ber devê derî, li milê çepê maseya sekretera dengpasbana jar û navbireke ji textik, çend mîtro li pêş jî maseya bijîşkî





hebû. Bêhna çaya şîn li her derê odê belav bûbû ji fîncana li ser maseya bijîşkî. Ferhan ji serê odê ber bi maseya bijîşkî ve çû, bijîşkê ku dirên xurt li çaya xwe ya şîn xist.

- Navê te?

- Ferhan. Ferhan Sefkan.

- Kerem bike, rûne lawê min. Li piyan neseke.

- Spas...

Piştî vê axaftina kurt, bijîşk li ser kaxiza pêşiya xwe tiştê nivîsî. Her çi qas tiştê ku bijîşk dinivîsand li ber çavê Ferhan bû û Ferhan jî her çi qas ku ji ber evîna romanana muptelayê nivîsî bû jî, wekî her kesî/ê wî jî ji nivîsa bijîşkî tu tişt fêhm nekiribû.

- Ferhan. Erê erê... Tu niha hatî bîra min. Ez li ser encamên testên te gelekî sekinîbûm. Tu gelekî cixareyê vedixwî.

- We jî encamên testên min tenê ev fêhm kir?

Bijîşk kenîya û got:

- Na, tiştên din jî hene. Bijîşkê din ê ku li testên te mêze kiribû mafdar e. Cixareyê zirareke mezin daye kezêba te. Nêzî du sal e ku tu penceşêrî. Divê tu bisekinî. Eger... Heyf e ji te re ku tu wisa berdeyam bikî. Tu yê xwe bikujî Ferhan.

- Gelo divê niha ez matmayî bimama? Nizanim doktor beg. Sankî ez hînî vê rewşê bûme.

- Her çiqas ku du sal derbas bûbe jî dereng nîne. Divê tu teqez dev ji cixareyê berdî. Ji bo te îhtîmala başbûnê jî heye. Tiştê ku te dîkujê, te baş nake. Xerabtir dîke.

- Baş e doktor beg, ez ê vê mijarê bifikirim. Lê divê niha ez biçim.

- Tu dev jê berdî dê ji bo te baştir be. Ka bisekine ez rapora te bidim. Tu yê vê raporê roja pêncşemê bidî beşa daxîliyeyê. Tu yê li gorî wê tedawî bibî.

Piştî ku Ferhan ji nexweşxaneyê derket û ji sermayê fermuara montê xwe kişand, pêşî dest avêt bêrika xwe û ji pakêta cixareya xwe cixareyek derxist û bi hestên tevlihev agirpêxist. Dema ku dûmana cixarê ji nava herdu lêvên berda derve, fikirî û got:

- Dibêjin tu çi biçînî tu dê wî hilînî. Ez dûmanê azad dikim lê kezêba min di hepsê de dimîne. Nelet li vê rewşê be!

Ferhan piştî azadkirina dûmanê dest bi kuxeke giran kir. Kuxika wî ewqas bişid bû te yê bigota qey dê nava wî derkeve derveyê wî. Bi dilê xwe girt û li erdê ket. Roniya zer a rojê û ewrên gewr ên zivistanê li ber çavên wî reş bûn û nefesa xwe ya dawî ya jiyanê da. Nefesa ku jiyanê dabû Ferhan, niha dîsa jî aliyê jiyanê ve hatibû standin.

...

Keçik ji nişka ve bi dengê dêya xwe, ji xewa xwe ya bêhizûr, şiyar bû.

- Solîn! Solîn keçê rabe taştê hazir e. De haydê, nelet li şeytan bîne û rabe.

Solînê çavên xwe yê biçûk bi zorê ji xewa xwe ya giran vekir. Rûyê wê dilop dilop xwêdan dabû û laşê wê jî ji xwêdanê bûbû wekî avê.

- Dayê, ez pir tirsîyam. Ez di xewa xwe de bûbûm mêrekî û ez jî qansêrê dimiriyam. Xwedê... Ev çi bû daye, min tiştêkî wisa nedîtibû!

- Rabe rabe, tu çi dibêjî qîza min, ma te aqilê xwe xwariye? Tobe tobe! Rabe taştê bixwe û birayê xwe Ferhan bibe mektebê.

## FABL

Eylem Akinci | Pola Yekem



Morî Hisên  
rojekê diçe ba morî  
Evdirrehîm û wiha  
dibêje:

- Evdirrehîm!

De haydê em herin bikevin avê. Morî  
Evdirrehîm jî got:

- Ma Hisên tu çi ker î. Ma em bikevin avê  
em ê nefetisin? Morî Hisên got:

- Ma tu çi dehşikê kerê yî. Min li ser  
kompîtirê ew mirovên ku dibêjin ez her  
tiştêkî dizanim guhdar kirin, ew wiha  
digotin: Morî bîst rojan di bin avê de  
bimînin tiştêk bi wan nayê! Morî Evdirrehîm  
got:

- Welleh baweriya min bi wan mirovan  
nayê. Em bixwe li ser vê mijarê lêkolînê  
bikin. Morî Hisên got:

- Belê, va ye Mî Kezban, Mî Şukran û Mî  
Siltan tên û em ê ji wan bipirsin ka bê ew ê çi  
ji me re bibêjin?

Morî Evdirrehîm lê nêrî ku Mî Siltan bi  
awayekî nazdarî dimeşe, tu yê bibêjî qey  
Xwedê ji xeynî wê tu kes neşandiye ser rûyê  
erdê. Zimanê Evdirrehîmî di devê wî de  
nedigeriya û nedikarî bipeyive. Mî kezban,  
Mî Şukran û Mî Siltan hatine cem wan. Morî  
Hisên got:

- Em ê tiştêkî ji we bipirsin. Miyan jî  
gotin:

- Hela bêjin morîno.

Morî Hisên nêrî ku Evdirrehîm lal bûye  
û çavê xwe ji Siltanê venagerîne. Wî Morî  
Evdirrehîm dehf da û got: Ka bêje. Çi li te

hatiye û çi li te qewimiye ku tu wisa lal û gêj  
bûyî. Morî Evdirrehîm tengijî û got:

- Tiştêk li min neqewimiye. Morî Hisên  
got:

- Hii! Miyano! Hûn çi dibêjin em bikevin  
avê? Hûn tiştêkê dibêjin? Mî Şikran got:

- Hûn çi qas nezan in. Hûn bikevin avê  
hûn ê xelas nebin. Ez dixwazim ji we re  
çiroka hevala xwe bêjim. Wê rojê hevala min  
Xecê ket avê bi bihîstina dengê meeee meeee  
ya me mirovek hat lêê xwezika nehatibûya.  
Moriyê wiha got:

- Çima, çibû?

- Ma çi nebû? Wextê ku ew mirov hat  
destên xwe yî reş avêtin qirika Xecê û kêr  
dane ser. Ne bêfedî û ne jî bêeyb li pêşberê  
berxikên wê ew xistin erdê û çiqasî ku bû  
meeee mee ya me lê bêfeyde bû û êdî serê  
Xecê hatibû jêkirin. Hûn xwe şaş nekin û  
nekevin avê hekena welleh ew ê kêrê bidin  
li ser qirika we jî. Morî Evdirrehîm ricifî, û  
Tuxûmê Dejnîkê jî got:

- Birevin çivîk tê.

Mî siltan çû, hiriya xwe li serê  
Evdirrehîm da û got:

- Belê çi bi te bû? Morî Evdirrehîm got:

- Tiştêk nebû. Li min sar e ji ber vê ez  
hejiyam. Mî Siltan got:

- Were bikeve nav hiriya min û em herin  
zozan û mêrgan. Morî Evdirrehîm got:

- Baş e, welleh ez ê werim.

Morî Hisên tenê ma û stuyê xwe xurand û  
çû genim kêşa hindirr...

# GEŞTA BIMBAREK û QENCIYA XWEDÊ

Erol Çoban | Pola Sêyem

Xwestekeke kişker hikum li Hesên û Egîdê Gewrî kiribû. Hesreta axa bimbarek, daxwaza bersivdana Rebbê mezin, her roj zêdetir di dilê wan de bi cih dibû. Li hember wî afirînerê mezin û li hember ewqas afirandinên wî yên bêhempa; bêbersivmayîn, li gorî wan ne karê misilmanekî bû. Wan jî dizanibû ku telafikirina wextê tune bû. Mirin ewqas nêzî ew dihat, êdî jî siya xwe jî ditirsyan. Hêj wan xwesteka xwe bicih neanîne, lê dê mirin wan jî ber xwe ve bikêşe. Li gorî Hesên êdî wext hatibû, gerek hatibûya, divê ew wî barê li ser milê xwe sivik bikin, bersiva ewqas qenciyan, deynê Xwedê Teala bidin.

Hesên êdî biryar dabû gerek îsal ew teqez biçûya wargeha pîrozgeh. Û Hesên çû, biryara xwe jî hevalê xwe re, jî hevalê xwe yê heman rê re, jî xwediye heman xwestekê re, jî heman dildarê cihê pîrozgeh re, Egîdê Gewrî re got. Hevaltiya wan ne hevaltiyeke asayî bû, jî biratiyê jî pêş ve bû û wan jî hevûdu re soz dabûn ku, dê rojekê bi hev re herin hecê, yek bê yê din dê naçe wê pîrozgehê. Hesên û Egîdê Gewrî li heman gundî dijiyan. Kar û barê wan heman tişt bûn. Çandinî û xwedîkirina hin ajalan... Xwedê Teala jî her aliyan ve zêdetir tişt kiribû nesîbê Hesên; tendurustî, bextewarî, dewlemendî û aramî. Sê kurên





Hesen hebûn, wextê kar derdiket, kurên wî jê re alîkarî dikirin. Karê mehekê, wan di deh-panzdeh rojan de diqedandin. Bi dewlemendiyê jî Hesen bê kêmasî bû. Ji ber hindê, xemên Hesen ne zêde bûn.

Egîdê Gewrî ew qas bi talîh nebû. Feqîr bû lê her tim jî bi dilpaqîjî şîkur jî Rebbê xwe re dikir. Kurekî wî hebû, bi navê Mîrza... Mîrza kurek nejêhatî bû, heta bavê wî jê re negota, nedîkarî karekî bêkêmasî bikira. Ji ber hindê dikir nedikir ew derfet nedidît ku here hecê. Ji aliyek ve jî gelek hez dikir ku biçê hecê. Hişê wî her tim li ser çûyîna hecê bû. Dixwest ku hêj jî vê dinyayê koç nekiriye, wazîfeya xwe bi cih bîne. Ji aliyek ve jî hişê wî li ser karên malê û çandiniyê bû. Ji ber ku hemû dewlemendiya wî ew çandini û ew mal bû. Lê xwesteka çûyîne li ser wî zêdetir pêkutî çê dikir. Ew çend sal bû, bi zehmetî û

bi hewldaneke mezin hin pere top kiribû ku pê here wê axa bimbarek. Û dawiyê biryar da ku here. Amadehiya xwe kir. Çend roj beriya çûyîne, karên ku bên kirin ji kurê xwe re got û çend şîret li kurê xwe kir. Serê sibê piştî nimêja sibê Hesen û Egîdê Gewrî xatir û helalî ji malbat û gundiyan xwe xwestin û ber bi riya pîroz re bi rê ketin.

Rêwîtiya wan didomiya, lê hişê Egîdê Gewrî her tim li ser mala wî û karên malê bû. Gelo karên malê çawa dimeşin, gelo dê Mîrza bikaribe kar bimeşîne? Dê rewşa malbatê çawa be? Û bi vî awayî him dimeşiya û him jî difikirî. Heta tav hilat ew qasek bi rê ve çûn. Tîrêja rojê jî êdî ew aciz dikirin, tîbûn û birçîbûn jî bêhna wan diçikand. Piştî hinek rê çûn di bin siyek de bêhna xwe vedan û dest bi xwarin û vexwarinê kirin.

Hesen û Egîdê Gewrî him xwarin dixwarin û him jî li ser babeteke ji bo wan girîng, hesreteke hevpar, bi awayekî dilxwaz herduyan jî pirs ji hevûdu dikirin. Gelo em ê bigihîjin mirada xwe? Gelo em ê wê axa pîroz bi van çavan bibînin? Gelo em ê di vê jiyana kurt de, wê hewayê bêhempa bêhn bikin? Û bi vî awayî, pirs li ser pirsê, xwarina xwe qedandin.

Pîştî xwarin qediya, berê xwe dan riya pîroz û meşiyar. Ji ber ku êdî kal bûbûn, hêdî hêdî dimeşiyar. Her ku dimeşiyar, rê li ber wan kêmbûn û kelecaniyeke bêhempa bi wan digirt. Ew xwêdana ku bi tîrêjên tavê diherikî û ji laşê wan dihat xwarê kelecaniya wan jî zêde dikir. Riya wan dûr bû. Hêj dê gelek bimeşiyana, ev jî dibû bêhtengî ji wan re. Car caran dixwestin wek çûkekê bifirin û xwe zû bigihînin wir. Û di her cihê ku diçûn; gazî çûkan, mûriyan, kûsiyan û hemû candaran dikirin. Werin hûn jî bibin hevalê me û em herin warê bimbarek. Bangî çiya, çem û hemû bizeraran dikirin, ji bo Xwedê ji me re nebin asteng, rê bidin me ku em xwe bigihînin miraza xwe.

Pîştî du sê rojan Hesen û Egîdê Gewrî meşiyar û edî gihîştin gundekê. Gund vala xuya dikir. Gund zêde ne mezin bû. Deh an jî panzdeh xanî tê de hebûn an tunebûn. Ew malên gund jî bi piranî xirabe bûn. Li derdorê jî tu kes xuya nedikir. Mirov fêhm dikir ku di gund de zêde kes nedijiya. Dema gihîştin nav gund Egîdê Gewrî, ji Hesen re got:

— *“Tu hêdî hêdî bimeşe, ez ê herim mala li hemberî me binêrim ka gelo kesek heye li vir an na û heke telefonê hebe bi wê rewşa malê û karên gund ji malbata xwe bikim. Ez ê di rê de xwe bigihînim te.”*

Egîdê Gewrî dema çû ber deriyê malê, derî nivî vekiribû û di hundir de dengê

zarokê dihat. Zarok bêrawestan digiriya û ji diya xwe nan dixwest. Di malê de tenê du jin û zarokê dijiyan. Ji ber ku zêde feqîr bûn, nikaribûn ji gund jî herin û bi awayek neçarî di wê malê de dijiyan. Dema Egîdê Gewrî deriyê malê vekir, bêhnek pîs hatê. Di hundirê malê de jineke kal, nêzî heftê salî, bi devdevkî li erdê dirêjkiribû û nikaribû rabe piyan. Zarokokek jî li wir bû. Êdî ew qas birçî bûbû, ji ber birçîbûnê digiriya û jineke sih, sih û pênc salî li vir bi awayekî neçarî runiştibû. Qet tiştê nedikir. Êdî bêçarebûn û acizbûnî ew jinik jî bêzar kiribû. Dizanibû ku di malê de tiştê xwarinê tunebû ku bide zarokên xwe û bi xwe jî êdî ji ber birçîbûnê nikaribû ew jina li erdê jî rake. Teqet lê nemabû. Egîdê Gewrî bi vê rewşa wan gelek xemgîn bû. Xwe bi xwe fikirî:

— *“Gere ez ji wan re alîkarî bikim.”*

Lê ji aliyekê din ve jî gere ew biçûna bigihîsta hevalê xwe. Hesen li benda wî bû. Mirovahî tiştê herî qenc bû. Egîdê Gewrî neçû, xwest ku alîkariya wan feqîran bike. Û dest pê kir, pêşiyê mal jî serî heta binî ve paqij kir. Ji jinika kal re cihek li serê jor çêkir û ew kir nav nivînan. Pişt re jî çû bajar, bi perê berîka xwe ku ew çend sal bi zehmetî top kiribû, ji wan re hinek nan, rûn, çay, şekir, arvan û hemû tiştên pêwîst bûn yek bi yek kirî û ji wan re xwarin çêkir. Jinik û zarok herdu jî piştî ku xwarina xwe xwarin hinekî bi ser xwe ve hatin. Rûyê wan î ewqas xweşik û paqij, piştî têrbûnê dîsa hat cih. Pişt re jî ew êzîngên li ber derî hemû şikandin. Karên malê û pêdiviyên wan hema hema qedandin.

Êdî daxwaz dikir ku bimeşe, here bigihê hevalê xwe. Lê dema xwest bi rê bikeve, zarokê malê dest bi girînê dikir û bi herdu piyên wî digirt û nedixwest Egîdê Gewrî here. Jinika malê jî heman tişt dixwest. Hez

nedikirin ku ew here, dixwestin ew bi wan re bimîne. Ji ber ku Egîdê Gewrî, wan ji nav rewşeke gelek xirab derxistibû kî dizane belkî wê demê Egîdê Gewrî ji vir derbas nebûya, zarok bimiriyan jî. Ji ber vê yekê, wan xwe deyndarê Egîdê Gewrî didîtîn, hez nedikirin ku ew ji ba wan biçê. Ji ber ku kêfa Egîdê Gewrî jî ji wan re hatibû û nedixwest zarok jî li pey wî bigirî, digot ez ê hinek din bimînim, pişt re ez ê herim. Û bi vî awayî rojek, du roj, sê roj, hefteyek derbas bû. Egîdê Gewrî kir û nekir nikaribû here.

Hesen jî di wan rojên borî de bêrawestan dimeşiya, hin caran disekinî li paşiya xwe dinêrî ka hevalê wî tê yan nayê. Hin caran jî ji cihên ku derbas dibû, ji kesên ku didît re dipirsiya ka gelo kesek di vir re derbas bûye an na... Hesen li hin cihan rûdinişt bêhna xwe vedida. Dibe ku hevalê wî hatibe û derbas jî bûbe, di derheqê hevalê xwe de tu tişt nizanibû. Axir Hesen bê hevalê xwe gihîşt axa bimbarek. Ji aliyekî ve gelek kêfxweş bû ku gihîştiye wê pîrozgehê, lê ji aliyekî ve jî gelek xemgîn bû ku bê hevalê xwe gihîştiye vir. Her roj yek bi yek tiştên ku li ser wî ferz bûn bi cih dianî. Rojên xwe li vir derbas dikir. Hin caran jî dema diçû hin cihan, ji dûr ve hevalê wî Egîdê Gewrî dihat ber çavên wî û kêfa wî dihat ku hevalê wî hatiye. Dibe ku ew pêşiya wî hatibe vir lê haya wî jê tunebe. Lê Egîdê Gewrî her car dûrî wî bû. Hindî dihat, nikaribû xwe bigihîne wî. Dîsa rojekê dema ku Hesen çû ber deriyê şikefta pîroz, dît ku Egîdê Gewrî di nav qelebalixê de derbasî hundirê şikeftê dibe û Hesen li vir jî ber deriyê şikeftê venaqete. Dibêje wextê ji şikeftê derket ezê wî biqefêlim û êdî em ji hev venaqetin. Piştî demekê ew kesên ku di hundirê şikeftê de ne, giş derketin, lê Egîdê Gewrî xuya nedikir. Êdî jî ber vê rewşê şaşmayî dimîne. Bi vî awayî çend caran li hember tiştêkî wiha hat.

Her carê jî wateya vê rewşê fêhm nekir.

Egîdê Gewrî jî ew demeke dirêj bû ku li ba herdu jin û zarok vext derbas dikir. Êdî pereyê ku ji bo here hecê top kiribû, qediyabû. Rewşa wan dilê wî gelek şewitandibû. Ji ber hindê pereyê xwe hemû ji wan re xerc kiribû. Êdî nikaribû daxwaza xwe jî bi cih bîne. Ew xwesteka dilê wî zêde bû, lê vê carê jî mîna her car xwesteka alikariyê di dilê wî de zêdetir bû. Tenê tiştêk mabû: vejer... Û êdî Egîdê Gewrî vejeriyabû mala xwe. Neçûbû hecê û xwesteka xwe bicih neanibû, xembîn bûbû lê gelek jî kêfxweş bû. Ji ber ku sê kes, sê belengaz ji mirinê xelas kiribû, hevîyên wan ên jiyane geş kiribû. Piştî vejera wî, deh roj şûn ve hevalê wî Hesen jî ji hecê vejeriyabû. Hesen çûbû, miraza xwe bicih anîbû. Wekî her car, vê carê jî dilşad bûbû.

Lê Egîdê Gewrî jî çûbû... Xwedê Tealayê mezin, wan rojên ku ew li mala belengazan dima, her roj xewneke gelek xweş dikir nesîbê wî û ew her roj di nav vê xewna xweşik de hişyar dibû. Ew hemû warên pîroz cih bi cih dîtibû û geriyabû.

Lewra: "Mirov qenc be, Xwedê hîn qenctir e."

## DêrsimInfo

Siyaset • Ekonomî • Kultur

Gerek kirmancî her cayê heyatî de vila bo

# CUDAHIYA AXAFTINA HERÊMA BEHDÎNAN

Erdal Taş | Pola Sêyem

Bêguman meriv bi hêsanî dikare bibêje ku di wêjeya kurdî ya klasîk de herêma Behdînan ango devoka wê cihekî girîng digire. Lewra gava ku mirov li wêjeya kurdî ya klasîk dinêre biserkeftineke berbiçav ya vê heremê derdikeve holê. Hema bêje hemû berhemên klasîk yê wêjeya kurdî li vê heremê an jî ji aliyê nivîskarên vê heremê ve gihâştîye roja me. Lê îro gava ku em li vê heremê dinêrin ji ber sedemên siyasî, civakî û aborî ev herem li paş maye, ev paşmayîn him di wêjeya nûjen de him jî zimanekî xwerû li dû xwe hiştîye. Ji ber erdnîgariya wê têkiliya wê û heremên din ên Kurdistanê bakur bi pêş neketîye. Di heman demê de kêmasiya têkiliya bi bakur re, rê li ber têkiliyên Kurdistanê başûr vekirîye. Helbet sedema vê têkiliyê tenê ne erdnîgarî ye, rewşa aboriyê jî sedema bingeha pêşketina vê têkiliyê ye. Jixwe dema ku meriv li axaftina herema Behdînan dinêre bandora başûr û soranî gelekî diyar e.

Ev sedemên ku me li jor jimartin hemû jî reseniyek tevî zimanê vê heremê kirine, nemaze jî li gor axaftina bakurê Kurdistanê cûdahiya axaftina vê heremê gelek xwe eşkere dike. Ji aliyê bilêvkerinê jî ev herem xwerû maye. Dema ku kesên jî vê heremê diaxivin kesê li hemberî wan bi hêsanî dikare ji axaftina wan fahm bike bê ka ew jî ku derê ne. Mebesta vê xebatê cûdahiya hin peyvên di navbera vê heremê û heremên din de nîşankirin e. Dewlemendiya ango bingeha etîmolojiya peyvên vê heremê yek ji palpiştên reseniya devoka vê heremê ye.

Bo nimûne: li herê ma Behdînan ji “nişanlanmak” re dibêjin “destgirtî” yanî

ew kesên ku êdî destên wan bi hev ve ye an jî êdî yê hev in, lê ev peyv li hin heremên Kurdistanê bakur hatiye guherandin û bûye “dergîstî”. Vê peyvê forma xwe li gor bilêvkerinê guherandiye û bilêvkerineke hêsan stendiye ser xwe.

Berik	Dendik
Sotin	Şewitandin
Ber	Kevir
Gundor	Petêx
Şitî	Zebes
Kusk	Kulî
Têgehîstin	Fêhm kirin
Difin	Poz
Pirç	Por
Şalok	Das
Berzebûn	Windabûn
Şohl	Xebat
Aman	Firaq
Law	Xweşik
Sava	Biçûk
Xedare	Çek
Def-Rex	Cem
Birsî	Birçî
Şepilî	Gendel
Qosk	Çeqelik
Heyv	Meh
Limûr	Lêv
Hefk	Qirk
Kilîl	Mifte
Lêbandin	Xapandin
Hinartin	Şandin
Semal	Sahî
Herifandin	Hilweşandin
Şixarte	Kufrît
Mehfûr	Xalîçe



## ŞANO

Ercan Tekin | Pola Duyem

### Xwînerê Pişt Perdê

Mezopotamya dergûşa yekemîn a warê egîd û evîndaran e. Wuşeder, bajarekî mezin ê Împaratoriya Medan e. Welatê pîroz ê Rustemê Zal, ê Selehaddînê Eyyûbî, ê Melayê Cizîrî, ê Ehmedê Xanî, ê Şîrazî û Fîrdewsî ye.

Diyarê Gilgamêş, ê Kawayê Hesinkar û ewliyayan e, cihê Hz. Nuh e yê ku dinya rizgar kiriye û ji nû ve ava kiriye. Bi gotina Ereban "Cezîret'ul-Kurdî ye.

Sê hezar sal berî mîladê di navbera çemên Firat û Dijleyê de keça Aphrodîtê ya bi navê Mezopotamya ji xewa xwe ya şîrîn hişyar dibe û bang li diya xwe dike.



**Mezopotamya (bi dengekî kelecana)** neke.

Dayikê dayikê!

**Aphrodîta (diya wê teşiyê dihonîne)**

Ha keça min çi bû?

**Mezopotamya**

Dayikê, min xewnek dît.

**Aphrodîta**

Bi xêr be ka bahs bike çi ye?

**Mezopotamya**

Dayikê min di xewna xwe de dît ku em rojekê pir dewlemend dibin, dewlemendiyeke ku têra hemû dinyayê dike.

**Aphrodîta**

Êêê çawa?

**Mezopotamya**

Nizanim dayê, min tenê dît ku baxçeyekî me yî mezin, pir mezin hebû û di nav bexçeyê de bîst sîh qesrên me yên bîst qat, her qatek jî li gorî min bê hejmar ode hebûn. (dibişire)

**Aphrodîta**

Wîîî keça min bes e lê, he roj xeyal xeyal.

**Mezopotamya**

Dayê ev xewna min jî yên din cuda bû, heçku rast bû (axînekê dikişîne) axxx axxx!

**Aphrodîta**

Ku tu dewlemend nebî jî tu keça min î tu delala cîhanê yî, ma ev ne bes e?

**Mezopotamya**

Erê dayê tu jî xweş pîrole dikî.

**Aphrodîta (dikene)**

Tu dixwazî bawer bike, tu dixwazî bawer

**Mezopotamya (ji cihê xwe radibe)**

Te xewna min di qirika min de hişt.

**Aphrodîta**

Ya aramî keça min, dev ji xewnê berde were em taştê amade bikin û bixwin.

**Xwînerê Pişt Perdê**

Taştê amade kirin û rûniştin ser sifrê.

**Mezopotamya (çayê tahm dike)**

Ïimmm! Tahma çaya me îro çi xweş e, bihuşt e bihuşt.

**Aphrodîta**

Keça min rinda min ev ne ew çaya ku em her ro vedixwin e.

**Mezopotamya (bi ecêb)**

Çawa yanî?

**Aphrodîta**

Vê çayê, kalikê te Prezeûs ji gerîna xwe ya li daristanê jî riwekekê dîtiye û ceribandiyê û nihêrtiyê ku tahma wê pir xweş e, aniye. Ji bo xwe jî çandiyê.

**Mezopotamya**

Bi rastî tişteke ecêb kiriye.

**Aphrodîta**

Erê wisa jî be (ji nişka ve Mezopotamya)

**Mezopotamya**

Dayêêê! Tu kengî çûyî cem kalikê min? Ka dê tu yê min jî bibira cem wî?

**Aphrodîta**

Liiiii! Keça min liiii!

**Mezopotamya**

Erê dayê bibêje.

### **Aphrodîta**

Ji ber ku kalikê te dîsa diçe daristanê bo çayê lê di rêya vegeerê de dikeve erdê û birîndar dibe. Ez jî pelepê çûm balê û serê sibê vegeeriyam.

### **Mezopotamya**

Wîî çawa birîndar dibe?

### **Aphrodîta**

Wextê cûreya riwekê dibîne û dizane ev çayek nû ye pir kêfa wî tê û di rê de direve û birîndar dibe.

### **Mezopotamya**

Weyyyy limin qirikêêê!

### **Aphrodîta**

Jixwe navê çaya xwe ya nû kifş kiriye, navê wê kiriye "Revok"

### **Mezopotamya (bi deng dikene)**

Revok ha! Yanî çaya kaçax, pir baş e wey kaliko. Êêê halê kalikê min çawa ye?

### **Aphrodîta**

Niha pir baş e me ew tedawî kir û got wexta zewaca Mezopotamya hatiye (dikene)

### **Xwînerê Pişt Perdê**

Di vê navbera henekan de dengê qurs dihat ji ber deriyê malê. Ji pacê mêze kirin ku çar hespdar ji hespê xwe peya bûn û ber bi deriyê malê ve dimeşin. Her çar ciwan jî qeşeng û xurt in. Li derî didin

### **Aphrodîta** (bi tirseke mêvanperwerî)

Ka kerem bikin?

### **Xwînerê Pişt Perdê**

Yekî bi navê Bakur peyivî:

### **Bakur**

Merheba dayê em rêwî ne, vaye em rojekê li ser hespan in, em pir westiyane û birçî bûne. Me jî got miletê me mêvanperwer e dê li me xwedî derkeve pariyek nan bide me.

### **Aphrodîta**

Li ser çavan, ke kerem bikin odeya hember.

### **Hespdaran (bi hev re)**

Spas dayê.

### **Xwînerê Pişt Perdeyê**

Aphrodîta gazî keça xwe kir û çûn pêşgehê xwarinê amade bikin. Aphrodîta sifreya xwarinê bir ber mêvanan danî. Pişt re jî Mezopotamya çay bir ber wan.

### **Aphrodîta**

Bila noşî can be. Kerem bikin. Lê belê hûn ji ku tên û hûn ê herin ku?

### **Başûr**

Bibore dayê. Navê min Başûr e. Me xwe neda naskirin. Navê hevalê min bi rêzê Bakur, Rojava û Rojhilat e.

### **Aphrodîta**

Ser çavan. Ez jî Aphrodîta.

### **Rojava**


Em her çar heval wekî bira ne. Ji bîst salî zêdetir em bi hev re ne û bi hev re mezin bûne. Em her meh dicivin û li van deran digerin. Ji bo kêf, zanyarî û hwd. Bi kurtasî em jiyan in. (Dikene)

### **Aphrodîta**

Aferîn ji bo we. Hûn hemû jî jêhatî ne.

### **Xwînerê Pişt Perdeyê**

Bi dengeke zenûn ve Mezopotamya ket hundir.



### Mezopotamya

Hûn bi xêr hatin. Ser seran ser çavan hatin.

### Xwînerê Pişt Perdeyê

Hemû heval matmayî man û pariya nanê wan di qirika wan de ma.

### Rojhilat

Iii... Ser çavan. Dinav xêrê de bin.

### Xwînerê Pişt Perdeyê

Wek aveke cemedî li ser laşê hespdara min bikeve, ew ças matmayî bûbûn. Hemû heval jî evîndarê Mezopotamya bûbûn û eşqek bi ter û ter hilgirtibûn. Xwarina xwe jî di nivî de hiştin.

### Bakur

Navê te bi xêr?

### Mezopotamya

Begê min, navê min Mezopotamya ye.

### Aphrodîta

Law hûn çima xwarinê naxwin?

### Başûr

Na. Bes e. Em nikarin bixwin êdî. Dilê me jî, zikê me jî têr bû.

### Xwînerê Pişt Perdeyê

Dayik û keç xwarinê radikin. Di vê navberê de hespdar di navbera xwe de dipeyivin.

### Rojhilat

Bi rastî ev keçik pir delal bû. Ez evîndarê wê bûm. Ez ê ji dayika wê, wê bixwazim.

### Rojava

Di serî de min eciband. Ji bo min e.

**Başûr**

Na lo! Keçikê dilê min şewitand. Ya min e.

**Bakur**

Kî di serî de peyivî? Ez. Pêwîst e keçik ji bo min be. (Dikevin nîqaşê)

**Aphrodîta (Dikeve hundir)**

Law, wiha xêr e çi ye?

**Başûr (Şerm dike)**

Bi rastî em hemû aşîqê keça te Mezopotamya bûne.

**Aphrodîta (Bi ecêb û şaşmayî)**

Çawa? Lê hûn mêvan in, mêvan ne evîndar in.

**Bakur**

Dayikê destûr hebe em ê bibêjin keçikê, Wê ji me kîjanî hez kir; bila ya wî be.

**Mezopotamya (Şaş û şîn dibe)**

Waa? Çi?

**Aphrodîta**

Dibêjin tu ecibandine. Tu ji wan kîjanî bicibînî, tu yê pê re bizewicî.

**Mezopotamya**

Nizanim. Bê biryar im.

**Xwînerê Pişt Perdeyê**

Ji bo Mezopotamyayê dikevin nîqaşan. Ew dibêje wisa, yên din dibêjin wisa.

**Aphrodîta**

Hûn her çar kes jî dixwazin bi keça min re bizewicin. Lê belê wisa nabe. Pêwîst e ferwerdekî me hebe. Ev jî cîranê me, mirovê dirust û dadwer Bakaros e.

**Bakaros (Hat)**

Bila pêşbaziyek hebe. Kî ku qezenç bike bila keçik jî ya wî be. Bila Mezopotamya ji tiştên xwe yên girîng serê yekî tişteki bide.

**Mezopotamya (Temam)**

Taca xwe didim yekî, kupa xwe didim yekî, kolyeya xwe didim yekî û ramûsandineke jî didim vî camêrî.

**Xwînerê Pişt Perdeyê**

Bakaros yê ku keçikê ramûsan dayê qebûl kir. Lê belê hevalên din qebûl nekirin û ne pejirandin. Dîsa dikevin nîqaşan. Pişt re pêvçûn û şer dikin. Bi şûrê her çar kes jî şer dikin. Xwîn dirije û hevdu dikujin û hemû dimirin.

**Aphrodîta**

Oyy hewarr, ev çi hal e, oy!

**Mezopotamya (Dike qêrîn û hewar)**

Oy oyy, ev bela bû hate serê me. Ev çi ye lo! (Ji nişka ve dikeve erdê û ji ser hişê xwe diçe)


**DAWÎ**

**Xwînerê Pişt Perdeyê**

Mezopotamya keça xwedawendaya bedewiyê ye. Bedewiya xwe jî tu carî winda nake. Lê belê dost û birayên hev ji bo delala cîhanê hevdu qetil kirin û kuştin. Ji wê rojê heta roja me Mezopotamya di nav qehr û kezaban de ma. Dilê wê her şewitî. Bû perçe perçe. Heta roja me jî çar perçe man. (Bakur, Başûr, Rojhilat, Rojava) Hê jî ev çar perçe xweşik in û bêhnfireh in. Lê belê bekaretiya Mezopotamyayê wan çar perçeyan di nav êş û janê de her roj tarî dihêle.

# MIRINEK JI NEDÎ VE

Ahmet Subaşı | Pola Sêyem



Menes... Menes, ew mir! got Aten û bêyî ku Menesê belengaz bipirse bê ka kî miriye Aten bê hiş kete erdê. Li dû, xizmetkarê zikmezinê nîwtazî mizgîna mirina Firewn pispisand guhê wî. Aten li wir hîştî û ber bi odeya Firewn ve wek bayê bezê bazda. Tiştê ku difikirî dawiyê hat serê wî, lingê Menes nedixwestin xwediyê xwe ber bi cihê teşqelê ve bibin, lê bêgavî wî ber bi vê diyardeya bê mebest ve dikîşand. Tevzînekin ji laşê wî diçûn, ji bilî li ber ketina Firewn, wî her tişt fikirî heta ku gihaşt odeya Firewn. Dordora odeya wî bi leşkerên taybet hatibû dorpeçkirin. Kes nedixistin odeyê, jina Firewn bi ser çavê ku di kilê de mabû derkete derve, çavên wê bê hêsir lê bûbûn wek tasa xwîne, li Menes nihêrî û çû. Menes di çavê wê de mirin, gor û tirs dît.

Stêrk îşev ji her şev geştir li asîmanên Misrê bi ronahiya xwe ya efsûnî û rengê şînahiya asîman xemilandibûn û xewa şênîyên Misrê bi çirûsandina xwe direvandin, nemaze jî ya Firewnê biçûk. Hîsa mûmîkirina bavê wî niha di hemû laşê wî re wek bayê cemidî yê vê şevê derbas bû, veciniqî, mûyên laşê wî, wek striyên çola ziwa û bêdawî ya Misrê, hişk bûn. Mirin çî diyardeyeke bê mebest bû li Misrê. Ji bo ku bavê wî rihê xwe rizgar bike û tevlî Xwedayên din bibe, ji xweda Horus re dia kir. Sibê, wê cara yekem li ser textê bi heybet yê bavê xwe yî ku axaftinên girîng ji gel re li ser hatibûne kirin, rûnê. Fikra rûniştina li text, kelecaneke bi quretiya ku yek ji prensîbên jênegerr yê malbata wî ye, anî û pif kir ser çavê wî, ev hilmeke ku bi bêhna xwêdana berxwedana hemû laşê kalikên wî hatibû dorpeçkirin, bû.

Bi ber sibe re, berî ku dengê beqên çemê Nîlê koroyekê pêşkeşî Misriyan bikin bi kêf rabû ser xwe. Çavên xwe zoqî bajarê ku şênahî û çola bê serûbin gihandiye hev kir. Îro kar pir bûn, tiştê ku heta niha tenê dibihîst îro yek bi yek ê bidîtana, îro dê bûbûna roja yekemîn. Îro roja Firewnê nû yê xort bû û helbet roja Menesê xizmetkar.

Firewnê biçûk jî piştî xewnên tevlihev serî ji xewê rakir û li ser qesra xwe ya ku hemû Misr jê ve dixuya li bajarê ku dê jê re qiraltiyê bike, nihêrî. Fire fira bayê cemidî yê serê sibê jî nikaribû xwe li hember hêza wî ya zarokane ku bi quretiyê re ketibû pêşbaziyê, bigire. Ji xwe bi bawer bi pêtekan ve dakete jêrê. Menesê ku bi salekê jê biçûktir bû tevlî çend xizmetkarên din, stû di ber de li dawiya pêtekan li benda fermanên wî bû.

Xwedêkirî ku wî dabûne xizmeta vî firewnê emir biçûk. Dema ku zarokan li dibistanê di nav xwe de axiftibûn bihîstibû ku firewn gava dimirîn tevli hemû tiştên şexsî wan dixin gorê. Ecêb, gotibû lewra qet mamosteyên wî qala vê mijarê nekiribûn. Çend rojê ewil gelekî ji xwe re kiribû xem lê dû re ji bîr kiribû. Dema ku hatin ji bo xizmeta firewnê nû kesan hilbijêrin, dilê wî kiribû hilkehilk. Di nava dudîliya xwestek, prestîja xizmetkariya Firewn û tirs mirineke ji nedivî de mabû. Lê dû re bihîstibû ku firewnê nû deh salî ye, bêhna wî derketibû hînga.

Piştî amadeyeke dûvdirêj Firewn amadeyî derketina hemberî kesên ku ji bo dîtina Firewnê biçûk li qesrê kom bûbûn, bû. Hevsera wî gustilka ku nîşaneya domandina zewaceke ebedî bû xist tiliya wî û derketin salona mezin ya ku elîten Misrê lê civiya bûn. Menes digel xizmetkarên din jî dane dû wan. Hişmeta cil û bergên van elîtan serî li Menes gerand, li hember vê mezinahiyê berteka xwe veneşart û di cî de sekinî. Hin xizmetkar derbasî aliyê çepê hin jî derbasî aliyê rastê bûn, Aten hêdîka bi pêstemala Menesê ku bê biryar mabû girt û ber bi xwe ve, yanî bi aliyê rastê ve kişand. Dema ku Menes derket ser dikê û gelê ku bejna xwe ji Firewnê biçûk re tewandibû dît wek masiyê

devê qaqlîbaz ku bi hêviya rizgariyê di ber xwe dide, lerizî, lê bi çavê serbaz yê ku hemû kela çola Misrê jê difûriya hêvî ji xelasiya devê qaqlîbaz qut kir. Hew mabû ku bi xwe de birrî. Teqez ku ne li hember ewqas mirov bûna dê wisa bûbûna. Xwe girt. Xîziya xwe ya ku di gewriya wî de zûwa bûbû, bi zor daqurtand. Destê xwe xişk bi pêstemala xwe girt da ku bikaribe bi kelecana ku ew kiriye pelê darê. Firewnê biçûk piştî silava dawî derbasî odeya xwe ya taybet bû lê hê Menes di bin bandora biskek berê de bû, Aten bi destê wî yî ku xwêdana cemidî jê diherikî girt û ji dikê bi dûr xist.

Ber bi êvar ve, Aten û Menes derktin bajarê ku ji sibe ve ji germê dinale, hemû gelê Misrê bi hênikahiya êvara re derketibû derve. Kuçeyê bajêr hingî ku bi mirovan ve hatibûn dagirtin, ku te xwelî bavêtana nedikete erdê. Her kesî qala Firewnê biçûk dikir, biçûkatiya wî li hemû bajêr belav bûbû, heta ku kûçikê kuçeyên bajar jî bi vê mijarê hisiyabûn. Kesên dilnexwaz li quncikên kuçeyan bi pistepist ev mijar niqaş dikirin û di bin simbêlan re hêdî hêdî dikenyan, "Firewnê biçûk haa" pirqîniya kenên bêdeng carina li kolanan olan dida.

Menes bi bihîstina van xeberdanan gelekî tirsîya, ji Aten xwest ku ew zû biçin qesrê lewra were bihîstin ku ew xizmetkarên Fîrewn in, dibe ku tiştinên nebaş bihata serê wan. Bo ku neyê fahmkirin morikê stûyê xwe bi dîzî ji qrika xwe derxistin û bi gavilên mezin ber bi malê ve meşîyan.

Fîrewnê biçûk gava ku li benda hatina Menes bû gelek bêhna wî teng bû. Menes çûbû ji çemê Nîlê jê re beqan bigire. Kêfa wî ne li cî bû îro, divê bi tiştêkî xwe mijûl bikirana. Ev ji kengî ve li ser text rûniştibû, tahma rojên ewil nema bû êdî, her ku diçû rewşa welat xerabtir dibû. Menes tevli kîsekî ku dengê weqe weqa beqan jê dihat kete hindir. Fîrewn bi hirseke bê wate pirsî:

– Menes tu li ku mayî?

Menesê ku şilopiloyê carê jî şaşomaşoyê bû, wekî ku bersivê nîşan bide li kîsê destê xwe yî ku weqeweqa beqan jê dihat, nihêrî. Fîrewnê biçûk kîs ji destê Menesî girt. Du beqên ku dikirin weqeweç ji kîs derxist, beqan di serî de li berxwedan lê piştî ku Fîrewn ew ji kîs derxistin, deng ji xwe birîn. Bi hurmeteke mecbûrî xwe nepixandin û çavên xwe li ber Fîrewn dan ser hev. Beq hinekî aram bûn, lê bi dengê beqê kîs ji serê carakê dikirin weqeweç. Fîrewn her du beqên keskokî xiste hindirê fiçiya meyê. Beqên ku ketin meyê, di nav de kirin çepeçep û mey di kefê de hiştin û dû re, ji bilî xwe nepixandinê bê bertek man. Fîrewnê biçûk ew ji meyê derxistin û lingên wan bi hev ve girêdan û avêt erdê. Beqê ku sermest bûbûn her yakî bi aliyekî ve qevz didan û qurpikên sermestiyê bi meyê re ji bêvilên wan diherikîn. Dengê weqeweqa wan hew hate bihîstin û di cî de man. Pisîka di destê Aten de bi awayekî ji xwe qayil û bi nêrînen dirinde xwe ber bi beqan ve dikişand. Fîrewn fermana berdana pisîkê

da, pisîkê piştî ku mûyên xwe alastin bi gavilên şikbar li dora beqan çû û hat, beqên ku çavên xwe girtibûn bi dîtina pisîkê re xwe dîsa nepixandin lê ev nepixandin bi kêr wan nehat û pisîkê ew dane ber nahpikan û her du jî kuştin. Di vê navberê de Serbaz ketibû hindir û bi vê rewşa Fîrewn bi dizîka dikeniya. Dayika Fîrewn jî kete hindir û bi çavên tûj li xizmetkarên ku xwe ji bir kiribûn û tevli vê şahiyê bûbûn nihêrî, bi carekê re mahdê hemûyan şor bû. Bi hirs rahişte pisîka ku hê jî bi termê beqan dilîst û ber bi derî ve çû. Hemû kesên di salonê de mat man. Fîrewn gazî wê kir:

– Ev tu çi dikî! got,

Dayika wî jî bi heman awayî lê vegeriya,

– Ne tiştêk, tenê li gor xwe tev bigere!

Û derkete derve. Fîrewn bi destê çepê xwest ku her kes derkeve derve, hevoka diya wî, ew gelek aciz kiribû.

Misr, li ber kaosekê bû, aborî ber bi nebaşiyê ve diçû. Gelê wêrek jî êdî di navbera xwe de bêtirs sedema van xerabîyan biçûkbûna Fîrewn didîtin. Keşe û kesên elît li gor xwe pergala dewletê diguherandin û rê didan ber Fîrewn.

Menes lihêfa xwe kişand ser serê xwe da ku bikaribe rakeve, lê fikra hebûna Aten nedihşt. Gelo ez ê kengî bizewcim, got di dilê xwe, lê ev ji ber xizmetkariya Fîrewn ji roja roj ve ne pêkan bû. Yan heta bi hetaniyê ezeb bimana yan jî dê bimirana!... fikra xwe di nêvî de qut kir, gilîzonek cemidî pê girt. Nexwest vê hevokê bi dawî bike, fikra wê jî bes bû ji bo mirina wî.

Gava Aten hat ser hişê xwe, teşqeleyek li qesra Fîrewn diqewimî. Qîjewîja mirovan ji hewşa pêş dihat bihîstin, kî ku dibihîst xwe li qesrê digirt. Di demeke kurt de, ji

dewlemandan bigirin heta hemû xîzanên Misrê bo berjwendiyên ku bi dest xistine biparêzin li qesrê civiyabûn. Aten ge bi wî alî de ge bi wî alî de diçû û dihat. Mirina Fîrewn wek her kesî ew jî şaşomaşo kiribû. Xizmetkarê zikmezin hat û jê xwest ku divê xwe amade bike. Gava ku Aten derbasî odeya xizmetkaran bû Menes di nav halekî şerpeze de dît. Cilên taybet ji wan re hatibûn, Menesê ku cilê xwe diguherandin di nav fikir û ramanan de winda bûbû. Aten newêribû li Menes binêre, wek ku qebehetek kiribe, bêdeng derbasî menzela xwe bû. Mamosteyê wan jî li wir bû, ew jî bo dersên îro hatibû. Ketibû nav axaftineke gur û geş. Çavên wê û yên Menes biskekê li hev qelîbîn, çavên her du yan jî bi heman hest û pirsan ve tije bû lê her duyan jî wêrekiya li hev pirsînê nîşan nedan. Ev cara yekem bû ku Menes, Aten bi vê rewşê didît. Bahoza tirsra ku ketibû dilê wê û ew jî serî heta lingan dorpêç kiribû, hêviyên Menes yên mayî jî li ber xwe bir.

Keştiya ku dê cenazeyê Fîrewn û eşyayên wî yî şexsî ber bi gora wî ve bibe, kete rê. Ev mirina surprîz bûbû sedema ne amadehiya goreke layiqê Fîrewn, lê axirî goreke ku yekî asil ji berê ve ji xwe re dabû amadekirin bûbû nesîbê Fîrewn. Çi qas ku nêzikahî li gorê dikirin, dilê Menes bêtir lê dida. Talî ev bû, qedera wî tu rê li ber nehîstibûn, bêgav bû êdî, dê bi Fîrewn re têketana wê gora tarî û hêdî hêdî dê bimirana. Ji kerban ji do ve çavên wî neçûbûne randevuya xwe ya bi xewê re. Ji bo ku ji vê rewşê rizgar bibe ji hemû Xwedayên Misrê yên ku navê wan dizanibû, re dia dikir. Gerçî dê Aten li ba wî bûna, ev fikir hinekî bêhna wî fireh kir, lê çî fêda!

Piştî meşeke dirêj ku gihana ber gorê, zirav li Menes qetiya, nemaze jî dîmenê wê yî tenê û bêxwedîtiyê. Çokên wî li nav

hev diketin. Bêhna wî çikiya û di dilê xwe de sed nalet li hemû Xwedayê Misrê anî da ku di hawara wî nayên. Bêgav, yek bi yek ji pêlteka daketin jêrê, xizmetkaran her yekî tişteke di dest de dan pêşiyê. Di vê roja germ de hênika hiya vê gorê tevzînek bi laşê wî xist, hemû mûyên laşê wî wek derebegên ku serxwebûna xwe îlankirine çik bûn lê zûzûka têkçûn û Menes bêhiş ji pêltekan ber bi jêrê ve gindirî.

Gava ku Menes hat ser hişê xwe Aten li ber serê xwe dît û xwest ku pê re biaxive. Lê Aten bi beşereke vekirî çav lê şikand, bi deste çepê destê wî girt û bi tiliya şahdetê jî nîşana hişbûnê nîşanî wî da.

## LOKOMATÎFA JÎYANÊ

Tufan YAMAÇ<sup>1</sup>

*Divê tu nekeniyayî*

*Divê tu negiriyayî*

*Divê tu hem bikeniyayî*

*Divê tu hem bigiriyayî*

*Divê tu di navbera wan de bisekinyayî*

*Divê tu*

*Tu divê*

*Tu*

1 - Unîversîteya Çewlîgê, Beşa Kurmancî, Pola Sêyem



# JIYANEKE XERAB CELEBEKE MIRINÊ YE

*Suat Yiğit | Pola Duyem*



*Jin tenê ye. Tenêti stargeha wê ye.*

*A rastî hunermendê berdar e.*

*Ewqas jî bexşîner û efûkar.*

*Dibe ku bîstek jî zarokane.*

*Lê teqez mistek jî jin dide jiyane jin.*

*Jin zayok, jin avakarê hêlinê ye.*

*Her tim li pişt mêrekî serkeftî, balîf e jin  
lê tu car bi serfiraziya xwe nade pêş jin.*

*Jin sûvarik e, teyreki dengxweş û  
bedenspi.*

*Lê mixabin digel ku bi vê fedekariyê tu  
car fedekariyê nabîne jin.*

*Jin belengaz e.*

*Hatiye qelizandin jin, di bin zextê de,  
pelçiqî.*

Bi ser de çima ji aliyê dê û bavan ve kêm çîmet dibîne jin. Xêr û xweşiyê zarokên kurîn dibarînin lê zaroka qîzî nola ku gava biavêje hundurê xwelîdankeke sergirtî û qilêr emrê xwe tev de bi tarîti û şelûtiyê de derbas dike. Û ji vê demê şûn de jiyana jinê diherime û ava jiyana wê şolî dibe.

Şîret li jinê tê kirin. Şîret û salix tê kirin ku gere tu car li tenîsta wê rûnenê, gere her tim bi abûr bijî, namus û îffeta xwe biparêze. Êdî ev feraset di hişê jinê de jî rûdine û ditirse jin. Ditirse dibêje dê bibêjin bi vî awayî em ê orf û adetên xwe hîn bibin?

Mesela her tim (di mala me de jî wiha bû) kincên cejnê pêşî ji zarokê kurîn re tê kirin; zaroka qîzî jî çavliwê... Roj bi roj ev xatûna nûciwan mîna pelçikê payîzê hişk û ziwa dibe.

Hêj ji zaroktiya xwe têr nabe; dikeve bin lepê mêrekî şelûşeht û bi zorê mêr dike. Piştî şeva pêşî wek zikakên reng û rûçikên wê jê

çûyî, di nav êşa rûhê xwe de digevize. Mêr jî bi keyf tehma devê xwe hildide û girêza xwe di jinê dide. Jin xwe bi lûfikan ve dişo, belkî laşê wê paqij û sor bibe jî lê girêza esas gihiştîye dilê wê êdî. Dotira rojê di rûyê wê de bêsiûdiya jiyane diresime. Di heyata wê de êdî resmandina tabloya kamraniyê ne gengaz e. Êdî zewaca bi rengî dibe ewreke reş li ser xewna jinê. Tu tişt tesîr nake, dilê wê yê peritî haşt nabe. Êdî tîrek dikeve navbera qîzbûn û jinbûnê. (Lê ez wisa nafikirim)

Di eslê xwe de ev arîşeya ne bi tenê ya jinan e, gelek zilam jî tûşî vê tecavûzê tên. Çi (li gor civatê) nebaşiyek bibe jî mêr nayê kuştin lê jin dibe qurbanî krîza civatê û ji aliyê mezinan ve fermana wê rebena Xwedê tê birîn. Êêê gotine kibrîta şerê mezin, zimanê mezinan e.

Lê hevalino ne pêwîste hûn tiştên wiha di serpêhatiyên xwe de bigerin, ev tişt rasterast di jiyana me de heye.

Lê divêjin vê qebûl neke. Encax li berxwebide û xwe rêve bibe, vejîneke esasi rû bide. Êdî gere şiyar bibe, xwesteka azadiyê di dilê wê de hêşîn bibe. Û ramanê ku şiyar bibe, careke din ranezê (Charyle). Divê ev bibe şiyareke benîştane. Cihê jin her çiqas pûnika wê be jî ewqas jî derveyî pûnika wê ye. Jin gere hizra koletiyê wek nexwaşiyê bibîne lewra hizra koletiyê eraq e. Eraq e û hişan dipekîne. Heger wiha tevbigere dê bi vî awayî hewayeke nû hilmije. Çawa ku pirtûk fikrên nivîskar dîl digire, zincîrên koletiyê jî fikra azadiyê dîl digire û difîne.

Lê gere jin bê piştvanî kirin ku jin bigihêje şahiyê û ji aliyê aboriyê ve xurtbin ku debara jiyana xwe pê misoger bikin. Erê, gere bèn alîkirin, hekema yê nigê xwe biavêjin cihên lewitî û tiştên pişul. Serxwebûna wan a aborî tune ye. Ji ber vê

# ŞAMTIRSONEK

Şakire Karabudak | Pola Sêyem



Yekbûn Stêrk

Çi hewî çî tunewî, şam tirsonenekî hewî, şamtirsonek ji her tiştî pir ditirsiya ditirsiyoyekî here mîzka jinê xwe diwe ku mîzkirin bida. Jinikê timî dibirî tinayî jinik artix li usan biyi. Şamtirsonek birî ser zibil ewa ser zibil îştî. Jinik riviye mal qepî ser xwe kîlît kirî. Şamtirsonek êndin hîna kirî ku jinik êndin nîla mal. Hatî mal gotî jinik ez dizanim ku tu êndin min nîlî mal tişteki te bixwazime tu yê ewna mi dî. Hêkekê, henek ard yek jî li vir şûrê bavê minî kevin bide min ku ez li xim herim. Şamtirsonek girtî zibil koleyî xwe heta ber qirika xwe tijî zibil kiriye meşa heta siwê xêr bi Şamtirsonek nekirina Şamtirsonek li vê hêlê xistî çil mêş li vê hêlê xistî çil mêş mirî. Li ser şûrê xwe nivisiye min li vê hêlê çil meri li vê hêlê çil meri kuşt. şamtirsonek şûrê xwe, hêk hinek jî ard xwe rakiriye dev daye çuye çî. Liv

ê dere rasta şikefta dewa hatî ev dewana dewê heft serî ne. Dew hatne şikeftê ku yekî rûniştî dewa gotî emê neçireki digerinî ter neçirê me jî hatî şikefta me da rûniştî . Va nêçira Xwedê ji mera şand em ê wê ji xwe ra bikini qehwaltî siwê. Dewa gotî bira tu kî yî kê tu şandî virê xwe ji mera bî valle kesî ez neşandim ez ji xwe ra digirim. Dewê gotiye hele ez cakê ew şûrê te mêzким dew mêzkiriye ku wê hêlê çil meri li wê hêlê çil meri kuştîye nivîsiye. Dewa lewa xwe gez kirine. Paşê gotî ê tu wekî din çir dikî. Ê walla ez wekî di ji kevira dikim av. Dewa diza lewa xwe gez kirine. Ev çito divê hele cakê me bimîne. Hêkê li ru xwe da dişkênê gewrikî hêkê dewa dimîne dew jî hîna dikin sê roya mîvan dimê. Dewa gotin te huro dêwê topal wa herî avê. Ewna avê xwe dikin içe postê camusa. Şamtirsonek xwe xwe ra

yekê nikarin zêde li ser lingan bisekinin. Ev tişt gelek caran astengiyanderdixê pêşberî jinan. Lê ez bawerim poşman nabin jinên azad. Heta ku her roj rûmeta wan tê bînpêkirin, yê birçîbûnê ji xwe re zêde nebînin. Di bin bandora merêkî bêwîdan de kûpek zêrê wan jî hebe pere nake. Ka mala te, pere jî êdî pere nake. Di rewşên wiha de azîneke bikêr ew e ku mirov ji bo pêdiviyên jinan saziyan avabike û birêkûpêk vê vatiniya xwe bi cîh bîne.

Divê saziyên sîvîl jî alîkariyê bide jinê lewra jin bi rêxistinî û plankirî zêdetir qewî dibe. Fêhm dike ku tekane cihê nikare di

bin tehekuma xwe de bigire mal e. Bi vî awayî mêran û çapemeniyê (tv, radyo..) dixê dewrê. Qirkirina jinan a di van salên dawî de jî van gotinên min re dibin palpişt. Di civatan de rasteqînên wiha kufikî hene û hê jî berdewam e.

Nebêjin ev qijikê Xwedê sere xwe di ber van buyeran de dêşîne.

Ma ez neheqim bira. Hee xwişkê?

Ji bo pêşeroj, malbat, civat û dinyaya xwe hevsera xwe bişêwîre. Bi sebr, bi sekanî û yek bi yek hevser û dinyayê di dilê xwe de biezimîne. Ê tu nekî jî, tu û kêfa xwe.

## MIRIN

Mehmet Eken | Pola Sêyem


Dicemidim  
 Tayekî ez girtime  
 Ji dile xwe xwîn dibarînim  
 Hêdî hêdî dihelim  
 Hem dicemidim hem jî dihelim  
 Her du çawa bi hev re dibe ez jî nizanîm  
 Sermayek ji lingên min destpê dike  
 Hêdî hêdî bi jor ve  
 Laşê min ditevize  
 Serma û tevizandin destên hev digirin  
 Têna heya qirêka min  
 Dicemidim  
 Laşê min dibêm qey ne laşê min e  
 Hiç hîs nakim  
 Bêhneke dikîşînim  
 Bêhneke kûr û fireh  
 Dibêm qey bêhna cixareya herî dawîn e  
 Naxwazim wê azad bihêlim  
 Lê di cihê xwe nasekine

Devê min bi zorê vedibe  
 Û bêhneke dirêj xwe ji min rizgar dike  
 Devê min vekirî dimîne  
 Û destên min  
 Na ew hêdî ne destên min in  
 Li ber çavên min li erde dikevin  
 Çavên min matmayî vekirî dimîne  
 Mixabin kes tune wan bigire  
 Xewre diçim  
 Xeweke şîrîn, xeweke bê êş  
 Û mirin  
 Mirina herî dawî  
 Ne mîna ya dîna  
 Vê carê bê hişyarbûn  
 Laşê xwe dihêlim  
 Û her tişt li pey xwe  
 Bi laşê xwe re  
 Koç dikim  
 Koç dikim bêveger ji vê dinê.

diwê ezê çito wî xûnim. Paşê tere ser kanî dizikî post tijî baha tasek ji avê dikî tere mal rê da pir tî diwê ew avê jî vedixwe dew diwê lo te çir kir emê çi vexînî. Şamtirsonek diwê valla ez pir tîbûm ez çir bikim. Dêw şinva terê avê tê şikeftê dêw xwe xwe ra diwê walla me got Xwedê ji me ra qehvaltîk şand ne qehwaltî bela me ra şandî. Dewekî gotî te sodo une dewa topal va herin êzinga. Êzing nekirine hatine mal balte dewa daye ser pîyê xwe ber jur mêz dike. Dêw diwê lo tu çima berjur mêzdikî walla jur têr difirê. Ez wî baltî bavê me têr xwim dêw nahiştiye. Gotî lo dewê me bikujin. Tu çir dikî dewê hatiye mal gî topbûne gotine emê îşev wî bikujinî. Dewê topal bikuxe emê hînga rabinî wî bikujinî. Şamtirsonek ew gotinana dibihîze. Şamtirsonek digire nav latê xwe loxekî dikîye xwe jî vedişêre. Paşê siwê tu

wê Şamtirsonek wî kevirî diwê nahalê de wer dike. Xwe dikeve nav latê xwe radikeve. Paşê radiwê diwê off lo îşev mêşa xêr bimin nekirin. Dewa navbera xwe da gotine toylo: Ewa ji şûrê mera diwê mêş. Walla Xwedê ji me ra belak şandî. Werin em wî rindî defkinî. Emê sada bînî bira Sadulrehîm tu li dine çi dixwazî. Endin tu here kurikê xwe. Em çi bidine te e walle hûnê barek zer wekî din jî we çi dase. Yek jî unê dewê topal midin ezê gapirênim herim mal wekî din ez narim. Wan jî qebûl dikin. Şamtirsonek dew dide mal terê mal. Jinik qêpi jê re vedike. Şamtirsonek diwê piffff diwê dew diwê birê Sadullah tu çi digerî e gotî welle şûrekî bavê min kevin hebû ez te pê bikujim. Dewê topal direvê tere. Zehera diwê jinêkê ra kêf li jinikê xweş dibe qiymeta Şamtirsonek li cem jinikê li ser serî diwê. Çêroka min çu laqotê rehmet li cimete.

# rojnameyo kulturî yo 15 rojê NEWPEL



Rojnameyo kulturî NEWPEL  
weşanê Komela Ziwan Huner û Kulturî Ziwan-Komî  
yo û pancês rojan ra reyêk vejêno.



## LEYLI Û MECNÛN

Arêkerdax: Şahap LAÇİN<sup>2</sup>

Leyli û Mecnûn<sup>1</sup> aşiqê yewnan benê. Însanî verê koçer bî ew xu rê heywanî qeyta kerdîni û şîni koçeri. Mêrdimî pêro xeyman di mendîni û banê cîn (înan) xeymî bî. Enî(nê) mêrdimî seba heywanan wexto ki dinya germ bî şîni koyan. Wexto ki dinya serd bî ew koyan ra yenê berrî. Aşqê Leyli û Mecnûnî heqîqî aşq o. În(ê) hende ki yewnan di pank bî û namheramê in di çiray çini bî ew bi emrê Humay heqîqî ra aşiqê yewnan bî. Ena ray kê Leyli werdenê şonê koçeri. Mecnûn zî werdeno, Leyli dima

şono koyan ew Leyli taqîb keno. Ena ray enî koçerî qonax bi qonax rayîr di şîni. Her ray di hefte di yew qonax di barê xu ronayni heftê binî sewbî yew qonax di barê xu ronayni, bi eno hewa cayê xu resayni.

Ti ra wanê:

- Îni Rasileynî, Îni Rasileynî ra kê Leyli barê xu wenayo şîyo. Mecnûn yeno enî Îni Rasileynî ser ew ûta di kişta kuweno. Mecnûn kişta kuweno û ûta (ûca) di şeş aşmî hewn di maneno. Kê Leyli heya şêrê koyan û heya koyan ra bêrê. Ûra di bi emrê Humay reyde xayîlyeno. Leyli zana ki Mecnûn amo ew tam nêzana Mecnûn kura do.

Wanê:

- Quling cêr o yeno quling ew quling zî

1 - Na efsane, mi 08.09.2015 de, Gêl de, taxa Welî Began ra, Mehmed Elî Kayayî ra girewte û nuşte. Mehmed Elî Kaya, cîranê ma yo, Gêlic o û 80 serre yo. Wendiş-nuştişê ey çin o.

2 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Hîrine.

ebur bî, verê heywan ebur kerdîni. Quling zî yeno rocî Îni Rasileynî di maneno ew ûra di asan beno. Quling zî eynî sey koçerî şono koyan yeno ew heywanan ebur keno. Quling zî şono Leyli hete û heywananê cîn zî ebur keno.

Ûra di Leyli quling ra wana:

- Şima amê Înidê Rasileynî ser, şima ûra di asan bî, cay yew xort ûra di kişta kewte nêbî. Eno quling zûrî keno.

Quling Leyli ra wano:

- Ma xula amê katê insanî ûra di vengî bî. Yanî çî çîni bî. Ûra di Leyli zewtî dana ay qulingî ro.

Leyli enwa wana:

- Quling, quling to senî zerra mi şikiti ew to zerra mi verday ew Humay teala zî enwa perrê to zî bişkino ew zerra to zî mano. Bi emrê Humay reyde zewta Leyli qeub bena. Perrê qulingî şikyenê.

Quling Leyli ra wano:

- Xula Leyli, Leyli! Ti dayî (dua) biki mi zûri kerdi. Mi to xapina. Dayî biki ez weş ba. Xula ma amê yew xorto ti senî waca kişta kewte bî ew palax, çayîr û çimen goreba di-hîrê vîncoyê berz bibî. Mêrdim qîmiş nêbeno enî xortî ra bewnîyo û xort zî weş û war bî. Leyli bi emrê Humay reyde ena ray dayî kena.

Leyli wana:

- Yarabbî ti perrê qulingî weş bikê ew o şero embazan ra nêmano. Bi emrê Humay dayî Leyli qeub benê, ew quling şono embazanê xu ra nêmaneno. Kê Leyli wextê cîn hîdî koyan di qediyeno û koçerî hîdî koyan ra yenê şonê berrî (deşte). Îne yenê Îniyê Rasileynî ser o xeymanê xu ronênê û xeymanê xu virazenê û ûra di çend rocî manênê û heya newe ra raykuwê şêrê.

Leyli lez sitil gêna şono îni ser ew ez veyna Mecnûn kura do. Birayê Leyli zî enî waziyetî zano. Birayê Leyli verê der şono ki Mecnûn ha îni ser o yo. Bira şono dara tiwêri ser o xu limneno.

Bira xu bi xu wano:

- Eke eno heskerdiş di namheramê bî, ez Leyli û Mecnûnî pêser o kişena. Eke eno heskerdiş di namheramê tede çîni bî, ez cîn dana yewnan. Leyli şona ki Mecnûn Îni Rasileynî ser o kişta kewte yo.

Leyli Mecnûnî ser o deyri wana:

- Werdi werdi! Ti senî hewn di mendî, werdi werdi! Bizek bî kel, kavir bî beran, golik bî vîştira ew ti hema zî hewn dê. Dormarê to di çayîr û çimen biyo filan û bêvan ew ti hema zî hewn dê. Mecnûn bi emrê Humay reyde hewn ra xu aqilyeno. Leyli û Mecnûn ûra di yewnan veynenê.

Leyli tadîyena Mecnûnî ra wana:

- Ez rayîr di amaya ew ez zaf betilyaya. Enî çend rocî yo ki hewn çimandê mi nêkewto. Ti tay çokê xu rone ew ez serrê xu çoktê to ser nena wisena.

Leyli wana:

- Bew! Mecnûn ti cay destê xu mi ra nêne û ti bi çim do xirab mi ra nêewnîyê.

O wano:

- Hay tewbe! Ez sey wayî to pawena. Mecnûn çokê xu roneno û Leyli zî serrê xu çokê cê ser nena. Leyli bi eno hewa kişta kuwena ew xu ra şona. Birayê Leyli zî serdê cîn ra yo ew cîn temaşe keno. Yew mêsi yena ridê Leyli ew Mecnûn dayax nêkeno ki ena mêsi xu ver ra şero. Mecnûn bi destê xu ena mêsi ridê Leyli ra qorneno. Mecnûn senî ki mêsi qorneno ew destê Mecnûnî ridê Leyli guneno ew Leyli hewn ra werdena û xu aqilyena.

Leyli, Mecnûnî ra wana:

- Bêbext mi to ra nêwa destê to mi nêguno ew Leyli zav hêrs bena.

Mecnûn wano:

- Xula Leyli mêsi amê ridê to û mi ena mêsi ridê to ra qornay û mi wa mêsi hewnê to nêhermno coka bêhemd destê mi ridê to guna. Birayê Leyli zî dara tiwêr ser a temaşê cîn keno.

Leyli wana:

- Nê eke bêhemd bî ti gişta xu rone ew ez kerra dena kişta to ro. Eke bêhemd bî gişta to çî nêbena eke hemd bo gişta to gunî bena yan zî dera bena.

Mecnûn wano:

- Hay hay! Mecnûn gişta xu roneno, a zî kerra berz kena pêro do ew birayê ca (aye) dara tiwêr ser o veyn da Leyli deno.

Birayê Leyli wano:

- Korê Leyli! Ti kerra nêda gişta Mecnûnî ro. Mucnûn raşta wano, bêhemd gişta Mecnûnî to gunaya. Leyli wexto ki birayê xu veynena ew zav-zav şermiza bena. Bira ca di fehm keno yew çî beno

Birayê Leyli wano:

- Ez lez darê ser a ruwa ew enka yew çî beno. Ez darê ra ruwa û cîn resa madem ki in aşiqê yewnan bî ew ez cîn bida yewnan. Heya bira darê ser a ruweno û in zaf şermiza benê.

Leyli Mecnûnî ra wana:

- Mecnûn ez yew dayî kena ew ti zî wace amîn.

Leyli wana:

- Hîdî birayê mi, ma dî ew ez senî şona ver ra birayê xu.

Leyli enwa dayî kena ew wana:

- Yarabbî! Ti ma bikê estareyî, ti ma finê asmin ew ma serri di, di ray ma yewnan biveynê. Bi emrê Humay dayî Leyli qeub bena. Leyli û Mecnûn bi emrê Humay ancîyenê asmin. Enka in serri di, di ray yewnan veynenê. Ray wesarî Leyli şona koyan Mecnûn şono berrî, payîzî Leyli şona berrî, Mecnûn şono koyan. In hende ki aşiqê yewnanê dayî cîn qeub benê. In bî estereyî kewtî asmin heya yewbîn qiyamet estareyî ew asmin ra yê.

Wanê:

- Wexto ki Leyli û Mecnûn têro vîrenê a deqa di kam cîn veyno çî miradê cîn bibo yeno ca.

## LOKOMOTÎFÊ CUWIYAYÎŞÎ

Tufan YAMAÇ<sup>1</sup>

*Ganî ti nêhuyayêne*

*Ganî ti nêbermayêne*

*Ganî ti hem bihuyayêne*

*Ganî ti hem bibermayêne*

*Ganî ti mabeynê inan de bivindertêne*

*Ganî ti*

*Tî ganî*


*Tî*

1 - Unîversîteya Çewligî, Wendekarê Leteyê Kurmancî, Sinifê Hîrine



# KEÇELEK QONZON<sup>1</sup>

Arêkerdax: Huseyîn KESKÎN<sup>2</sup>



Cêk est cêk çîn. Yo mêrik kurinde est. Şin ce yo hûtêk von:

- E kurinde wa ez sebiker.

Hût yo sa ken dije don mêrik von:

- Yo qelfêk bi cîne xwi yo qelfekiz iz astuerê xwi. Eg tir di qij, astuer tir di conê bî se ti yo qijêk xwi û yo conêk xwi on don mi.

Mêrik şî kî xwi. Yo qelfêk sa don cîne xwi û yo qelfêk sa don astuerê xwi. Cîne yir di qij, astuerê yiriz di cone bîy. Mêrik qemîş qij xwi û cone xwi nîben ber bid Hût.

Hût ruejîk yen kî mêrik von:

- Ti kaşîna yo qijê xwi û yo conekê xwi on don mi. Merik von la e şiyin qij xwi û cone xwi ona dona ti. Hût von ti mîyar se e yena ti kişena. Hût şin mêrik yo qijêk xwi û yo conêk xwi gen şin.

Rîyi ra raştir yo cityer yen, cityer von:

- Ti şin ça?

Merik von:

- E in pit xwi ina cone xwi bena dona filon kes.

Cityer von:

- Tî laj xwi ber bid ci laj ti kişen, laj xwi ci med. Eg ti da ci se vaj edet maw qij vernîye pîl nîkuen. Eg kot vernîye ti se perud bikiş. Di muîyon bijagon cone xwi ra ca bik, mîyon wadî yo yeni est muîyon bicon yeni ra berz xwi cîyef.

Mêrik cityer a musadi guret şin kî Hût. Laj xwi don Hût geran a şin kî.

Laj Hût a von:

- Wesyêt bavî mino gij vernîye pîl nîkuen.

Hut vernî şin laj pera don Hûtîr Hût kişen, kalmi ser dolava on pe Hût sari birnen. Şin zere wadî yo yenêk haw wadi do, wadi pêrun zerd û tefariq. Lajêk di muîyon cone xwi ra ca ken, con yeni ra erzen xwi cîyef. Şin bin dew yo vêri don xwi sar şin kî axê. Kenê axê nêweşa cemaet kî haw girdayo.

Axa von:

- Şerê şit şer û mezg têr bîyarê bide kenê mi, kenê mi bena weş, dermon yiw.

Ser sived fird zomon xwi erşaven. Zomê

1 - Na estaneke, mi 22.03.2015 de, Îstanbul de, Şefika Keskîn ra girewte û nuşte. Şefika Keskîn dadîya min a û 54 serra ya. A, Çewlîg ra ya. Wendîş-nuştîşê aye çin o.

2 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinîfê Diyine.

axê şin,şin geren nivînen yen axê rene yin erşawen. Keçelêk xwir hanu fêk berîd runiştî wo, Keçelêk axe ra von, ez xwir şîyer.

Axa von:

-Owoooo keçelêk buiyin bon şayîş bon.

Axa bine vindet va:

- Dewa yi z şer.

.Keçelêk şî, rene şî ce cityer. Cityer von:

- Ti şin ça?

Keçelêk von:

- Axa von şima kom şer şit şêr û mezg têr bîyar, eg kenê mi pe ayon biv weş se e kenê xwi dona ay.

Cityer va:

- Şu şêr hana bin dar rukotiya kurik yi hay domale yi ra, linge ye gursawa ra bin darid xwi binimn derzîn lingê yi rak wa lingê yi ra gunî û rîm bîyer, wa lingê yi weşiv.

Şin ha bin dar rukotiya kuen bin puş yena keçelêk derzînê xwi kuen bin linga rîm u guîn te ra yen.

Dor xwi gerena vona:

- Oyyy ti kome ti kom ca de mi ti ika bivînitîn mi ti werdîn.

Şêr kuena ling bena rahat vona:

- Oyyy ti kom ti mi ra çita biwaştîn mi den ti.

Keçelêk wirzen von:

- E şêra vona e omîya wa şit tiw û mezg têr ber.

Şêr yo lîyire xwi dona ci vona:

- Ti ben pe hot kuî qafa sari birnen , wa veng ye mîyer mi. Eg veng ye ber mi e yena ti wena. Keçekek liyir ben pe hot kuî qafa

sari birnen puestê ye te ra ken gen yen ce şêr. Şer cir şit xwi kena ci mezg têriz dona ci. Keçelêk gen şin kî axê mezg têr û şit şêr don kenê axê kenê axê bena weş. Axa kenê xwi don ci. Keçelêk ken qe qonzon xwi. Keçelêk û kenû xwi ken quil qonzon. Keçelêk şin wêrd ew hegê axî, bijagon xwi kuen pîya wa. Puet dîyen te ra ,kalmê yi yen cone yi û xezalêke yi yên nuşen cone xwi pe vazdnen. Cinê Keçelêkiz nimitik ser kena. Kena yena bavî xwi ra vona hal hewal keçelêk îna wa. Bavi tera înon nîken.

Von:

- Ti qestîya vona.

Ruejêk ben herb. Qevîlê axê û yone qevîl don pîyer. Keçelêk rene sîhîr ken puet yi,cone yi,kalmê ii yen. Keçelêk şin het axê harb ken. Keçelêk pêrunon kişen yen şin, qaşuna şin kuen quil xwi.

Merdum axê yen vera von:

- Ita ce ti nu,ti çî şin îja.

Keçelêk von:

- Ce mino e şina ce xwi.

Keçelêk şin kuen quil xwi. Axa merdumon xwi ra emir ken keçelêkir yo kueşk virazen. Kenê xwi û keçelêk ken kueşk.

Ruejîk Keçelêk şin ce birê xwi von:

- E hana şina sêd eg çilemi şî xêv gazîye mira be.

Keçelêk şin yo şikeft kerî, yo xezalêk vernîye yirid bena raşt dima şin ya yi erzena zerê hindeq. Hîri ruej nîyen birê yi gazîye yi ra şin kî yi. Cinê keçelêka gerî birê keçelêk keçelêk. Firdemin mon pî. A şew îja ben, non ven.

Von:

- Cinek emş cilon mi cîa rak e qefilyayîya.

Cilon yi cîa kena ra kuen ra. Ser sive wirzen von:

- E vizer kom hetA şiya hîşê mi temom nîyev.

Cinî vona:

- În heta ti şî.

Aw heta şin şin ce şikeft. Veng vengî ce ka yena, onen veng bireyiw şin ser hindeq onen bireyi hav zere hindeq do. Dest birê xwi gen kaşken on dîyar, birê xwi xelisnen. Mesela îtad qedena.

## ZONAYÎŞ

Fîgen ÇOBAN<sup>1</sup>

Gelê biron gelê wendekaron  
Înson bi wendiş merdim nêbeno  
Înson bi wendiş nome gêno  
Înson bi wendiş rahar gêno  
Înson înonê xu bi înonîyetê dinya gêno

Êr mevac ez zono  
Tî çendek bizonî  
Tî guerê nuxta nêzonî  
Eg ti vac ez zono  
Galdayîşê tu sari ra nêzon

Bi fors guere nêbeno  
Bi veng qalkerdiş  
Înson yo derece nêgêno  
Înson yo sene'at nêgêno  
Înson îsonîyê xu bi îsonet bi îsonetî dinya gêno

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Zazakî Sinifê Yewine.

## DEM SERREYÊ ÇOLÎGÎ

Sedat SOYLEMEZ<sup>1</sup>

Wisarê ey çî weş o  
Her cayê ey beno vilikî  
Zerencî veng danê  
Dîyarê koyê Çolîgî de

Beno hamnan beno germ  
Tîjî bena gêreno veşneno  
Mişaqî hê vaş çînenê  
Mîyanê merganê Çolîgî de

Payîz ame gure zaf o  
Erd bîyo mird, şilî zaf a  
Cayê embazî û biratî yo  
Welatperwer o Çolîgê mi


Zimîstan o çî serd o  
Verg vêşano şewe gêreno  
Çî wina bîyo serd  
No memleket Çolîgê

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Yewine.



# KAYÊ SATRANCÎ

Şenay Asutay<sup>1</sup>



©Yekbûn Stêrk

Ser a vînayîşê kayî hikayeyêk esta. Rojêk Brahma Sissalî (zanyarê Hîndîstanî yo) wazeno ke kayê newe bivîno û bi no kayî hem keyfê hukumdarê xo bîyaro hem zî dersekî bido ci.

Sîssa, Hukumdar Balhaîtî musneno kayî û bade cu zî ey mat keno. Hukumdar no kayî rê ewqas hes keno ewqas keyf geno ke çimê ey sewbîn kayan nêvînenê. Hukumdar badê binkewtinî wazeno ke xelatêk bido wezîrê xo û ey rê vano: "Kerem bike. Ti mi ra çi wazenî biwaze."

Wezîr ewil çiyêk nêwazeno la hukumdar vateyê xo dibare keno, wezîr zî vano tamam. Waştayê wezîrî tay enteresan o. Vano ke: "Çargoşeyê satrancî bi xele (genîm) deke bes o. La çargoşeyê yewin de hebêk xele, her çargoşeyê ke dima na di la xele ronîyo. Heta ke 64 çargoşe biqediyê."

Hukumdar Balhaîtî hemberê no waştîşî de keyfweş beno û ferman dano:

- "Cade waştîşê wezîrê min bîyarê herinde."

Xizmetkarî zî bi tebexêk xele yenê û dest pê karê xo kenê. Çargoşeyê hîrêsinî de pê hesîyenê ke no kar, karêkî ecep o. Û dest bi hesap kerden kenê û vînenê ke heme xeleyê Hîndîstanê zî no waştîşê wezîrî nêno ca.

(Bikirarî:

$$2^{64-1} = 18.446.744.073.709.551.615)$$

Badê no hesabî hukumdar reyna wezîr pîroz keno û pê hesîyeno ke taybetmendîyê no kayî zêde yê. Têna ser a fikiryayîşê dersê wezîrî muhteşemîya satrancî fehm bena.

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Kurmancî, Sinifê Diyine.

Satranc, kayekî hem zaf kan hem zî zaf newe yo. Kan o çunke ser a Pîramîdê Misirî ke çar sey hezar caverî virazîyê, resîmê ke merdimê kaykerê satrancî estê.

No kay Hîndîstanê de vejîyayo orte û nameyê kayî zî "Çaturanga" bî. (Awanîya no kayî zî maneno awanîya arteşê Hîndîyan.) Rahîbê Budîstî ke zulmê dînî ra remayê û şîyê Çînê bi sayeya nê rahîban resayo uca zî. (Seserreyê 8an de Çînijan xo rê satrancekî taybet vetê.)

Serre 600an de zî kay resayo welatê Persan û Persî zî nameyê kayî kerdê Çatrang. Badê 25 serran zî Erebi welatê persan dagir kenê û tîya de satranc musenê. Nameyê kayî bedilnenê û kenê Şatranc. (Nameyê ke ma ewro şuxulnenê şatranc ê Erebî ra yeno.)

Gama ke Tarik Bin Zîyad û leşkerê xo (Dewlata Emewîyan) seba cengî şîne Spanyayê no kayî zî bi xo benê. Kay ewil mabeyna payeberzê dewletê de vila beno û xo dano hes kerden.

Kayê satrancî, hezar serran caver vîniyayo la hîna zî kayekî newe yo. Çunke qaîdeyê no kayî zerreyê wextî de bedilyayê. Û rojê ma de zî no bedilnayîş dewam keno. Çend hezar serr no kay hêdî û stratejîk bî. Seserre hezar û çar sey de bi vînayîşê kerreyê fil û wezirî heyecan û zewqê kaykeran zêdiya çunke bi nê kerrayan hem şeklê tewgêrê kerreyan hem zî payeya zorîyê kayî bî zaf. La bi nê kerrayan ame fehm kerden ke seba şahî hetkarî hewce bî û ey ra qaîdeya "Rok" vîniya la bade gelek wext na qaîde qebûl bî û hêdî hêdî cayê xo kayî de girewt.

Satranc seba şuxulnayîşê mezgî, vînayîş û fikiryayîşekî hîra, kayekî bêqusur o. Bi nê taybetmendîyê xo satranc heme dinya de vila bîyo. Seserre 19an de zî musabaqayê

satrancî dest pê kerdê. Şampiyonê verin zî Wilhem Steînîzî yo. Musabaqaya tewr derg zî 1989an de Olîmpîyatê Kayê Satrancî ke bi destê FÎDEye yenê organîze kerden şarîstanê Belgradî de ameyo kay kerden. Na musabaqa -kaykerê na musabaqayê Îvan Nîkolîc û Goran Arsovîc biyê - vîst seetan rê vêşî dewam kerd. Kay bi beranberî qedîya. Wayirê reqorê ser a fikiryayîşê hemleyî zî bi 2 seet û 20 deqeyî Francisco R. Troîs o.

Êdî na kayek ser a compîteran de zî kay bena û musabaqa zî virazîyenê. Compîterî, mabeyna kaykerê no kayî de dîrî kerdê bêmana. Serra 1997an de Garry Kasparov ser a compîteran programê Deep Blue yê satrancî virazeno. Zaf balkêş o ke binkewtinê yewinî Kasparov ke sazkerê programî yo, bi xo geno.

Ser a no kayî agahîyê balkêş zî estê. Mesela: Wextêk Îngîlistanî de heskerdişê kayî satrancî ewqas bîyo zêde ke şarê no welatî bi mektuban zî no kayî kay kerdê. Kayo verinî ke bi mektup ameyo kay kerden dî serre dewam kerdo.


Turnuvayê satrancî ke serre 1916an de şarîstanê Belgradî de ameyo kay kerden mabeyna dîyaran de nê kilo rûno ke zî estbî. Çunke ê serranê de Şerê Dinyayê o yewin estbî û peyda kerdişê rûno ke zî zaf zor bî.

Seserreyê 11an de Derê Ewropayê, îlan kenê ke kayê satrancî parçeyê Kulturê Îslamî yo û kaykerê no kayî zî afaroz kenê (dîn ra erzenê). No qedexê zî nêzdîyê 400 serran dewam keno.

Satranc hetê psîkolajî de zî kayekî şahane yo. Çunke kaykerê no kayî hem erîşê şahê raqîbê xo kenê hem zî yê xo pawenê. Taybetmendîyê kayî tewr girîng zî sebr o. Kaykerî çiqas bisebr bê ewqas zî weş kay kenê û hol bîryar danê.

# VERG Û ASTUER<sup>1</sup>

Arêkerdox: *Darjîn ra*



Cêk ben cêk nîben. Yo verg raştê qeflê meşnon şino. Meşnê remênî yenî pîser kuarme giredonî. Verg şino qeleviyon mîyonê meşnon.

Mêşnê vonî:

- Ti hê sekenî?

Verg vono:

- Şima zonî ez sekeno, ez şima weno.

Meşnê vêrg ra vonî:

- Ma hesretê u sotê tu wê şu serê inî qilî (tepe) çend sotî bi zuri, wa sotê tu biyo ma hema bî ma bu.

Verg şino serê êy qîla tulîz dono yo-di vengî zureno. Meşnê rem donî wera hetê dew ra remênî yo înan ra yo vergî ra meşnê şinî resenî dew. Dewij kenî qêrî qerebalix nonî vêrg dima verg remono şino. Şino raştê yo qeflê astueron şino. Şin şino verê yo cona von:

- Ez xu rî ina cona buerî. Şino erziyen aya cona.

Cona vona:

- Ti sekênî?

Verg von:

- Ez sekeno, ez tu weno.

Cona vona:

- Coka ti mi wênî dî bî serê paştê mi ez tikî cîrît bikerî û binê reheti bî hema bî mi biweri.

Verg şino serê paştê cona. Cona mil dona wera verg ho serê paştê aya dort nala şina zerrê dew. Dewij pê hesyênî qêrî qerebalixî pê sîlehon nonî vêrg dima, vergî kenî birîndar. Verg remeno şino ce xu wo verîn; ce astueron. Vono ez xu rî yo astuerî biwêrî. Şino verê yo astuerî .

Astuer vono:

- Ti hê sekênî?

Verg vono:

- Ez tu weno.

1 - Na estaneke, mi 03.12.2014 de, Dara Hênî de, taxa Afa ra, Hecî Husna ra girewte û nuşte. Hecî Husna dadiya min a û 60 serra ya. A, Dara Hênî ra ya. Wendiş-nuştişê aye çin o.

2 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Hîrine.

Astuer vono:

- Zaten ez bîyo extiyar, `emrê mi pîlo ezî hinî `emrê xu ra viyeren. Dî bion tarixê `emrê mi zî ho binê lingê mî wa nuşti, de bî şu mi na pê ez lingê xu berz kerî bion tarixê `emrê mi çendêk o hema mi bu.

Verg şino peynîyê astuerî de vindeno, astuer lingê xu keno berz. Verg sarê xu beno verê lingê astuerî, astuer lingê xu şono a mîyonê çimonê vergî de dono pêro. Verg erziyon war di beno derg.

Verg vono:

- Heywax mi rî heywax, ina çi xapi wi inon mi rî viraşt. La bayî, pîrik ma onîya tarîx; bayî, pîrik ma nişt cona şî cîrît kerd. Cîrît mi rî çi lazim o, tarix mi rî çi lazim o, ezo şîma depîşî ez xu rî şîma rehet biwerî. Şîma ena xap mi viraşt. Ez visto ino hal.

## SEBÎ MA

Neslîxan TEMEL<sup>1</sup>

*Ez to rê bêveng heşaya  
Zerrîya to rê qîraya vinderta  
Ti her wext çinî bî  
Ez e`mrê to rê amaya*

*Ti zerrîya kamî rê şî  
Çîmanê mi de esterî  
Ziwanê mi de ti, ti her wext  
Ti zerrîya kamî rê şî*

*Mi vîrê meke, meke to va vindertî  
Mi to vîrî nêkerd enka  
Ti kura de yê, ez ça de ya  
Nê fikirayîşî mi, mi ra gênê*

1 - N. V. T.

## KAYÊ ÇALIK

*Arêkerdax: Mehmet Nasîp YILDIZ*

**Cayê Kaykerdişî:** Erdo herrin

**Kaykerdaxî:** 2 tenî

**Materyalê kayî:** 5 hebî çalîkî û 20 hebî kerreyî

### KAYKERDIŞ

Ina kay 2 tên kay kenê. Her yo kaykerdax 5 hebî çalîk kenên. Înî çalîkan ra yo heb bena embar. Yo kaykerdax wuyer 20 hebî kerran beno.

Kaykerdaxî, her çalê xo pê 5 hebî kerran keno de. Embar veng maneno. Çalan xo kenî de û dest pê kenî kay. Kam vernî di dest pê kerd kay, kamci çala xo ra biwaz ay ra kerran geno destê xo û hetê destê raşt ra yo yo keno zerrê çalan. Kaykerdaxî, teyna eşkenê hetê destê raşt ra kay bikerê. Kerra pêynîn kerd kamci çal ay ra kerran geno û reyna yo yo keno çalan. Kaykerdax, kerra biker embarê kaykerdaxê bînî, o zî dest bipano serê çala xo a kerra oja di manena. Kay, heta kerraya pêynîn biko çala veng dewam kena. Kaykerdax bîn zî hina kay keno. Kay, heta kaykerdaxan ra kerrê yo biqedîyo dewam kena. Pêynî di kaykerdaxî, kerran embarê xo ra genî û amarnenî. Embarê kam di zaf kerra bîbê o kay zezenç keno.

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Hîrine.



## OSMAN BEG Û EMOY

Şahap LAÇIN<sup>1</sup>

Mi xo şinasna û nêşinasna û mi Osman Beg herrî ser o dî. Osman Beg herrî sipî weşte bî û şîyêne yaban, hêgayanê xo ameynî. Emrê ey zî heştay ro vîretîbî. Gedeyê xo pêro zewcnaybî û wayîrî keyeyî kerdîbî. Çer lacê ey bî û hîrê zî keynê ey bî. Nêmeyê domananê ey Enqera de ciwîyaynî û nêmo bîn zî Gêl de ciwîyaynî. Osman Begî bi keracala yabanî nê tutê xo pîl kerdîbî û eyelê xo firnaybî. Osman Beg û Emoy tena mendîbî û sey newe bizewcî û ti vana qay nê domanî çirey nêardî û pîl nêkerdî, vêşanî û têşanî ya na dinya caran nêdîya.

Yew torna înan, înan hete mendêne. Na torne kêna Ezmedînî bî û maya na geda wexto ke a bena û qelîsyayîşê aye de maya aye mirena. Na geda seyek manena û nameyê aye zî Eda panenê û Eda hêdî hetê Osman Begî û Emoy ra qeyta bena. Pîyê

na domane Enqera de ciwîyeno û newe ra zewcîyaybî.

Ezmedînî vetêne:

- Cinîya min a nikayine na domene nêwazena. Eda coka keyeyê bawkalê xo de mendêne. Osman Begî û Emoy rê yew mawerda keyeyê bî. Eda zî înan ra hes kerdêne û înan ra vatêne dayê û bawo.

Osman Beg her di goşê ey zaf giran bî û veng xeylê nêşîynê ey. Yew merdimî wexto ke ey reyde qalî bikerdêne û çî ke taxe esta û xo hesnaynî. Merdimî heya yew qise Osman Begî hesnayış daynî û dekewtêne goşanê ey mîyan û dinya a ya bîne dînî. Osman Beg heya ke şî rahmet û karê ey nêqedîya. Dosera rew hewn ra werîştêne û herrê xo hedirnaynî û werê xo têmeşyan naynî û şînî hêgayanê xo ser. Debara xo îzîmî rotîş û



îcarê hêgayan girewtîşî reyde vîyarnaynî. Qotî û kolî hewl ra û fekê berî ra caran kemi nêbîynî. Ma tewr gird qotî xora berê ey hete dîynî. Hêgayê Osman Begî nê m û zaf Dîyarê Koşki de biyê. Hêgayê Osman Begî yê tewr namdarî zî nê bî: hêgayê Lema pîle, hêgayê Denge, hêgayê Qonaxî... Kolî tewr zaf hêgayê Lema Pîl de biyê.

Osman Begî, cinîya xo ra û pitanê xo ra zaf ant û yew na zî Bexşîyanican ra xeyle ant. Bexşîyanicî ameynî hêgayê Osman Begî ra herra sipî berdêne. Hêgayê ey dewa Bexşîyanican ra nêzdî bî. Bexşîyanicî keyeyê xo ra zaf hes kenê û zerrê keyeyan û teberê keyeyan yewbin ra cîya nêbîynî û keyeyê xo yew lete ra çil sipî kerdêne. Merdiman yew têla muyê bi xo asan dîynî û zaf pak bî Bexşîyanicî. Bexşîyanican coka Herra sipî hêgayanê Osman Begî nêverdaynî û na herre kiştêne keyeyanê xo. No sebeb ra timûtim galo û qirta Bexşîyanican û Osman Begî biyê. Ma ge-ge eşnawitêne û vatêne ewro heyne Bexşîyanican Osman Beg kuto û serr û çimê Osman Begî wirdî kerdî û ganê ey pêro masnayo, Osman Beg berdo eşto nêweşxane. No wazîyet wina zaf dewam kerd. Osman Beg nêzdî peynîya emrê xo tay Bexşîyanican ra xelisaybî; çimki Bexşîyanican banî hêdî beton ra virastêne û herra sipî înan rê lewce nêbî. Osman Beg Bexşîyanican ra xelisaybî; la wele zî ver a ver Osman Begî rê zî lazim nêbî û nêweşîya ey aver şîbî. Ma, a yo wext vatêne se beno ke Bexşîyanican herre berde û caran na dinya de herre qedîyena. Bexşîyanican hêga de wele nêverdaybî û hêga pêro kortî kerdîbî. Hêga hêdî nêramîyaynî û cite hêga de nêbîynî. Osman Beg kerr bî; la kor nêbî û çimanê ey ra çiyê nêremaynî. Ey noqsanê ya goşanê xo çimanê xo de vêşî kerdîbî û Homa xora di beran merdimî ro nêdêkirreno.

Gêl de banê ey û kekê ey têhete biyê û

pêra biyê. Kekê Osman Begî rew dinya xo vurinaybî. Domananê kekê ey zî linge de malê kekê ey vernaybî û malê ey rotîynî. Osman Begî no wazîyet rê çirey dayax nêkerdêne û jerê ey qeub nêkerdêne ke malê bira ey biroşîyo. Osman Begî her wext vatêne: Nê kekê lacan û kekê kênanê mi de gunî çin a. Mehla de her wext vengê ey û qicanê kekê ey semedê malê dinya vecîyaynî. Çi ke taxe esta û vengê înan hesyaynî û mehla ver a ver xozan bibî.

Domananê kekê ey vatêne:

- Ma malê xo bar bike û lez ma malê xo biroşe û biwere. Çimê Osman Begî nê rê bar nêdaynî û xeyle qehrnaynî. No bacê xo heta şewdir hewn de bêxebîr vatêne û ma pêhesyaynî. No wazîyet nê m û zaf hîrê aşme hamnanî de binî û ma nê hîrê mangan de pêro Gêl banan ser o rakuweno û ma coka vengê Osman Begî hesyaynî. Serê sibay cem û cîranan veng da Emoy daynî û aye vatêne:

- Emşo heta nimacî Osman Begî nêverdayo û ma bibîkanê xo pêranê û hewn nêkewt çimanê ma. Emoy zî zaf fişker a û ge-ge vengê xo nêkerdêne û rey-rey zî eke dîkê aye biwendêne û aye şarî reyde yarî kerdêne û mewzû bedilnaynî. Osman Begî kênanê kekê xo ra zaf xuy kerdêne. Yew kêna kekê ey xeyle misaletê ey bibî û ey zî her dem na kênaya kekê xo reyde pêrodaynî. Ma yew roc keyeyê kekê Osman Begî de xebitiyaynî û kêna kekê ey bananê piyê xo virazena. Ma yew paca semedê roşnî polê Osman Begî de akerde. Osman Beg qayîl nêbî hetê ey de paca abo. No rîd ra Osman Begî ma û kênaya kekê xo reyde pêroda û va ganî şima polê mi het ser paca nêverdê. A yo roc ey dinya ma hesnaybî.

Osman Begî wina vatêne:

- Ti vanê, qay no hete de paca akerde û

aye ra Îstanbûl aseno û ti vanê, qay Gêl biyo Îstanbul. Na kênya orispî, Dîyarbekira pak û delale caverdaya û amaya dekwta nê qulkanê pîyê xo. Çi ke dinya bî werde û mird nêbî û yena nê xirban ra çi wazena. De Gêl o û boca herrî ya ne derg bena û ne zî kîr bena. Na paca ro çi aseno, tay wesayîti ver a Gêl ro şonê zîyara Nebî Harunî ser û awa gî zî dere ro vîrena. Osman Begî qalê xo zaf weş pewmawitêne û qalanê ey de yew mena ya xeylê xorîn bî. Yew na hamnanî bi no hewa vîret. Osman Begî de nêweşî hêdî xo weş nawit. Osman Beg çende nêweş kewt û hende vengê ey hema zaf berz vecîya. Osman Begî hêdî vîst û çer saeti nengî çînaynî, binê estuna Homa de çîyê nêverdaynî û çi fek ro biameynî û ey vatêne.

No wazîyetê nêweşî de pîyê mi ra va:

- Ez bananê xo beton kena, no dem de her şan semedê banî viraştîşî ameynî keyeyê ma. Yew şan, ez çirey xo vîrî nêkena û Osman Beg televîzyon ra ewnîya û televîzyon de Heyder Dumenî qalî kerdêne.

Osman Beg agêra ma serd û ma ra va:

- Na cinî kutiko heram girewto verada xo û qalî kena û şima zî fekê xo akerto, na cinî temaşe kenê. Na cinî tewir bi tewir gîjkê aye sipî biyo hema zî padaya nîya. Dinya xirab nêbo de çi nika xirab bo. Ma eke vengê xo nêkerdêne û nêhuyaynî Osman Begî Heyder Dumenî ser o hema zaf qalî kerdêne. Ma zî hêdî nêşkena xo zaf bitebîşe û ma pêro pîya yew fek ra huyayê. Ma hende ke huyayê û ma pêre zerrî girewte. Osman Begî no huyayîşê ma ra şik girewt û na rey zaf rind bala xo dayê televîzyon. Beyntar a zaf wext hema nêvîretîbî û Osman Begî reyna dest bi qalan kerd.


Ez vana:

- Na cinî nîya û no camêrd o û coka şima

zaf huyayê. Na rey ma huyayîş ra fek verda û Osman Beg huya û hende ke huya, huyayîşê ver çîl sûr bî. Eyb o, eyb o! No çi wazîyetê to yo û to nameyê camêrdan herm na. Ma a yo şan de bi no hewa wext vîyarna. Ax Osman Beg ax! Seba bazarkerdişê û viraştîşê banî ey û pîyê mi yewbînan ro qîreke dirnayê û xora veng zî zaf erey şînî ey. A yo şan de pîyê mi goşanê Osman Begî ra mend. Pîyê mi fiyatê viraştîşê banî aqilê ey vistîbî. No viraştîşê fiyatî banî ey rê zaf giran ameybî.

Osman Beg tadîya û pîyê mi ra va ke:

- Ti vanê qay no viraştîşê banî rê çi sono. Motora to ya û gedeyê to yê yanî ti qey hende zaf perrê mi ra ginê. Çi karê viraştîşê banî bî û destê keyeyê ma ra ameynî û no sebeb ra Osman Begî wina yew cumle şuxulna. Ay roc ra pey hêdî no vatişê Osman Begî fekê ma ra nêkewt. Ma banê ey viraştêne û o zî bi linga topale ma het ra qet dûrî nêkewtêne û zaf ra tay milqê linga xo ya topele çînaynî. Ti vanê qay na linga mi qotik veto û na linga bîne zî sey to nîya û qey ti decena û na linga bîne nêdecena. Gêl de milqê Osman Begî namdar bî. Osman Beg bi helo nêweş zî cayê xo de nêvindertêne. Osman Beg roco êne tik û tena şîyêne çarşû û ê rocanê bînan zî timûtîm yaban ra bî û heta ke nêweş nêkewtîbî. Demo ke nêweşîya ey aver şî û linga Osman Begî zî yaban ra biryaybî. Semedê na nêweşî Osman Beg şînê nêweşxane û ameynî. Domananê ey nêweşxane de nêşkenaynî ey bitewşe û no sebeb ra ey ardêne keye û reyna berdêne nêweşxane. Nêweşxane de ca Osman Begî nêkewtêne û nêweşxane de nêetiraynî. Osman Beg bi no helê nêweşî ge-ge şîyêne yaban hêgayanê xo ser o û sey yew domanî bermaynî. Osman Beg semdê nêweşî zaf keye de mendêne û cinîya xo Emoy reyde pênerdêne, vengê ey û cinîya ey zaf



©Yekbun Stêrk

vecîyaynî. Cinîya ey zî Bîbnokê<sup>2</sup> ra ya. Verê ke Osman Beg hema nêweş nêkewtîbî û o zaf ra tay yaban ra bî û vengê înan zaf nêvecîyaynî. Osman Beg betilyaye bî rew rakewtêne û Emoy zî sey xo kerdêne. Seba nêweşî o hêdî keye ra nêvecîya û şanan zî rew hewnê ey nêameynî. Emoy ke bişînê keyeyê embiryanan Osman Beg keye de bom bînî. Osman Beg vecîyaynî serrê leweyê banî ser û çimê xo padaynî û fekê xo akerdêne û binê asminê kewe de çî bî vatêne. Na cinîya mi, binê mexrebî tarî beno nêbeno, keye ra vecîyena û zîqaq bi zîqaq gêrena, Bûkilbêrê çarnena. Na cinîya mi, mi hewna kena û keye bi keye gêrena. Tî vanê qay keyeyê aye çin o. Emoy wexto ke nê qalî Osman Begî pêhesyaynî û vatêne: Wî dayê ke dayê û nê qalê xo dimare kerdêne. Osman Beg hêdî heta şewra pitpityaynî. Fekê ey ver de silîme

2 - Yew dewa Pîranî ya, bi Tirkî nameyê aye Bahçeköy a.

çinîbî çî fek ro biameynî vatêne. Osman Begî nêzanaynî û ceyranê înan qaçax o. Rocî o şono sobeyê ceyrani hemamî aqilyeno û bala xo deno awa sobeyî. Osman Beg nîyadeno ke na awa sobeyî ra her wext giryena û xij-xij veng sobeyî ra vecîyeno. Ma rocî newe ra ewnîyayê ke vengê Osman Begî yeno û vano: Omet û millete bêrê vînê, awa şarî sobe de germ bena û tanya awe şikiyena û şar pey serrê xo şiweno. Cinîya mi vîst û çer saetî fişa sobeyî piriz ra ya û awa sodeyî vana: Xij-xij giryena û giryena. Tî vanê qay nê perreyê ceyrani qine ra yenê û ez bena û dena dewlete. Mi zî gunê yo ez zî şew û roc xebitiyena û xula ez dewlet ra dewlemendêr nîya û yew sixortaya min a feqîr û mehêre çin a. Ez nika seni bine nê deynê ceyrani ra vecîyena. Osman Begî bi no hewa cinîya xo rê pêserre kerdêne.

Osman Begî vatêne:

- Dişmena mi keyeyê mi de ya û dişmen zerreyê keyeyî ra bibo û caran o keye hêdî xo yeno. Nê vateyê Osman Begî mehla de fek ra fek gêraynî. Yew qutîya Osman Begî bî û na qutî keyeyê ey de nimita bî. Metebê na qutî zî mundiya Osman Begî ver o bî. Osman Begî çî ke perreyê xo bî û na qutî de pawêtêne û ey perran ra zaf hes kerdêne û yew qurîşê xo zî ca ra têndaynî. Osman Beg bextê xo de zaf pêt bî qet bext û sozê xo nêwerdêne û xo serre ra camêrd bî. Karê ey de qulopilo tede çinîbî. Eke yew rey qale fekê ey ra bivecîyaynî ey na qala xo ardêne ca û wazena wa serreyê ey şêro. O zaf çim mird yew merdim bî û çirey çimê ey malê şarî de nêbî. Cinîya ey Emoy derg û dilay bî û aye zî ver a ver kokim bîya û ruçikyaya pêser. A destê Osman Begî ra zaf anto. A keye de zaf nêvindertêne û zaf ra kemî şîyêne keyeyê embiryanê xo. Keyeyê Emoy taxe pêro bî û şinî keyeyê her kesî. Yew manga înan bî û Emoy timûtîm na manga dima gêraynî

û mehla de pîl ra qîcî na manga Emoy şinasnaynî. Na manga her wext vinî bîynî û Emoy zî na manga gêraynî.

Şarî Emoy ra vatêne:

- Emo, Emo! Na manga hêdî şima rê çî hewce ya, malê Osman Begî zaf o û şima şew û roc biwerê no mal nêqediyeno.

Emoy şarî ra vatêne:

- Yew derdê yewî nêzano û bi şîtê na manga qiriqa ma hît bena. Çimê şarî ra wîna asaynî, zerreyê keye de se beno û nêbeno kes nêzano. Emoy keye de çî aye dest bikewtêne û Osman Begî ra nimite yew hewa de no çî berdêne û rotêne. Osman Begî xora perreyê nêdaynî aye. Tay hêgayê înan şarî deste bî û şarî îcare nê hêgayî ramitêne. Eke nimite biney îcarê hêgayan biameynî û Emoy no îcare girewtêne. Osman Begî ne paştîya xo cinîya xo bestêne ne zî paştîya xo tutanê xo bestêne. Xora çimê gedeyanê ey mergê ey de bî û mela rew Osman Beg bimiro û ma malê ey biwerê. Çimkî gedeyanê datê înan malê piyê xo werdîbî û domanê Osman Begî ti ra mendîbî. Çimê eyelanê ey qutîya ey ser o bî û Osman Begî zaf weş na qutîya perrenê xo keye de nimitêne. Yew roc lacê ey, ey taqîb keno û qutîya perranê ey vînenno. No lacê ey qutî beno, qutîya ey şikneno û perreyê ey çî ke estî qutî ra veceno, beno. Osman Beg çend rocan ra dima qutîya perreyanê xo aqilyeno ke qutîya ey yewî şikita û çî ke perreyê ey estî û berdî. Osman Beg zano ke kamî perrê ey berdî. Yew menge seranser fekê Osman Begî ra qalê perreyan vêşer çiyê nêvecîya. Na dinya de çende zewtî bî û dayê lacê xo ro. Osman Beg nê perreyan ser o hêdî zaf tepa şî û vengê ey zî taxe miyan de nêvecîyaynî. Cem û cîranan vatêne, Osman Beg zaf helak o û ewro meşte mireno. Osman Begî nêweşî zî tay nêante. Da des serrî bî ke na nêweşîya

dewam kerdîbî. Osman Beg estî û postî ser o mendîbî û newe ra bibî yew domano new-des serre û çimê ey ê renginî şîbî ay pey û gola çimanê ey zaf xorîn bibî. Merdim pirnika ey bitewşo û Osman Beg gan deno. Her çiyê ey vuriyaybî; la tuk û tena ziwanê xo ra nêkewtîbî, milqan, zewtan û qalanê weşanê xo ra qet nêmendîbî. Qalê ey mena xorîn hema zî cayê xo de bî. Çimkî ey çimanê xo ver de dî ke gedeyanê kekê ey se kerd malê kekê ey, nê ser o zî zaf fikiraynî. Na dinya ra hema zî çimê ey mird nêbîbî. Wisar o û dinya reng bi reng abîya û merdim qayîl nîyo ke yew game zî zerre de vîndo. Wîna yew roc de salaya Osman Begî ancîyayê û ma xora şan de pêhesyaybî ke Osman Beg şîyo rahmet û dinyaya xo bedilnaya. Cem û cîranan meyîtê ey hewa na û dest bi yasê ey kerd. Çi ke domanê ey bî ameyê pêser. Emoy hewl-xirab mêrdeyê xo vinîkerdîbî û zaf xemgîne bî. Şew saet nêzdî yewendesî bî keyeyê Osman Begî ra newe ra vengê qîrî berz bî û ma va qay semedê Osman Begî bermenê. Maya mi şiyê keyeyê înan û ma zî aye dima şiyê keyeyê Osman Begî. Na rey Emoy pakunaya û ma hema keye ra nêveta û nêberda nêweşxane û a zî gan da. Vîst û çer saetî beyntar a nêvîretî û mêrde û cinî pêser o merdî.

Şarê taxe hêdî vatêne:

- Perreyê Osman Begî gedeyanê ey rê mendî û Emoy xo zaf bejna û coka pakunayê merde. Fekê her kesî ra yew qale vecîyaynî û ka ez se bika Osman Beg çin o ke vaco fekê şarî telise nîya merdim bi layî besto. Kam çî zano ke se bî, bi ecelê xo beno ke Emoy şêro rahmet. Homa rahma xo înan biko. Domanê înan zî hêdî asan yew hewa de eşkenê malê înan biroşe, biwere. Ma rê çî lewce yo û qalê Osman Begî renginî hema zî goşanê mi de yê.

# KERRÊXALÎ

Arêkerdoxe: Gullu PINAR'

No kay tewr tay di tenan reyde kay beno û tewr zaf zî çer tenan reyde kay beno. Semedê no kayî verê verkan panc hebî kerranê gilori peyda kenê. Nê kerrî hem hete merdiman ra virazyenê hem zî wina gilori yew hewa de merdim eşkeno vîno. Nê panc kerrê zî ganî yew hewa de xişin bibê. No kay yew ra dest pê beno û panc de qediyeno. Nê panc qisimê kay zî wina yê:

1. Her panc kerran erzenê erd û nê kerran ra yew kerra kaybaz gêno destê xo. Na kerra kaybaz erzeno hewar û ê kerranê bînan erd ra gêno. Yew yew zî eşkeno bigêro û her çer kerran yew rey dezî eşkeno erd ra bigêro. Wexto ke kerra eşte hewar û na kerra destê kaybazî ra bikuwo kaybaz veşeno û dore vîrena kaybazê bînî.

2. No qisim heme panc kerran finenê erd û yew kerra

gênê xo dest. Na kerra erzenê hewar û na rey di-di kerrê erd ra gênê destê xo. Wexto ke kerra erzenê hewar eke kerra merdim nêşkeno biteşo û no merdim veşeno. Eke no qisim de merdim wexto ke kerra erzeno hewar û di kerran nêşkeno erd ra bigêro û no merdim veşeno. Wexto ke kerra fineno hewar û ganî di kerran tena bigêro û destê ey di kerrayanê bînan nêgêno eke destê ey di kerranê bînan bigêno û no merdim veşeno û dorê vîrena merdimê bînî.

3. No qisim de her panc kerrê finenê erd û yew kerra erd ra merdim gêno. Na kerra erzeno hewar û yew rey de yew kerra erd ra gêno û dolêma bîn de zî hîrê kerran erd ra gêno. Wexto ke kerra eşte hewar û na kerra nêşkena biteşo û no merdim veşeno. Wexto ke kerrê erd ra gêrotî û destê ey nê kerran gîna û no merdimveşeno û dore vîrena sewbî tenî.



4.No qisim de her çer kerrê yew dest de benê. Nê kerrayan ra yew kerra erzenê hewar û engiştâ şaedetî erd sawenê û vanê: pişik veng vecenê. Wexto ke kerra eşte hewar û na kerra newe ra nêşkeno yew destê reyde bitebşê û no merdim veşeno û dore vîrena sewbî tenî.

5.No qisim, qismo peyên o û no qisim zî gorê qismanê bînan biney çetin o. Kaybaz verê verkan engiştâ şaedetî qelbneno engiştâ ortî ser û bi no tewir destê xo sey yew pirdî roneno erd. Ma vace yew ber virazeno. Her panc kerran erzeno erd û dima nê kerran ra yew kerra erd ra gêno.

Kaybazanê bînan ra perseno û vano:

- Nê çer kerran ra kam cin xalê şima yo. Yanî çer kerrayan ra yew nê kaybazî nişan kenê û na kerra bena xalo. Merdimo ke zaf weş no kay ra fehm biko û kerraya ke nêzdîyê fekê berî de kam cin a û na kerra nişan keno. Kaybaz hêdî dest bi qismê pancine keno. Yew kerra erzeno hewar û ê hîrê kerrayan verê verî ro vîyar neno. Nê hîrê kerrê ganî kerraya xaloy nêgunê. Nê hîrê kerran yew bi yew binê pirdî ro vîyarneno û tewr peynî de zî kerra xaloyê binê pirdî ro vîyarneno. Wexto ke kerra eşte hewar û na kerra dest ra bikuyo no kaybaz veşeno. Eke nê hîrê kerrayan ra yew kerra kerraya xaloy biguno û no kaybaz veşeno. Nê kerrayan merdim hêrî rey de eşkeno berî ro vîyarno û eke hîrê rey vêşêr bibo no merdim veşeno.

No kay seranser wina kay beno û cayê kayî herre ser o beno yan zî yew

kerra raşte ser o beno. No kay zerreyê keye de zî kay beno. No kay zî nameyê xo qismo pancin ra gêno û no qisim de xalo eşkera beno û merdim xalê xo weçiteno û tewr zaf kaybaz zî no qisim de veşenê.

## NA DINYA

Sahap LACÎN

*Vanê: Na dinya merdimî xapênena  
Dinya senî merdimî xapênena  
Merdim şono, dinya ca de manena  
Merdimî yenê dinya xo nêvurînenena*

*Vanê: Dinya vuk û veng a  
Tikî merdiman rê rup û roşin a  
Tay însanan rê tip û tarî ya  
Ê ke rocê xo roc kenê, înan rê zip û zelal a*

*Vanê: Ma ewro estî û meşte çin î  
Meşte beno û ma newe ra estî  
No siba de zaf-zaf rocî estî  
Yew siba mîyan de zaf sibay estî*

*Vanê: Dinya ra çim akerde şî  
Na dinya ra hema xeylê mird nêbî  
Kar û gurê xo na dinya de hema nêqedênaybî  
Qey çirey karû gurê na dinya qedîyaybî*


*Vanê: Na dinya de mixê felekî çareyê to ra nîyo  
Na dinya to rê nêmanena û roc yeno merg zî yeno  
Merg wexto ke ame û verê der xebere nêdano  
Merg pîl û qic nêvano û to na dinya ra gêno beno*

# REMAYÎŞÊ URISÎ

Huseyîn KESKÎN<sup>1</sup>



1 - N. V. T.



Ez wextê remayîşê Urisî(Rus) de diwes serrî bibî ya. Cuwîyayîşê ma dewe de zaf weş bibi. Ez û di keynê apê mi ma tim û tim zerrê dewe de ma kay kerdenî. Yew roj xeber amî vatenî kî; Uris û Arminî biyî yew û Melon fetah kerda, hetê Hezarşa ra yenî. Zerrê dew de bibi yew qerayîşê şarê ma, her kes yew hetî sera remeni. Milk xo, kîye xo çitê yini bibi se, pêrun war verdênî û nîzanayî seri remenî. Dayê mi, babî mi, eqrebê mi, mi û di keynê apê mi yin ma war verdeyî û remayî şîyî. Ez û wîrdî keynê apê xo ma pîya hetê Çewlîgî ra remayî. Rîyi ra ma hinî zaf bermayî, hinî zaf bermayî kî çîman ma de hesir nîmendî. Ez û keynan apê xo ma şîyî, şîyî ma resayî verê Rû û ma zaf qefilyayî bibî. Ma xelik şîyî û ma binê yew kurnê darî de ma kotî ra. Yew lîyêf ma de bibi. Mi ay lîyêf anciti keynan apê xo seri û ez zi kiştê yin de kotîya ra. Wext roj zerrik eştî ez hesya ya xo û mi veng da keynan apê xo. Ma zaf biyî veşan labêle çîki zi ma de çîni kî ma xo rî biweri. Ma xelik şîyî û ma amayî verê Rû . Ma xo dawa awê Rû ri, Rû ma berda, mi asnaw kerdi û ez pey zor

xelisya ya. Ez resaya kiştê Rû. Wext ez xo ra pey anîya ya keynê apê mi Rû de şinî. Ez yew ca ra vazdena yew ca ra qerena. Ez qerena nêqerena çik fedî nîkeni, kes cêk ra nîvejîyeni û kes cêk de çîno. Keynê apê mi verê çîman mi ra biyî vînî. Ez binê xo ra cor şîya, yew keyne apê mi xelisya ya. Ez şîya cayê yi mi yi ra vati;

- Gorê la Keskê ça wa, ya nêxelisya ya ?
- Nê ya Rû de şîya.

Wext Gorê mi ra otîri vati, ez nuştâ ru û mi bermayîş dest pekerdi. No bermayîşê mi û Gorê nîm saati devam kerdi. Ez vera şîya Gorê ra û ma kotî rîyi. Ma şîyî, şîyî ma raştirî yew şikeft ameyî ma îja de binê bine xo gureti û ma veşan, teşan sarê xo naru ma kotî ra. Reynê bi serê siba û ez hesya ya xo, mi dest kua Gorê ra, Gorê nêhesya xo, mi sekê nêke Gorê nêhesyena xo. Wext mi dest xo na qelb Gorê seri ez pey hesya ya kî Gorê gevser merda. Ez hina îja de berma ya hina berma ya zêk hesir mi bibî golê aw û ez tedi xeniqaya. Nim saet çuwa pey yew mêrik dur ra mi ra asîya, mi ca xo binê yew kurnê dare de nimiti. Merik ameyo caye mîyit Gorê de vindert û qerra.

- Keynê mi ti hana çada se, biyê îta ez qariş ti nîbena, ti mi ra metersî.
  - Wext merik otîr va, ez kurnê dar ra vejîya ya omîya ya cê merik.
  - Keynê mi ti ça ra wa, ti îta di sekena?
  - Xalo ez dewê Hezarşa ra ya û ma Uris veri remayî. Yew keynê apê mi rû berda yew zî gevser merda.
  - Wazîyet ti zaf xirab o. De ti no lîyêf xo bidi mi ez biancî no mîyit seri.
  - Temam xalo!
- Wext mi lîyêf da ci, yi yew paskil da mi ri



û nuşti hêrr xo da ra şîyi. Ez yi dima vazda wa mi hini lavê yi kerdî, hini kerdî labêle çiki zi fedi nîkerdi. Ez reynê tepya gera ya a û ez amîya ya caye Gorê. Mi pey destan xo ard kendi û mi Gorê îja de kerdî mezêl û mi da ra û ez şîya. Ez şîya, şîya raştirî yew şonê bolê bizan amîya ya. Ez şîya caye şonî. Şoni zana ez zaf veşan bîya û yi monê xo ra binê nan veti da mi û mi îja din nan xo werdi. Mi şoni ra xatir waştî û mi rîye xo devam kerdî. Ez binê şîya zerrê yew çale de kîyêko zaf rind raştir mi ameyî. Vere berî de yew mêrikêko kal herdîş sipê hanû runiştî yo. Ez şîya caye mêrik, yi mi berda kîye xo. Di keynê mêrik û di zî bizan yi bibî. Labelê yini kurmanc bîyî, mi qisekerdiş yini ra çiki fam nêkerdîn. Mêrik mi zi yew keynê xa zanenî, mi keynan xo ra cîya nêkerdenî. Ez hîri seri cayê yini di menda, ez ziwan yini musa ya. Mêrik mi ri zaf heskedenî. Yew roj mêrik ameyî caye mi vati:

- Yew merdum ameyo vano kî; ti wayê yi wa. Ti biraye xo bibinî se, ti yi şinasnena

- Ê ez bibinî se, ez yi şinasnena.

Ez û mêrik ma şîyî caye ay merdum. Mi wext dîr ra ay merdum dî mi zana kî birê mino Mehmedî yo. Ez vazda ya vera şîya lingan biraye xo ra. Biraye mi mi kerda berz veraşî mi ra û yew lew na mi ra. Ma şîyî kîye mêrik, mêrik qeysîyî, tûyî kerdî çuwalan û kerdî astorê biraye mi bari. Ma mêrik ra xatirî, halalî waştî û ma da ra şîyî. Wext ma resayî verê Rû bibi şewî. Biraye mi adir kerdî we. Ma nan xo îja de werdi ma îja di kotî ra. Bi serê siba ma kotî rîye dew û badê nîm

saet çuwa pey ma resayî dew. Ez dur ra anîya ya dewe ma ra dewê ma pêrun bîya xirabi mi biraye xo ra vati:

- Bira sebîyo no dewe ma ya delalî?

- Wextê Urisî ameyî zerrê dew û dewe ma pêrun veşna kerdî tar. Ayon îta ra remayî ayon ra zaf tay geprayî a.

Mahmedî mi berda kîye xo, ez îja de pey hesya ya kî nê dayê mi, nê bavê mi, nê zî şeş biraye mi nê geyrê a. Ez zî yew ser dewe de menda û dima ez zevijya ya bîya wayer rî qijan.

## MERG

Mehmed KAÇMAZ<sup>1</sup>

*Wexto ki gunger veciya mi ra*

*Fek mi bî ziwa ez bîya zerd sey şema*

*Çokê şikê dest bi giron zon nigera*

*Çim bi tarî gueş bi giron muni şika*

*Xu vîra mek merg êst merg bira*

*Her çî tu dima munen ti teyna şin in riyir a*

*Mal tu qic tu nişken tu bixelis*

*Emel tu he tu ya ti sekerd ti ken xu bira*

*Rîyî derg dinya hera ya tu vatên qe niqedîyena*

*Mal şîrîn mulk bi zaf tu Huma kerd xu vîra*

*Qebir tarî û teng a ço dest derg nîken het tu ya*

*Lewê erd di ti sekerd binê erd di ti yê vînên bira*

*Hê ça hero dehebun nat wet xu ra*

*Tu vatin bela he mi ver ez şuêr ça he min a*

*Ti ina teyna munen ço paşt nîvîcen tu rê*

*Çep dest ra tiway nin ez sekir sebikir tu rê*

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Hîrine.

# WEXTÊ XELA<sup>1</sup>

Arêkerdax: Mehmet Nasîp YILDIZ<sup>2</sup>

Pîrik mi ma ri qise kerdê, vaten wextê yin di xela vi. Vaten tawa çînî vi, erd bi zê dest, hêr û şamik tena bi vî. Çayir kerana omênê, ma şîyen kênên û ma ardê kuên kuên, poten kerdê zê mastawa ma werdê. Ma şamî kerdê werdi, ma xu ri zî werde. Vaten tawa çînî vi, e dorek yaban ra şîya, cîranek mi ome, torêk ho tedir. To ri êwil to ri muyinî vî. Vate, çik ho torê di. Vate yi va qê ez şina ci ra gena. Rama, va ez kesanê xu nedana. Vate ez şîya şîya, ez gêrawa gêrawa şew omi ez şîya kota yo gewêk, mi bizêk dî. Mi dest ke bizêka hin xurtê vî. Vate mi a biz ard, mi sarê birna, mi nimit, min û hevalan ma werd.<sup>1</sup>

Vate xela vindert. Ma şî yo cekek, merêkêk ho oca ruenişto. Ma çend heval vî. Vate ez ownîyawa merêkêk vera vano:

- Hewo we, hewo we, çik tewer ra çik benc pera! Vate, merik manga sarê birnên, nimmên, çarşêf êncen ci, cînîya xu ra hina kên pê cînîya ey bizan, pê binim no.

Cînîya cê bena êncena ser, merik pê nezan manga cê va:

- Bawo mi vate xela vindert, ma heywon da arî, ma heywon pawit, ma bî wûyer heywon, ma bi zengin. Vete, çend ser mend, hinna ê merik vatên:

- Biza mi bîya vin, bizêk hinakî bîya vin.

Vatên ruejek bizê kî mi zî hina bî xurt, bî gird. Biz pîrik mi gird vî. Vatên mi ard

1 - Na hedîse, mi 13.08.2014 de, Bongilan de, mehlaya Deşta Kesk ra, Remizya Yildizra girewte û nuşte. Remizya Yildizmaya min a û 54 serra ya. A, Bongilan ra ya. Wendiş-nuştişê aye çin o.

2 - N. V. T.

omî, mi biz berd şîya oja.

Va:

- Ti çî ra ina biz arda?

Vate ez û heval xu vî. mi cir qise kerd, mi va ma o çax, hinakî kerd, ina bizî biza ti wa. Hêta zê ma bi vî ê merik ma ra vatê ina biz cîsnê bizanê pîrikê ti wo.

## MÎN VA MEŞO

Hamza Arîç<sup>1</sup>

*Min va meşo*

*Ya şî*

*Yê va vin*

*Ez şîyo...*

*Ya şî*

*Ez bermawa*

*Çimî yê*

*Çimî midî mendî*

*Boyê mi*

*Engiştê yê di mendî*

*Ez şîyo ya bermê*

*Vengê mi*

*Vengê yê di mendî*

*Areq yê cûsî mi di mendî*

*Areq yê zerê mi di mendî...*

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî, Sinifê Diyîne

## ZIWANÊ MA

Neslîxan TEMEL<sup>1</sup>

Ziwanê ma ziwanê bêkesî yo  
 Ziwanê ma her wext teda de yo  
 Ziwanê ma binê ziwananê şarî de gan deno  
 Şima nêzanê o wext ziwanê ma mireno

Çarşû de keye de û her ca de zîwan wexto ke qalî nêbî  
 Şar bi ziwanê xo û bi kulturê xo şar o  
 Eke nê pêro demo ke çinî bî, zîwan zî çin o  
 Şar ha ciwîya ha merd ferq çin o

Maye qicê xo, ziwanê xo reyde pîl nêkerdî  
 Qalîkerdiş, huyayîş, bermayîş bi ziwanê dadî nêbî  
 Na dinyaya zûrayîn de mendiş rê çî hewce yo  
 Teda û zulm vînayîş ra ma rê hêdî çî mendo

Domanan ziwanê xo de wexto ke qalî nêkerd  
 Xo, ziwanê xo de nêdî û tehmê weş qalîkerdişî nêgirewt  
 Ziwanê sewbî şaran reyde qalîkerdiş ma rê çî lazim o  
 Zîwan bi tutan ciwîyeno û xo aver beno û xelîsyeno

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Zazakî Sinifê Hirine.

WEY DERAN O<sup>1</sup>Arêkerdax: Şahap LAÇÎN<sup>2</sup>

De wey Deran<sup>3</sup> o wey Deran o wey Deran o  
 Watî eno Deran mêrat mano wey Deran o  
 Watî gidî bexçê Nezîrî cayê firingan û balcanan o  
 De honik o serrê lewan binê tehtan o  
 Watî keynê Emîna<sup>4</sup> eno Nezîr to ra ki se wano wey Deran o  
 Watî keynê mi ra çî nêwano, wano bê bibê veyva Kê Îmaman<sup>5</sup> o  
 De keynê Emîna ti vinderta miyanê enî beran di  
 Watî keynê to zerra mi helnaya Hulan<sup>6</sup> di  
 De Emîna heyran ganê mi mano eno gan di  
 De keynê xula mi suwend werdo ez to bena eno şan di  
 Wey Deran o wey Deran o wey Deran o mêrat mano

1 - Na deyra, Nezîr Dîcleyî ya û ey xortêya xo de waştâ xo Emîna ser o vata. Na deyre, mi 28.09.2015 de, Gêl de, Mehlaya Dize ra, Nezîr Dîcleyî ra girewte û nuşte. Nezîr Dîcle, cîranê ma yo, Gêlic o û 86 serre yo. Wendiş-nuştişê ey çin o.

2 - N. V. T.

3 - Nameyê cayê bexçanê Gêlican o, serra 1997 de Awbendê Dîcle virazîya û Deran binê awe de mend.

4 - Nameyê waştâ Nezîr Dîcleyî yo û Nezîr Dîcle aye reyde zewcîyayo û serranê 1990 de şîya rahmet.

5 - Gêl de nameyê yew babe/barexe yo.

6 - Nameyê mezelanê qralanê Asurîyan o û Hulan rêzê Deranî de ca gêno tîya binê awe de nêmento; la sînorê awa Awbendê Dîcle ge-ge dormarê nê Hulan gêna.

De keynê mey mevîre xur ro xur ro

De keynê mey mevîre eno ro yo

De watî keynê lacê mi mey mevîre xur ro xur ro

De wanê şîma veyva Zeynoy<sup>7</sup> berda çim to ra finena leym û gunî pede şono hezey do yo

De keynê xula honika awa enî çem û kîya

De watî dayê xula eno xorto anarên Nezîr mi ra ewnîya ki wuya

Watî keynê xula to canêverdeno û ebrê keno hezey cenî ya

De dayê xula mi rê suwend werdo eno Ku'ran o

De wey Deran o wey Deran o anû mano

De dayê xula serrê hêgay duz o ki meydan o

De dayê bala xu dana rêzedê Hulan o

De dayê xula lacik serra cêr bîyo piska çarî ki tadano

De kam o vernîya biz û bizekanê Nezîrî ki tadano

Watî Emîna heyran bê bibê xiznîya Sîryada Elî<sup>8</sup> Kê Gedan<sup>9</sup> o

De Emîna Allay kena bê bibê veyva Kêdê Îmaman o

Wey Deran o wey Deran o wey Deran o mêrat mano

De keynê xula eno nimacî ez vîrete rayîran di

De Medîna heyran bala xu mi da ti ama fekdê paca

De vînde ez to ra yew qali waca

Wey Nezîr Allay kena şo ez ko derdê xu banca

De wey Deran o wey Deran wey Deran o anû mano

De dayê xula bala xu dana bexçedê Nezîrî cayê hinaran û tuwêran o

Watî gidî şar vîreno destê xu fineno çînenno mi ro beno kul û derd o

De wey Deran o wey Deran wey Deran o anû mano

De watî gidî eno nimacî qirr dekuwo yew nêmano

Watî waya Hesênî Xalê Elî<sup>10</sup> yê teyna mano

De wey Deran o wey Deran o wey Deran o mêrat mano

7 - Nameyê e'ma Emîna yo, eke Nezîr Dîcleyî Emîna nêrimnaynî, piyê Emîna aye daynî lacê Zeynoy.


8 - Merdima Nezîr Dîcleyî ya.

9 - Gêl de nameyê yew babe/barexe yo.

10 - Kekê Emîna yo.

# KITABÊ "DÊSAN DE SÛRETÊ MA NIMITE" YÎ SER O

Huseyîn KESKÎN'



Dêsan de sûretê ma nimite namê kitabê Roşan lezgînî yo. no kitabe 2005 de îstanbol de hetê Vatê ra çap bîyo. No kitab 64 ripel o û 27 şîr tedi estî.

Hetan nika ziwanê ma de zaf şîrî ameyî nuştiş. Aye kî nusîyaye, qismek namê şîr nîyo pera labêle qey tamê şîr nîdanî wendox. Labelê no kitabê Roşan lezgîn hem wendox dano fikiryayîş hem zî wendox çend rey buweni se awdêk tera maena vejani. Noştox no kitabe xo pey fekê standartê

Vatê nuşti dawê ay ra çi mintîqa de wendox zazakî bibî se no kitab eg buwenî tera fam û fikiryayîş keni. No şîranê noştox de exleb hesretîye welat esta. Nuştox teberê welatî de cuwîyeno hesretîye noştox dawê inê ra yena.

Şîrî kî kitabê Dêsan de Sûretê Ma Nimite de yî heskerdişê welat û ziwan, eşq û felsefe, şîret û salixî, derd û kulî hemi pey yew hewayê lîrizmî ameyî nuştiş. Kam kitabê Roşan Lezgînî biweni, yew fikro xorin û hîra tedi vîneni. Her wendox gore zanayîşê xo, tera tam geno. No kitab kitabê Şîranê modernîzmîyo. Her wendişî de tera zobî maena eynî şîre ra vejenî,

Ez kitabê şîranê Roşan Lezgînî Dêsan de Sûretê Ma Nimite ra yew şîrê neqil bikerî:

*Her kerra koyê xo rê xeml a*

*Ey yara raştikêne, ti ha ça?*

*Her çekuye ruhê mi rê rîsalet*

*Her çekuye welatê mi ra leteyêk*

*Her çekuya ke tehmê aye*

*Serê ziwanê bapîranê mi ra yadîgar*

*Û her kelim latê destanê zamanî ra cewherêk*

*Ax merdim ser a biremo zî maneno welatêxo*

No şîrê nuştox yew tamêko zaf weş dana wendox. Nuştox pey no şîrê xo wendox dano fikiryayîş. Her wendox no şîrî ra yew peyam vejeno. Wext mi no şîr vendi,

mi zana kî no şîrî de hesretîye welat,  
heskerdişê zîwan esta. Nuşttox no letê şîrê  
xo de xususîyetê zîwanê xo seri vindeni.

*Ez şîma ri yewne şîr dano şînasnayîş.*

*Berê Koyî ra hetanî Berê Ruha*

*Gaman peymawena ez*

*Ver û verê bedenî de...*

*Vayêko honik yeno,vayê koyan*

*boya rîhanî tede*

*Vakur ra yeno,nermek...*

*Xuşşîni kewta pelanê çîneyeran ser*

*Valêrî porê xu şane kenê vayî ver de*

*Xubêrî boyêka xumrî resnenê heme ca*


*Çîveçîvê meqesokan a,mîlçikî bi wîlewîl*

*Porê bedenî; çokêk vaş*

Noşttox no şîrê xo behsê Amed keno.  
yew zanêko zelal yew zanêko herikyayî ser  
ra behsê Amed keni. Eg wendox no şîr  
biweni se zêk ho Amed de, zerrêye suran de  
geyreni. Nuşttox şîran xo de wendoxan dano  
fikiryayîş. No rezê nuştox di "valêrî porê  
xo şanê kenê vayî ver de" zaf yew maenêya  
xorin tedi esta. Wendox zanen kî noşttox yew  
şaîreko gird o.

## MEH GEJ

Darayênî ra




Rojêk mebus 'Evdirehman şino Darayênî. Qehwe qehwe, dikon dikon, parq parq gêreno zîyarê şarê Darayênî keno. Menşurê gejon Darayênî ra Meh Gej esto. Meh Gej şino destê Mebus 'Evdirehmanî geno tê zîyar keno, vono; xocam dî tikî peron bi de mi. Mebus xu cebi ra vecon 10 mîlon dono ci. Zaf zorê Meh Gêj şino, çi to kî 10 mîlon tayê çi zaf mi nîdê. Meh Gej xu ceb ra 5 mîlon vecon nono ê 10 mîlono ser têpya dono Mebus 'Evdirehmanî, ti ra vono; xocam îni 15 mîlono biger ti xu rî pê çay wênî. Mebus mabenê şarî de şaş moneno, nîzono sênî o ca ra şêro....

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Zazakî Sînişê Hîrine.

## NAMEYÊ WERDÎ: PELXAÇ

Ruşan AYHAN<sup>1</sup>



**Malzeme:** Nîm kîlo ardî, yew namkî qarme, sol, mayê.

**Virastiş:** Ard elawîn miyan ra maye deben, mîrê Pelxaç ben zê mîrê nan. Yew gude mîrî ma kenî a dora pê ma qarme dekenî. Miyanê mîr û yewna gudê mîr ma kenî a. Êy mîr zî ma kenî ê bîn ser kenarona ma der-dorê. Pelxaç padenî û ma ey mîr dekenî miyanê pûrn. Pelaçê ma pojîn ma pê 'effiyet wenî.

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Zazakî Sînişê Hîrine.



# NAMEYÊ WERDÎ: KEŞK

*Elîf HATISARI'*

**Malzeme:**Nêm kîlê goştê verekê esteyînê bêrûn,yew koçike şîrîn îsotê toez,yew koçike şîrîn soal, nêm kîlê kerquet,yew koçike şîrîn îsotê toez, rûn dûwar isoto sîya,awe(awk).

**Virastîş:**Ma kerquet şew ra kên awk. Roej çoras ponc ya zî poncas deqa tencereyo pîpîke di xaşênenî.Hetanî goşt astere abirîya ma xaşênenî û genî zerê yo firaq.Kerquet ma gên zerê yo quşqana û adiro nimcet di pê yew koçike texteyîn, timûtîm tadenî. Zereyê yi rê soal, rûn, îsoto sîya dekenî hetanî bîyer potîş ma tadenî û bîn yi hewna kenî.Wexta

werdiş di ma goşt kên lete lete û keşk ser di ronên.Ma rûn dûwar û îsoto toez qênî temûna,sûr qên,rişnênî ser keşk ra.



1- Üniversiteya Cewlîgî, Wendekara Leteyê Zazakî  
Sîmfê Hîrîne.


## NAMEYÊ WERDÎ: MELXUTA

Ruşan AYHAN

Malzeme: Yew tesê  
'hemtî (ne'heyê kute, xele,  
marcîyo yaşil) yew koçikê awê  
firingî, pîonzê wişk, sol, pulê  
îsot, ruwen

**Viraştiş:** Yew quşqaneyî  
ra ma 'hemtîyê xu dekenî,  
benatîyê 3 û 3:30 girîyen.

Sol dekenî mîyan melxuta û  
ma pulê îsot zî dekenî mîyan  
melxuta. Pîyanzê wişk, wîrdi  
wîrdi ben û ma êy pîyan  
mîyanê ruwen di qîlînenî.  
Pîyanzu wişk kenî mîyan  
melxuta û mabineyna girînenî.



# GUJO<sup>1</sup>

*Amadekerdox: Hacî İbrahim AYTEKÎN<sup>2</sup>*

Beno nêbeno, ju Gujo bena. Rojê Gujo û embazê ci şinê çarî. Gujo embazanê xora vana” Şimarê çimî danane, mi rê çarî arêdê”. Gozî bena, dendikî bena, vamî bena, dana bi embazandê xo. Vana “mi rê çarî arêdê”. Ê cirê çarî arêdanê. Gujo vana çaranê mi jî wegrê mi jî wegrê. Yewaş yewaş yenê , beno erey. Şinê raştê ju keyî yene. Şinê keyî mîyo ke ju pîrek aja. Pîrek vana “Bêrê meymanê mi bê”. Şinê bene meymanê Pîre. Pîre cirê nan dana dima ra kewnê ê bînî la Pîre se kena Gujo nêrakewna.

Pîre vana: “Gujo ti çira nêrakewna?”


Gujo vana: “Nê, maya mi mi rê şew de pilole kerde. Werze mi rê pilole bike, bikewî”.

Pîrek cirê pilole kena, Gujo wena la Gujo fina nêrakewna. Pîrek qehrîyena Gujo, bena dekena ki waredê gozo mîyo. Gujo heto şonê rakewna şewra werzenê nanê xo wenê û embazana pîya şinê. Pîr vana “Ez o şirî hewt koyo pey ra ju kolî bîyarî şima ro dî”. Vana “Ez o şima bikişî” û şina

Gujo çaqûya xo vejena, fekê çiwali a kena. Şina golika Pîre ana dekena di çiwali û fekêci gire dana. Vazdana şina xo nimnena. Pîre dana ro çiwali, vana “Ez o qorîna golik dê belekî bîyarî. Golik qoreno, pîre daha dana piro. Pîre nêzanena ke goliko. Pîre qehrîyena, qehrîyena, qehrîyena û mirena. Na sanik jî tîya de qediyena.<sup>1</sup>

1 - Mîntîqa /Herêm : Mîntîqaya Çêrmûge (Dewa Bistîne); Vatoxe: Fatma Aytekîn (45 Serrî Ya)

2 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî, Sinifê Diyîne (?)



# KÎTABÊ HÎKAYEYAN "PÎYÊ MI KEMANE CINITÊNE" SER O KRÎTÎK

Adem AYDIN<sup>1</sup>



PÎYÊ MI KEMANE  
CINITÊNE

Nadire Guntaş ALDATMAZ

## DESTPÊK

Nuštoxe nê hîkayeyanê xo de bi no nuşteyî destpê kena "Maya mi pîyê mi rê... Wa ereykwetîşê mi ver a bo." Û hîkayeyan may û pîyê xo rê dîyar kena. Kîtabê de hîrêş (13) hebî hîkayeyê ca gênê û xo mîyan de di cayê benê. Nuštoxe yew het ra cuya ra seranser wunyena û heto bîn ra zî cuya cinîyan ra hîkayeyê xo nuştî. Merdim fehmi kenî ke hîkayeyê nuštoxê di qisimî.

## KUNYE

Nameyê kitab û nuštoxî: Pîyê Mi Kemane Cinitêne, Nadîre Guntaş ALDATMAZ

## Weşanxane:

Weşanxaneyê Roşna

Tarîx, cayê çapkerdişî, pel: 2013, Dîyarbekir, 95 pelî

## TEHLÎLÊ MEWZUYÊ HÎKAYE

**Mewzû:** Nuštoxe kitab de ewil yew resmî dena şînasnayîş. No resîm de kam esto heqê înan de malumat dena.

Hîkayeya pîyê mi kemane cinitêne de nuštoxe cuya pîyê xo ra behs kena û têkilê xo û pîyê ser o vinderta înan ra behs kena.

Hîkayeya Pîlvanke dewa nuštox a û wexto ke merdim şono dewa Pîlvank senî eşkeno şîro înan ra behs beno û dewa pîlvank û tebiatî zaf weş nusena wendoxan de xo rê amade kena.

Hîkayeya Poşmanîye de maya nuštoxe merda

û a maya da xo rê zaf qahrîyena.

Hîkayeya Doktor kî çin o de yew nêweş ke nêweşxane bî nêweşxane carnayîşê ey ser o hîkayeya nusyaya.

Nê heşt hîkayeyê bîn zî heqê cinîyan de hîkayeyê nusyayê. Cinîyê naheqê vînenê cinîyê zulmê carmêrdan ver mirenê. Cinî çî bena wa bibo tim û tim qebebet cinî do. Têkilê cinîyan û carmêrdan de malumat dena. Wexto ke cinî carmêrd yewbîn ra atiqayê çîçî sebenê û bi xuxusî domanî kênek sebenê çî yeno ser e de înan ser yew bi yew hetê yew cinî ra hîkayeyê nusîyaye. Ma înan ra eşkenê yew numune bide. Yew cinî est a û mekteb wenda bîya doxtor hem kare keye kena hem zî doxtorê kena merde aye zî şono kar yeno sewbî karekî keye nêkeno no sebab zî tewr peynî de cinîyê û carmêrd pênêkenê û atiqyenê.

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekarê Leteyê Zazakî Sinifê Hîrine.

**Ca û Wext:** Nê hikayeyê hem dersim de hem zî Enqera de nusyayê.

### TEHLÎLÊ ZIWANÊ KITABÎ

Hikaye bi standart zazakî nusyaya. Mi ziwane hikayeyan de zaf zore ante. Semedo ke ez zaf zazakî nezana. Ne çekuyê ke ne hikayen de suxulyayê şinasnayê amê. Mi zaf cayan mi zaf weş hikayeyê fehm kerdî la ge-ge zî qet fehm nekerdîni mi embazan de xo ra hetkarê waştê çekuyê mi ne zanayê ez embazanê de xo ra musaya. Hikaye de vatoxê verenan, idyamî, qalî weşî, bî. La mi weş fehm nekerdîni. Ez ne hikayeyan de çekuyê newe zaf-zaf musaya. İdyomî: Zerrîya mi şikitê, canê mi jan deno.

### BÎYOGRAPHÎ\*

Nadîre Guntaş Aldatmaz, 1963 dewa Pîlvankî ya Mamekiye de ameye dinya. Mektebo verên dewa xo de wendo. Seba ke wendişê xo dewam bikero 1976 de keyeyê înan bar kerdo şiyê merkezê Mamekiye. Serra 2010 de kî miyanê gruba tewr verene de qismê Ziwan û kulturê kurdan yê Universiteya Artuklu de dest bi lîsansê berzî kerd û babeta folklori ser o teze xo yê masterî bi kirmanckî amade kerd. Ne demî de dest bi nuştîşê kirmanckî kerd û gelek nuşte û hikâyeye ayê kovara Şewçîla, kovara Vateyi, rojnamey Newepelî û keyepelê Zazakî. Netî de weşaniyayî

### Eserê aye ke hetanî nika weşaniyayê ne yê:

- 1) Sanikanê Mamekiye ra, Weşanê Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya de Ciwîyenê ya Unîversîteya Artuklu, Mêrdîn 2013, 116 rîpelî
- 2) Pîyê Mi Kemane Cinitêne, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2013, 96 rîpelî
- 3) Folklorê Kirmancan Ser o, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2014, 248 rîpelî



# DIZDÊ PEYVAN (ÇEKUYAN) SÉCHU SENDE

Tadakare: Şenay ASUTAY<sup>1</sup>

Wextekî zaf verî de, sey heme welatê bîn ê dinyayê, no welatî de zî peyv bi qasê nan û awe bierja biyê.

Rojekê xerîbêk verê xo dano ser a no welat, rayirî de rastê cinîyekê yeno, aye vindarneno û pê rê qisey keno.

Mêrik, kardêk ver de û diranekî zêrîn fek de bî. Dûr û derg qisey kenê, demekî qiseykerdîşî de bi dest lêzî peyvekî cinekê dizneno û astorê xo siwar beno û bi lêz û bez tîya ra dûrî keweno.

Dizdê peyvan astorê xo bi çargamî rumeno heta ke reseno dewekê. Tîya de şino xanekî, xanê de bi hekîmêk qisey keno ke ameyo ewnîyeno nêweşekî. Dizd kîseyê xo ra zerekê vejeno û vano:

- "No zerdê ma bi hîrê peyvê to yê peyîn rê bibedilnê."

Hekîm vano:

- "Nê peyv ne têna yê min ê, yê tay kesî bîn ê zî."

La dizdê peyvan ci veranêdano – daristanê de kozêk abena- bê ke huyayîşê xo yê xapinokî çîyekî vînî biko, karda xo dano verê qirika hekîm û nê her hîrê peyvan dizneno.

Roja bîn dizd şino bajarekî û keweno

qesrekê. Destekî ey de kîsêk zerd destê bîn de zî kîsêk peyv. Kîseyê zerdan nîşanê mêrikê sarayê keno û wîna vano:

- "Heme peyvê ke to ewro vatê, ez wazena bihêrinî."

Mêrikê esîlzade vano:

- "Nê peyv ne yê rotişî yê!"

La dizd bi karda xo ey zî tehdît keno û yew bi yew peyvan ci ra dizneno.

Dizdê peyvan taynê şino, na rey rastê siwarekî yeno û êrişê siwarî keno.

Mêrikê siwarî warê helbestê (şîrê) eşqî de helbestvanekî hosta yo. Dizdê peyvan karda xo vejeno û wîna vano:

- "Yan peyv yan zî cana to!"

Helbestvan vano:

- "Peyv ne yê min ê, yê şarê min ê, ez nêşikena înan biroşî."

La dizdê peyvan xo nêzdîyê helbestvanî keno û peyvan mîyanê zerreyî ey rê weredano û geno.

Xebera ke tay kesî peyvan diznenê demekî kilm de seranserê welatî de vila bena. Gelek kes erzîyayê çêkan ke peyvê xo

1 - Unîversîteya Çewlîgî, Wendekara Leteyê Kurmancî, Sinifê Diyine.




bipawê. Ameyo vatiş mabeyna şarî de yê ke tewr baş peyvan pawenê; pale (mişag) bi dare û vaşturî û deryawan bi kard û tîr ê. Û cinîyê bi cesaret zî bi cewê bînê fistanê xo de peyvan kirişenê.

La dizdê peyvan her bi eynî qêdeyî bi dewamî kenayê ke şinê wendişî musenê û mêrikê ke şinê sol hêrînenê zî diznenê. Dibistane de yê mamosteyan û awuqatê ke bi kanunî zanê zî. Û no welatî hêdî hêdî gelek peyvê xo vîni kenê. Û roj bi roj tay bi tay feqîr benê, semedê welatêk bî ke peyvê ey ameyê diznayîş.

Amenê vatene ke şarî, seba ke peyvê xo bipawê, binimmê, nuştîşî zî veradabî.

Tersê dizdê peyvan rê û semedê bêasayîşî zafî şarî bi seserran têna bi kesê kêyeyî bi nasê xo rê qisey kerdê. Û serrî bi no qêde derbas biyê û bi goreya rîwayetan no welatî de ters û xofa dizdê peyvan mabeyna merdiman de hema zî esta.

Û hewna tay kesî agêrenê û vanê ke dizdê peyvan bi ey huyayîşê xo yê xapinokî û kêse û karda xo rey rey vindegehê otobusan de rey rey verê golroşekî de yan zî dibistaneke de yeno vînayîş.



## QELEM EY!

Ji Weşanên Loryayê  
Derçû!

# WERÊ MEHELLÎ Ê PALI: DUALMÊYÊ TIRŞ (SIMAQIN)

Perwîn Septioğlu



## MELZEMEYÎ

- 2 ûskura simaq (simaqa tuez nêben)
- 6 hebî balcon sîyê
- 12 hebî îsotê gulyerikin
- 400 gr qiymeya bêrun
- 4 şuşê awk belxurê kufton
- 2 hak
- 2 lete gueştê asteyîn
- Yew binê salçe
- 10 hebî pîyonza qicik
- Sual
- Yew tasê awk, semedê alawitişê kufte

Ina dualmê tirş him pê sebzê wişkerde wa, him zî pê sebzê tezê wa virazîyena.

## WIRAŞTIŞÊ WER

Hêverî ma simaqê xu kên zerê yew quşxone. Gereka simaqê ma hebe bibo. Darê simaq yabon di, xu bi xu yena. Aşmonê payîzî; cînî şînî darê simaq ra simaq top kenî û anî kîye, kênî wişk. Awkê simaqî, mîyon na wer û xilorê tirş, bamyê, werê kînger, dualmê wuşk, tayê şuarbon di zî şuxulnênî.

## HEDIRE KERDIŞÊ AWKÊ SIMAQ

Ma simaqê xu 5-6 saet mîyon awk di vindarnênî. Awa kî ma kênî ser simaqî gereka germin nêbo. Simaq tirşyê xu û rengê xu dona awk rê. Ver cê pê yew kevgîr a û bajna pê yew şal a şal kênî. Yew hak ma kênî mîyon awkê simaq û hol tîye donî. Ma quşxonê xu nên ser adir û adirê xu kênî tay. Binê vîyeren sêr quşxoni sê yew tebaqa kew tepişena. Pê yew kevgîr a ma kewê yê ser a genî. Awkê simaq bena zilal û rengê ye zî bena sê awe wişnon. Hîn awkê simaqê ma tamom a. Ina rey ma gueştê xu kên mîyon na awkê û girênênî.

Ma ina rey sebzê xu kenî hadire. Eg ma pê sebzê wişkkerde wa dualmê bivirazî; gereka ma sebzê xu mîyon awk di bigirênî. Pîyonzê wişk zî ma ser yê ra binê zaf tira kênî. Semedê ke pîyonz cîye mîyon ra rehet bivici. Ma ayê zî girênênî. Eg sebzê ma teze bibo, ma zerê yê vecenî.



• Ma awkê simaqî û sebzê xu hadire kerd. Ina rey ma kuftê xu alawînî. Ma qiyâmê xu, yew hak û binê sual kên zerê yew legen û alawênî. Belxurê wîrdî û yew tasê awk zî ma kên de. Hîn ma kuftê xu zaf hol alawênî. Ma mîrê kufta kên sê me'cun. Eg mîrê kuftê ma wişk bî, ma eşkenî honê awk berz ser a. Ma gereka hestey (qiyam) mîrê kuftê xu hol bivênî. Gereka zaf wişk nêbo.

• Ma hîn dualmê xu kênî de û pîyor pîya erzên mîyon awkê simaqî. Guerê niem seet girênênî. Ma dualmon mîyon awk ra pê yew kevgîr wa vecên û kên yewna ca. Ina wer exlebî kên serdîn û hama vênî. Serdîn hina weş a.

# ZANINGEH



A grid of book covers from the Zaningeh collection. Visible titles include 'Zaniko Jimara San Veswa', 'Klavvêya Kurdi', 'National Geographic Kurdistan', 'Kopiskara Hadrone', 'Zaniko El-Cezeri', and 'Zaniko El-Cezeri'. Each cover features a different illustration or photograph related to the book's theme.

# Çandname

A screenshot of the Çandname website interface. The top navigation bar includes 'Home', 'New', 'About', 'Contact', 'Privacy Policy', 'Terms of Service', 'Sitemap', 'Feedback', 'Help', 'FAQ', 'Glossary', 'Index', 'Search', and 'Login'. The main content area is divided into several sections:

- Nivîskane**: A list of authors and their works, including 'Shaw Arzîyê - Dilazad Art', 'Jî Nî Ota', 'Mîrê Hestey', 'Kürtçê "A-a" Harfinin Okunûşu', 'Lîsteya Hesteyan An Çabêna Harfêna Tevî', 'Çîroka Agî (2)', 'Li Gêr Çîroka Tevî Çîroka', 'Mê Çîroka Tevî ya Dewlata Ezanê', 'Çîroka Pîyê', and 'Çîroka Çîroka ya Pîyê Çîroka'.
- Pirsname**: A section for questions and answers, with sub-sections for 'Pirsname', 'Pirsname', and 'Pirsname'.
- Forum**: A section for discussions, with sub-sections for 'Forum', 'Forum', and 'Forum'.
- Zîman**: A section for the Zaman newspaper, with sub-sections for 'Zîman', 'Zîman', and 'Zîman'.
- E-pirtûk**: A section for e-books, with sub-sections for 'E-pirtûk', 'E-pirtûk', and 'E-pirtûk'.

The interface is clean and organized, with a focus on providing access to a wide range of Kurdish literary and cultural resources.



# KEDKARÊN VÊ HÊJMARÊ KEDKARANÊ NA HUMARÊ

*Xwendekarên Zanîngeha Çewlîgê*

- » Ahmet Subaşı, Sinif; 3, Beş Kurmancî
- » Ayşe Irmak, Sinif: 1, Beş: Kurmancî
- » Ayfer Karadoğan, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Betül Anderiman, Sinif: 2 Beş: Zazakî
- » Bêrîvan Önen
- » Ceylan Uçar, Sinif: 1, Beş: Zazakî
- » Ejder Êlih, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Elif Hatisari, Sinif: 3, Beş Zazakî
- » Enîse Arslan, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Erdal Taş, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Ercan Tekîn, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Erol Çoban, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Evîndar Demîr, Sinif: 3, Beş, Kurmancî
- » Eylem Akinci, Sinif: 1, Beş: Kurmancî
- » Fadîle Avcil, Sinif: 2, Beş Kurmancî
- » Fîgen Çoban, Sinif: 1, Beş: Zazakî
- » Gülşen Yalçın, Sinif, 1, Beş Kurmancî
- » Haşem Tilkî, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Hasan Fîlitoğlu, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Hamza Arıç, Sinif: 2 Beş: Zazakî
- » Hülya Alpkaya, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Hüseyîn Rodî Keskîn, Sinif: 2, Beş: Zazakî
- » Kahraman Aksu, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Leyla Kiliç, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Mazlum Özel, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » M. Emîn Akbulut, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Mehmet Eken, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Mehmet Nasîp Yıldız, Sinif: 3, Beş: Zazakî
- » Mehtap Kaya, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Mem Artemêt, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Metîn Çakır, Sinif: 2, Beş Kurmancî
- » Müzeyyen Pamuk, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Murat Kara, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Neslihan Temel, Sinif: 3, Beş: Zazakî
- » Nihal Kayışkiran, Sinif: 1, Beş: Kurmancî
- » Perwîn Septioğlu, Sinif: 3, Beş: Zazakî
- » Sabrî Külter, Sinif: 3 Beş: Kurmancî
- » Sedat Soylemez, Sinif: 1, Beş: Zazakî
- » Suat Yiğit, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Şahap Laçın, Sinif 3, Beş: Zazakî
- » Şenay Asutay, Sinif: 2, Beş: Kurmancî
- » Şukrî Şemzînan, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Tufan Yamaç, Sinif 3, Beş Kurmancî
- » Xalid Özel, Sinif 1, Beş Kurmancî
- » Zeynep Sultan Atli, Sinif: 1, Beş: Kurmancî
- » Zübeyr Durmaz, Sinif: 3, Beş: Kurmancî
- » Şakire Karabudak, Sinif: 3, Beş: Kurmancî

# KOVARA ZANKO

"ZANISTA XWEDÊ NAYÊ FIROTIN"

